



Naveroka hejmara 8

Sernivîsar

Zimannasî bi berfirehî, r. 2

Husein Muhammed

Hejmar û hejmarsazî, r. 4

Nasandin

Ferhengeke soranî-kurmancî-tirkî, r. 56

Peter Trudgill (wergêr: Hesên Qazî)

Ziman û cinsî komelayetî, r. 59

Zimanê zarokan

Ferhengoka peyvên zarokan, r. 77

Karîn, şîyan û tiwanî

û hevrehên wan di zarên kurdî de, r. 80

D. N. Mackenzie (wergêr: Newzad Hirorî)

Koka zimanê kurdî, r. 85

Maurizio Garzoni

Rêzimana kurdî ji sala 1787, r. 107

H. Muhammd (açarnayox: Mahir Dogan)

Çekuyê ma kotî ra yenê?, r. 110

Malbat

vekolîneke peyvnasî, r. 120

Zagros Haco:

Ferhengoka matematîkê, 147

S. Zeyneloğlu, I. Sirkeci, Y. Civelek

Language shift among Kurds in Turkey, p. 162

Muhammedreza Bahadur:

Sentential logic in Behistun Inscription, p. 187

Zarname

Ferhengoka peyvên zimannasî, r. 193

Sernivîsar

Zimannasî bi berfirehî

Dîsa kerem bikin hejmareke kovara xwe Kanîzarê, xwandevevanên delal. Vê carê jî em çend vekolînên dirêj û hin nivîsarên kurttir bi kurmancî, soranî, zazakî û inglîzî belav dikin.

Husein Muhammed vê carê dest avêtiye navên hejmaran û hejmarsaziyê di zimanê kurdî de. Ew di 50 rûpelan de hejmarên bingehîn yên kurdî li gel varyantên wan yên devokî û etîmolojiya wan dide nasîn. Vekolîna wî ya dirêj li ser hejmaran dê di hejmara dûvê de jî berdewam be. Ew di vê hejmarê de herwiha li ser peyvên malbatî û xizmatiyê û herwiha li ser etîmolojiya wan jî dinivîse.

Di vê hejmarê de em sê vekolînan bi wergerên wan diweşînin. Vê carê jî **Hesen Qazî** beşek ji kitêba **Peter Trudgill** ya li ser zimannasiya civakî wergerandiye *soranî* û em wê bi alfabeya kurdî-latînî belav dikin. **Newzad Hirorî** nivîsara zimannasê navdar **D. N. MacKenzie** bi navê "Koka zimanê kurdî" li *kurmancî* wergerandiye. **Mahir Dogan** nivîsareke Husein Muhammed ya bi navê "Peyvên me ji kû tîn?" wek "Çekuyê ma kotî ra yenê?" wergerandiye *zazakî*.

Di vê hejmarê de jî em du nivîsarên zimannasî yên bi inglîzî belav dikin. Yek jê vekolîneke **Sinan Zeyneloğlu, İbrahim Sirkeci** û **Yaprak Civelek** ya li ser zimanguhêziyê anku destberdana ji zimaneke û qisekirina êdî bi zimaneke din di nav kurdên Bakurê Kurdistanê û Tirkîyê de ye. Nivîsara din ji **Muhemedreza Behadur** e ku vekolîneke li ser hevoksaziya kevirnivîsa navdar ya Darayê Mezin yê hexamenîşî ye û li Bêhistûna Kirmaşanê ye.

Wek carên din jî, ev hejmar jî cih dide nasandin û nirxandina du kitêbên li ser zimanê kurdî, yeke nû û yeke kevn. Berhema nû ferhenga soranî-kurmancî-tirkî ya **Abdullah Ekici** ye. Kitêba kevn jî yekem rêziman û ferhengoka zimanê kurdî ya bi zimaneke ewropî ye ku sala 1787 ji aliyê **Maurizio Garzoni** ve bi îtalî hatiye nivîsîn. Kanîzar ne tenê wê dide nasîn lê herwiha tevahiya wê kitêbê pêşkêşî xwandevevanên xwe dike.

Kanîzar vê carê du xebatên zibareyî anku bi hevkarî pêşkêş dike. Yek ji wan li ser peyvên "karîn, şiyar, şe kirin, tiwanîn" û varyantên wan yên devokî ne ku di berhevkerin û berhevdana wan de me ji şarazatiya sê camêran sûd wergirtiye: **Ali Bayraklı** (kurmanciya Konyayê), **Hasan Aslan** (zazakî) û

Muhammed Teqevî (kurmanciya Xorasanê). Xebata din jî *ferhengokeka zimanê zarokan* e ku me bi alîkariya koma *Zimanê Kurdî* ya li ser Facebookê amade kiriye.

Di vê hejmarê de em herwiha ferhengokeke matematîkê ji **Zagros Haco** diweşînin. Wek di hejmarên din de, vê carê jî dîsa ferhengoka xwe ya zimannasiyê anku *Zarnameyê* berfirehtir kirî belav dikin.

Kerem bikin bixwînin û ji bîr nekin bo *Kanîzara* xwe binivîsin!

kovarakanizar@gmail.com

NAVÊN HEJMARAN Û HEJMARSAZÎ

Husein Muhammed



1. MIJAR Û PEYVNASIYA WÊ

Peyva "hejmar"¹ û hevwaterên "reqem"² û "nimre"³ dikare hem maneya nîşanên hejmaran (bo nimûne 1, 2, 10, 123, 40 006, $\frac{1}{2}$, 10 %...) û hem jî wateya navên hejmaran (bo nimûne "yek, du, bîstûheft, sed hezar, çarêk") bide.⁴

Bo jihev cudakirina nîşanên hejmaran – ku zêdetir aidî matematîkê ne û navên hejmaran – ku pirtir têkilî zimannasiyê ne – di zimannasiyê de bi maneya "navên hejmaran" peyva **hejmarnav** yan varyanta wê *jimarnav* di zimannasî û rêzimannivîsîna kurmancî de li kar e. Di zimannasiya navneteweyî de, bo nimûne di inglîzî de, hejmar û hejmarnav bi peyvên "number" (hejmar) û "numeral" (hejmarnav) ji hev tên cudakirin.

Lê bo xatirê dirêjnekirinê, em ê di vê vekolîna xwe de peyva "hejmar" bi mebesta "hejmarnav, navê/navên hejmaran" bi kar bînin.

Hejmar li ser du beşên mezin tên parvekirin:

¹ Li gor devok û zaravayên din yê kurmancî herwiha "hijmar, jimare, hûmar, amar, şimare, şumare". Forma "jimare" zêdetir di soranî de, varyantên "hûmar, amar" di zazakî de tên xebitandin. Formên bi Ş (şumare, şimare) ji farisî hatine wergirtin an di bin tesîra farisî de ji J bûne Ş.

² Herwiha carinan bi formên "raqam, reqam, raqem". Ji erebî hatiye wergirtin.

³ Herwiha "nimare, numre, numera, numero". Ji zimanên ewropî hatine wergirtin.

⁴ Ji bilî van herdu maneyan, peyva "hejmar" herwiha wateya "hejmara rêzimanî" jî dide ku joravê "yekhejmarî" (bi inglîzî "singular"), "pirhejmarî" (plural), "cohejmarî" (dual) û "kêmhejmar, hinhejmarî" (paucal) jî dide.

- **hejmarên bingehîn** yan *hejmarnavên bingehîn* (cardinal numbers/numerals): bo nimûne "yek, sed, bîstûpênc..."
- **hejmarên rêzî** yan *hejmarnavên rêzî* (ordinal numbers/numerals): bo nimûne "yekem, sedem, bîstûpêncem..."

Hejmar dikarin herwiha li gor komên mezinahiya xwe jî bên parvekirin:

- **tilhejmar** yan *tiljimar* (bi inglîzî "digits"): navê hejmarên 1 heta 9
- **dehgir** (inglîzî "teens"): navê hejmarên 11 – 19
- **dehhejmar** yan *dehjimar* (inglîzî "decads") navê hejmarên 10, 20, 30 heta 90
- **sedhejmar** yan *sedjimar*: navê hejmarên 100, 200, 300 heta 900
- **hezarhejmar** yan *hezarjimar*: navê hejmarên 1000, 2000, 3000...

Ev parvekirina hejmaran di zimannasiyê de giring e ji ber ku di hin zimanan de bo nimûne hejmarên 11 – 19 navên serbixwe hene lê di hin zimanan de jî ew ji navê peyva "deh" û navê hejmara duyem ya wê rêzehejmarê pêk tên. Bo nimûne, mirov dikare li vê derê hejmara "11" bi tirkî û inglîzî bide:

- tirkî "on bir" ji "on" (deh) û "bir" (yek)
- inglîzî "eleven" ne ji "ten" (deh) û "one" (yek)

Tevî ku inglîzî "eleven" ji "ten" û "one" çênake jî, lê ew jî wek tirkî "21" bi "twenty" (bîst) û "one" (yek) ava dike.

Em ê dû re bibînin ka kurdî sîstemên çawa di avakirina rêzehejmaran de dixebitîne.

2. EV VEKOLÎN Û YÊN BERÎ WÊ

Navên hejmaran hinek ji peyvên herî bingehîn û giring yên zimanî ne. Ji kitêbên pêşîn yên li ser ziman û rêzimana kurdî ve hema-hema di her kitêbên rêzimana giştî ya kurdî de behsa hejmarên kurdî jî tê kirin. Di yekem rêzimannameya naskirî ya kurdî de, ku bi îtalî ji aliyê Maurizio Garzoni ve sala hatiye nivîsîn û yekem car sala 1787 hatiye çapkirin, yekser piştî dengnasiyê hejmarên kurdî tên rêzkirin.⁵

⁵ Bo nasandineke li ser vê kitêbê, binêrin vê hejmara *Kanîzarê*.

Di duyem rêzimana kurdî ya naskirî de, ku ji aliyê Samuel A. Rhea ve bi inglîzî hatiye nivîsîn û sala 1869 hatiye çapkirin⁶, bi heman awayî hejmar li destpêka berhemê tên behskirin.

Di piraniya rêzimannameyên bi kurdî bi xwe de jî bi heman awayî hejmar giring tên hesabandin û tên behskirin. Peyva *hejmarnav* bi şiklê *jmarnav* ji aliyê Celadet Bedirxan ve hatiye afirandin. C. Bedirxan herwiha behsa cins û çemandina hejmaran jî bi kurdî di kitêba xwe *Bingehên Gramera Kurdmancî* de kiriye.

Di çend nivîsar an beşên hin kitêban de ji aliyê rastnivîsînê ve behsa hejmaran hatiye kirin.⁷

Lê dîsa jî navên kurdî, hejmarsaziya (avakirina navên hejmaran) û bikaranîna hejmarnavan û çemandin û ravekirina wan li gor rêzimana kurdî tê nehatine vekolîn û ew li gel zimanên lêzim û cîran nehatine berhevdan.

Ev vekolîn dê bi destnîşankirina wekhevî û cudahiyên hejmarnavan li gel birrên din yê peyvan (bi taybetî li gel navdêran, lê herwiha bi rengdêr û cînavan re jî) dest pê bike.

Paşî vekolîn dê etîmolojiya hejmarên bingehîn (tilhejmar, dehgir, dehhejmar û hejmarên mezintir yê xwedî navên taybet wek "sed, hezar, milyon, milyar" û herwiha "sifir" jî) diyar bike. Diyarkirina etîmolojiya hejmarnavên kurdî dê bi berhevdana hejmarên kurdî li gor devok û zarên kurdî, zimanên din yê îranî û hindûewropî were pêkanîn.

Mijareke din ya serekî ya vê vekolînê **hejmarsazî** anku çêkirina navên hejmarên mezintir (bo nimûne 14, 72, 104, 231...) ji hejmarên biçûktir (0 – 9) e. Em ê hem behsa hejmarsaziya kurmancî bikin û hem jî wê li gel zar û zimanên lêzim û cîran bidin ber hev.⁸

Dûv re em ê behsa bikaranîna hejmaran, cinsê wan yê rêzimanî, çemandina wan û ravekirina wan bikin. Paşî jî em ê berê xwe bidin bikaranîna hejmarnavan wek birrên din yê peyvan, xaseten wek navdêran lê herwiha wek rengdêr û cînavan jî.

⁶ Binêrin: <https://zimannas.wordpress.com/2016/06/03/rezimanek-kurdi-ji-sala-1869/>

⁷ Bo nimûne binêrin: <http://www.amidakurd.net/qunciknivis/rast%C3%AE%C3%BB%20tastniv%C3%AESa%20hejmaran>

⁸ Çavkaniya me ya serekî ya hejmarnav û hejmarsaziyê di zimanên hindûewropî de *Gvozdanovic, Jadranka (1991), Indo-European Numerals*, Walter de Gruyter, ISBN 3-11-011322-8 e. Ji bilî zimanên hindûewropî, em ê li cihên pêdivî herwiha behsa hejmar û hejmarsaziya erebî û tirkî jî bikin û wekhevî û cudahiyên wan li gel hejmarsaziya kurdî bidin ber hev.

3. HEJMARNAV – BIRREKE SERBIXWE YA PEYVAN AN JÎ BEŞEK JI NAVDÊRAN?

Gelo hejmarnav anku navên hejmaran ji aliyê rêzimanî ve bi rastî birreke serbixwe yan peyvan e yan jî tenê beşek ji navdêran e?

Wek ku ji peyva "hejmarnav" jî diyar e, ji xwe ew navên hin tiştan in wek çawa ku navdêr jî navên tiştan, kesan, bûyeran û diyardeyan in. Herwiha hejmarnav jî dikarin wek navdêran li gor cins û hejmara rêzimanî biçemin:

- yek → yekê (bidin ber "kitêb → kitêbê")
- deh → dehan (bidin ber "kitêb → kitêban")

Lê dîsa jî hejmarnav bi çend awayên bingehîn ji navdêran cuda ne:

Naveroka navdêran bi awayekî giştî serbixwe ye lê ya hejmaran rêjeyî ye. Gava ku em dibêjin "kitêb" an "sêv" an "muzîk", her kes kêr-zêde fehm dike ka mesele çi ye, lê eger em bibêjin "2" yan "11" yan "1000301", tenê wisa mirov bêyî kontekstê fehm nake ka çi ye, divê em bibêjin "2 filan tişt", "11 bêvan tişt" û hwd.

Di komikên navdêrî (*noun phrase*) de du yan çend navdêr adeten bi ravekê (izafeyê) bi hev ve tên girêdan û di kurdî de adeten raveber berî ravekerê tê. Raveber ravekê digire û raveker jî paşgira çemandinê. Bo nimûne:

- keç → keç-a Fatma-yê
- welat → welat-ê kurdan

Hejmar jî di komikên navdêrî de raveker in lê ew nakevin dûv lê dikevin berî ravebera xwe⁹ û di halê xwerû yê komika navdêrî de ti ji herduyan naçemin:

- du keç
- bîst welat

Ji aliyê peyvsaziyê ve hem navdêr û hem jî hejmarnav dikarin bibin rengdêr lê bi piranî bi paşgirên ji hev cuda:

⁹ Awarteya serekî ji vê "yek" ya wek paşgira "-ek, -yek" e, bo nimûne: welat-ek, rojname-yek.

- hejmarnav bi paşgirên "-em" (bn. "dehem"), "-an" ("dehan"), "-ê" ("dehê")
- navdêr bi hejmareke mezin ya paşgiran, bo nimûne: bi-, bê-, -î, -în, -dar, -mend...¹⁰

Ji aliyê ravekirinê ve li aliyekî hejmarnav dişibin rengdêran ji ber ku herdu di komikên navdêrî de navdêran rave dikin:

- du kitêb
- kitêba kevn

Wek ku tê dîtin, rengdêr di kurdî de adeten dikevin dûv navdêran anku raveber berî ravekerê tê ("kitêba kevn", ne "*kevn kitêb" wek di hin zimanên din de, bo nimûne inglîzî "old book" yan tirkî "eski kitap"). Lê hejmara raveker berî navdêra raveber tê ("du kitêb", ne "*kitêb du" – di vê meseleyê de inglîzî û tirkî jî wek kurdî ne: "two books", "iki kitap").

Hejmarên rêzî jî dikarin wek rengdêran bikevin dûv navdêra raveber:

- kitêba duyem (bb. kitêba kevn)

Lê berevajî rengdêran, ew dikarin berî navdêra raveber jî werin bikaranîn:

- duyem kitêb (lê ne "*kevn kitêb")

Rengdêr jî dikarin carinan bikevin berî navdêra raveber lê hingê ew wek peyveke xweser û bi hev ve tîn hesabandin, ne wek du peyvên yek raveber û yek jî raveker:

- kevnakitêb (wek peyveke bi hev ve, ne "kevine kitêb" wek du peyvan an komikeke peyvan)
- xweşmirov (wek peyveke xweser, ne "xweş mirov" wek du peyvan an komikeke peyvan)

Li aliyekî din, mirov dikare hejmarnavan ji aliyê peyvrêzî û bêravekiya wan ve bide ber cînavan jî. Bo nimûne:

- ew kes – du kes
- çend kitêb – pênc kitêb

Di haletên wiha de cînavên kesî û yê destnîşankirinê jî li gel navdêra raveber diçemin:

- ew kes → wan kesan
- ev kitêb → vê kitêbê

¹⁰ Bo peyvsaziyê, binêrin kovara Kanîzar hejmarên 1 – 4: <https://zimannas.wordpress.com/category/peyvsazi/>

Lê hejmar di rewşên wiha de bi navdêrê re naçemin:

- du kes → du kesan (ne ”*duyan kesan”)
- bîst kitêb → bîst kitêban (ne ”*bîstan kitêban”)

Di vê reftara xwe de ew dişibin cînavên ne-kesî û yên ne-destnîşankirinê, bo nimûne cînavên nediyar:

- çend kitêb → çend kitêban (ne ”*çendan kitêban”)
- bîst kitêb → bîst kitêban (ne ”*bîstan kitêban”)

Lê wek di hin rewşên peyhevdanê (*juxtaposition*) de hejmarnav jî li berî navdêran dikarin biçemin:

- bi dehan kitêban

Lê ev çemîn ji navdêran li pey wan serbixwe ye û hejmarnav dikare çemandî be heta eger navdêr neçemandî jî be:

- Bi sedan kes hatin wir. (Ne ”*bi sedan kesan hatin wir”)

Ji aliyê çemandinê ve jî hejmarnav ji cînavan cuda ne ji ber ku çemandina hejmaran li gor qeyd û bendên giştî yên navdêran û rêzikî yan rêbazî ye lê çemîna cînavan – bi taybetî cînavên kesî – awarte û istisnayî ye. Bo nimûne:

- yek → yekê (bb. ez → min)
- bîst → bîstan (bb. em → me)
- deh → dehan (bb. ew → wan)

Ji aliyê peyvsaziyê ve hejmarnav pir çalak in û hejmarên nû bi hêsanî ji wan tên çêkirin û herwiha ew bi hin qeydên giştî dibin hejmarên rêzî yan rengdêr jî lê cînav di peyvsaziyê de qels in û kêr peyvên nû ji wan tên dariştin an pêkanîn.

4. TILHEJMARÊN KURDÎ: VARYANT Û ETÎMOLOJIYA WAN

Tilhejmar (tiljimar) an bi navê xwe yê din "hejmarên yeke" anku 1 – 9 di kurdî û piraniya zimanên din jî yên hindûewropî de pir kevnar in û reh û rîşên wan digihin makezimanê proto-hindûewropî. Ew di piraniya zimanan de peyvên xwerû ne anku ne ji ti peyvên din hatine çêkirin.¹¹

Bi gotineke din, hevrehên navên hejmarên 1 – 9 yên kurdî di hemû lehceyên kurdî de, di piraniya zimanên îranî de û di piraniya zimanên hindûewropî de jî di zimanên ji Hindistanê heta Bakur-Rojavaya Ewropayê de peyda dibin.

Bo diyarkirina etîmolojiya navên tilhejmarên 1 – 9 yên kurdî, em ê tabloyeke navên van hejmaran bi zarên kurdî û zimanên din yên hindûewropî pêşkêş bikin. Em ê li destpêka tabloyê formên standard an serdest yên kurmancî, dûv re yên lehceyên din yên kurdî (soranî, başûrî, hewramî, zazakî), paşî jî zimanên îranî yên niha navên van hejmaran bi farisî, pey re jî zimanên îranî yên navîn bi pehlewî û jî zimanên îranî yên kevn jî bi avestayî bidin. Piştî zarên kurdî û zimanên îranî, em ê berê xwe bidin şaxên din yên zimanên hindûewropî û ji van zimanan nimûneyan bidin: sanskrîtî, hindî, rûsî, yûnanî, latînî, îtalî, spanî, fransî, inglîzî û almanî. Em ê isbat bikin ku navên hejmarên 1 – 9 bi hemû van zimanan bi eslê xwe yek in lê bi demê re ji hev cuda bûne û dûr ketine lê dîsa jî yekîtiya eslê piraniya wan berçav e.

	1	2	3	4	5	6	7	8	9
kurmancî, standard	yek	du	sê	çar	pênc	şeş	heft	heşt	neh
kurmancî, varyant	êk, yêk	di, dû, dudu ¹²	sisê	çiwar	pênc	-	-	heyşt	-
soranî	yek	dû	sê	çwar, çar	pênc, penc	şeş	hewt, heft	heşt	no

¹¹ Navê hejmara 0 ne wiha ye, bi eslê xwe di piraniya zimanan de peyveke wergirtî yan çêkiriye û bi nisbê nû ye (1000 – 2000 salî ye). Em ê dû bi hûrgilî behsa wê û sebebên cudahiya wê bikin. Di hin zimanan de navê hin ji hejmarên 1 – 9 jî dikarin çêkirî bin. Bo nimûne, di zimanê finlandî de – ku ne zimanekî hindûewropî ye – navê hejmarên 9 (yhdeksän) û 8 (kahdeksan) bi eslê xwe ji "yhde-deksän" (yek [ji] dehê [kêm]) û "kahde-deksan" (du [ji] dehê [kêm]) in. "Yhde-" û "kahde-" rehê peyvên "yksi" (1) û "kaksi" (2) yên xwemalî ne, "deksa-/deksä-" (10) ji zimanekî hindûewropî ye (bidin ber kurmancî "deh", zazakî "des", yûnanî "dêka", sanskrîtî "deksa-"...) Wek hejmareke serbixwe "deksa-/deksä-" di finlandî de peyda nabe û navê hejmara 10 "kymmenen" e.

¹² Herwiha bi şiklê "dido, didu, dudo..."

kurdiya başûrî	yek	dü, di, du	sê, si	çwar	penc	şeş	heft	heşt, heşt	nû
hewramî	yek	diwê	yerê	çwar	penc	şiş	hewt	heşt	no
zazakî	yew ¹³	di, didi	hîrê	çar, çihar, çehar	panc	şeş	hewt	heşt	new
farisî	yek	do	sê	çehar, çar	penc	şêş, şîş	heft	heşt	noh
pehlewî	yek	do	sê	çehar	penc	şeş	heft	heşt	noh
avestayî	eêwe-	duwe	thrayo	çethvaro	pençe	xşuweş	hepte	eşte	newe
sanskritî	êkem	dvê	trîni	çetvarî	pençe	şet	septe	eşte	neve
hindî	êk	do	tîn	çar	pañç	çat	sat	ath	new
rûsî	odin	dva	trî	çêtîrê	pyat	şêsti	sêmi	vosêmi	dêvyati
yûnanî	êna	dhuo	trîa	têththera	pênte	êsî	êpta, êfta	oktû	ennêa
latînî	ünus	duo	três	quattuor	quîn-que	sex	septem	octō	novem
îtalî	uno	due	tre	quattro	cinque	sei	sette	otto	nove
spanî	uno	dos	tres	cuatro	cinco	seis	siete	ocho	nueve
fransî	un	deux	trois	quatre	cinç	six	sept	huit	neuf
inglîzî	one	two	three	four	five	six	seven	eight	nine
almanî	ein	zwei	drei	vier	fünf	sechs	sieben	acht	neun
Hemû ji proto-hindûewropî¹⁴	oi-no- ¹⁵	d(u)wo-	trei-	k ^w etwor- ¹⁶	penk ^w e	s(w)eks	septm ¹⁷	oktō	newṅ

Niha jî kerem bikin çend gotinan li ser her navê(n) tilhejmareke kurdî 1 – 9.

¹³ Li jor devokan herwiha "jew, jû, zû..."

¹⁴ Binêrin bo nimûne: https://en.wikipedia.org/wiki/Proto-Indo-European_numerals

¹⁵ Dengê *O yê proto-hindûewropî di zimanên îranî de adeten dibe E

¹⁶ Dengê *K yê proto-hindûewropî di zimanên îranî de dibe S, Ş yan Ç.

¹⁷ Dengê *S yê proto-hindûewropî di zimanên îranî de adeten dibe H.

Yek

Navê hejmara 1 di piraniya devokên kurmançî, soranî û kurdiya başûrî û hewramî de "yek" e. Di kurmançiya rojhilatî de ew bi piranî "êk" yan "yek" e. Wek paşgir ew di kurmançî de "-ek, -yek" (bo nimûne "kitêb-ek, rojname-yek"), di soranî de "-ek, -yek" yan "-êk, -yêk". Di zazakî de varyantên bi K wek navê navê serbixwe yê hejmara 1 peyda nabe lê forma standard "yew" û varyantên wê jî "jew, jû, zû..." ne. Lê di zazakî de jî forma bi K wek paşgira "-êk, -yêk" li kar e.

Ji zimanên kevn yê îranî û zimanên din yê hindûewropî diyar e ku dengê destpêkê Y paşî li peyvê zêde bûye. Dengê K di navê vê hejmarê yê gelek zimanên hindî-îranî de hene lê di zimanên din yê hindûewropî de peyda nabe û herwiha di gelek zar û zimanên îranî de jî tine ye (bo nimûne peşûtî "yew" û zazakî "yew, jew, jû, zû..." ku di tiyên wan de K nîne.

Wek din jî navê vê hejmarê yê hindî-îranî bi dengên xwe ji navên vê hejmarê yê bi zimanên din dût bûye ji ber ku di zimanên din de bi piranî dengê N heye ku di formên hindî-îranî de peyda nabe. Kîteya pêşîn ya navê vê hejmarê di proto-hindûewropî de *oi- bû ku di piraniya zimanên hindûewropî de bûye u- yan o- lê di zimanên hindî-îranî de veguheriye "ew-", "ye-" yan "ê-".

Du

Navê hejmara 2 di kurmançî de bi piranî wek "du", kêman jî wek "di" yan "dû" tê nivîsîn. Ji bilî van, di kurmançiya navendî û rojavayî de formeke dubarekirî ya heman peyvê wek "dudu" yan jî bi formeke wê ya wek "dido, didu, dudo" bi serbixweyî anku ne wek pêşdiyarker (ne navdêrek bi wê re) tê xebitandin. Heman peyva dubarekirî di hejmara "3" de jî li kar e (binêrin jêrtir). Ev diyarde ne di kurmançiya rojhilatî de û ne jî di soranî de peyda nabe.

Di soranî de navê hejmara 2 "dû" ye ku kêman wek "du" (bi "waw"ekê) jî tê nivîsîn. Di kurdiya başûrî de heman hejmar li gor devokan bi formên "dû, di, du" tê bihîstin. Di zazakî de ew bi awayê "di" ye – li hin deran "didi" jî wek di kurmançiya navendî û rojavayî de li kar e. Di hewramî de ev hejmar bi şiklê "diwê" yan "dwê" ye.

Hevrehîtiya navên hejmara 2 di zimanên hindûewropî de bi ihtimaleke mezin ji navên hemû hejmarên din baştir berçav û diyar e. Di piraniya mitleq ya zimanên hindûewropî de navê vê hejmarê bi dengê D dest pê dike û herwiha dengê ji U, Û, O yan W tê de heye. Di zimanên germeî de D-ya

wê bûye T (bo nimûne inglîzî "two", swêdî "två") û ji heman malbatê di almanî de bûye Z jî (zwei) lê dîsa jî hevrehîtiya wan diyar e.

Sê

Navê hejmarê 3 di hemû devokên kurmancî û soranî de "sê" ye. Di kurmanciya navendî û rojavayî de herwiha forma "sisê" jî di bikaranîna serbixwe de li kar e. Di kurdiya başûrî de jî forma serdest "sê" ye lê varyanta "si" jî peyda dibe.

Navê hejmarê 3 di hewramî (yerê) û zazakî (hîrê) de ji navê wê yê kurmancî, soranî û herwiha farisî û pehlewî "sê" jî dûr dixuyin. Li aliyekî din, forma hewramî "yerê" û bi taybetî jî forma zazakî "hîrê" zêdetir dişibin navên vê hejmarê yên bi piraniya zimanên din yên hindûewropî, bo nimûne avestayî "thrayo" yan inglîzî "three". Wek mînak, di van zimanan de jî R di peyvê de heye lê di peyva "sê" de peyda nabe. Sebeb ew e ku T-ya vê peyvê hê li serdema zimanên kevn yên îranî (bo nimûne avestayî) bûbû "th-" anku S-ya navdidanî yan jî S-ya "fis" wek di inglîzî de jî di navê vê hejmarê de "three" yan jî di erebî de di navê heman hejmarê de "thelathe". Dûv re di kurmancî, soranî, farisî û pehlewî de ev deng bûye S-ya "normal". Herçi zazakî ye, wê S-ya navdidanî kiriye H wek çawa ku hemû zimanên îranî S-ya peyva *septm (7) ya proto-hindûewropî kiriye H-ya peyva "heft" yan S-ya *sem- ya proto-hindûewropî kiriye H-ya "hem, heman, hev, hemû..." Hewramî taliyê H jî xistiye û Y li cihê wê daniye. Hewramî û zazakî R-ya vê hejmarê jî parastiye, berevajî kurmancî, soranî, farisî û pehlewî.

Çar

Navê hejmarê 4 di piraniya zimanên îranî, hindî û slavî de dişibe navê vê hejmarê yê kurmancî tevî ku baş tê dîtîn ku di kurmancî de bi zelalî kurttir û sadetir bûye: kurmancî "çar", soranî û kurdiya başûrî "çîwar, çwar", zazakî "çar, çihar", farisî "çehar, çar", pehlewî "çehar", avestayî "çethvaro", sanskrîtî "çetvari", rûsî "çêtîrê", ukraynî "çotiri", polonî "cztery". Herwiha di zimanê ermenî û zimanên keltî de jî hê dişibe ya kurdî: ermenî "çorş", skotî "ceithir", îrlandî "ceathair" (di van zimanan de C wek Ç-ya kurdî tê gotin, ne wek C-ya kurdî).

Lê gava ku mirov li zimanên romansî (zimanên ji latînî peyda bûyî) dinêre, dibîne ku dengê destpêkê ne Ç lê K ye (Q di van zimanan de wek K-ya kurdî tê gotin, ne wek Q-ya me): latînî "quattuor", îtalî "quattro", portugalî "quatro", spanî "cuatro" (bixwîne [kwatro]).

Di eslê peyva proto-hindûewropî jî di rastiye de li destpêkê K hebû ku di gelek zimanan de bûye Ç. Ev diyardeyeke berbelav ya dengnasî ye ku K-ya proto-hindûewropî di hin şaxên zimanên hindûewropî de (bi taybetî di zimanên hindûîranî û balto-slavî de) dibe Ç yan S.

Lê gava ku mirov li zimanên germenî dinêre, dibîne ku dengê destpêkê yê navê vê hejmarê ne Ç û ne jî K lê F ye: bo nimûne inglîzî "four", swêdî "fyra", almanî "vier" (bixwîne [fir]). Sebebê peydabûna dengê F li destpêka navê hejmara 4 di zimanên germenî de navê hejmara 5 e ku zimanên germenî bi F ye: bo nimûne almanî "fünf", swêdî "femma", inglîzî "five".¹⁸

Pênc

Navê hejmara 5 di hemû devokên kurmançî de "pênc" e.¹⁹ Di soranî de ew wek "pênc" û "penc" peyda dibe, di zazakî de "panç" e. Di piraniya zimanên din yên îranî de vokala wê E ye/bû: farisî, pehlewî, partî, belûçî "penc" lê peştûyî "pindze", osetî "fonç". Di avestayî de "peñçe" bû, di sanskrîtî de peñcen", bi hindî "pañç" e. Wek ku tê dîtin, ti guman ji hevrehîtiya wan di nav zimanên hindûîranî de nîne. Di yûnanî de jî bi şiklê xwe yê "pênte" pir nêzîkî van zimanan e.

Eger mirov li rûsî binêre, dibîne ku navê vê hejmarê bi şiklê "pyati" ji kurdî dûr ketiye û heta belkî mirov bikeve ber şik û gumana hevrehîtiya wan jî. Lê eger em li hin zimanên din yên balto-slavî binêrin, em ê bibînin ku di hin zimanan de formên navbera wan hene ku dikarin bi guherînên hêdî-hêdî têkiliya peyva kurdî û ya rûsî biselmînin: lîtwanî "penki" (bixwîne "pênkî"), latviyayî "pieci" (bixwînin "piyêçî"), polonî "pięć", belarûsî "pyaçi", rûsî "pyati".

Eger em berê xwe bidin rojavatir û li zimanên germenî binêrin, em ê bibînin ku navê hejmara 5 ne bi P lê bi F dest pê dike: almanî "fünf", swêdî, danmarkî û norwecî "fem", holendî "vijf" (bixwînin

¹⁸ Bo tesîra navên hejmaran li hev di kurdî de, li jêrtir li navê hejmarên 8 û 9 binêrin.

¹⁹ Ew carinan wek "pênç" anku bi Ç tê nivîsîn lê ev awayê nivîsînê di kurmançî de ji tesîra nivîsîna tirkî ye ji ber ku tirkî C li dawiya peyvan adeten dike Ç.

"feyf"), inglîzî "five" (bixwînin "fayv"). Lê wek ku me hê di nav malbata îranî de di zimanê osetî de dît, P dikare bibe F ("fonç"). Wek din jî pevguherîna F/P diyardeyeke berbelav ya dengnasî ye.

Cudahiya din ya serekî di zimanên germenî de peydabûna F yan V li dawiya peyvê ye ku di zimanên îranî de C/Ç heye. Ew ji sebebê guherîna dengê dawiyê bi dengêkî wek dengê destpêkê ye. Ev diyarde di zimannasiyê de bi navê asîmîlasyonê anku wekhevkirinê tê nasîn. Hê deqîqtir, ev "asîmîlasyona pêşvero" ye anku dengêkî pêştir tesîrê li dengêkî li dûv xwe dike.

Bo diyardeyeke ya asîmîlasyonê lê ber bi paşve anku "asîmîlasyona paşvero" yanî guherîna dengê destpêkê bi dengê dawiyê di navê heman hejmarê de di zimanên romî de diyar e: latînî "quînque" (bixwînin "kînkê") ku ew jî wek "pênc" a kurdî ji "*pénk" e" ya proto-hindûewropî ye lê K-ya destpêka kîteya duyem P-ya destpêka kîteya yekem jî kiriye K.

Paşî heman peyv di zimanên niha yê romî de dîsa ketiye ber dîsîmîlasyonê anku ferqbûnê û di zimanên niha yê romî de dengê destpêkê êdî ne K ye lê venegeriya P-ya eslî jî lê bûye Ç yan S: îtalî "cinque" (bixwîne "çînkê"), spanî "cinco" (bixwîne "sînc"), portugalî "cinco" (bixwînin "sînc"), fransî "cinque" (bixwînin "sînc").

Şeş

Navê hejmara 6 di hemû zarên kurdî de û herwiha di piraniya zimanên din jî yê îranî de "şeş" e lê di kêma ji wan de vokala E bi A (tacikî) yan jî bi Î (farisiya devkî) guheriye. Di pehlewî de jî navê vê hejmarê "şeş" bû, di avestayî de "xşveş", di sanskrîtî de "şesh", hindî "çeh".

Di zimanên balto-slavî de jî navê vê hejmarê hê niha jî pir dişibe navê wê yê kurdî: lîtwanî "šeši", latviyayî "seši", rûsî "şesti", bulgarî "şest", çekî "šest" û hwd.

Navê vê hejmarê yê bi zimanên germenî hinekî ji navê wê yê kurdî dûr ketibe jî, dîsa hevrehiya wan diyar e: danmarkî û norwecî "seks", swêdî "sex" (bixwînin "sêks"), almanî "sechs" (bixwînin "sêks"), holendî "zes", inglîzî "six" (bixwînin "sîks") û hwd.

Dîsa di zimanên romî de jî hê hevrehiya wan li gel peyva kurdî berçav e: latînî "sex" (bixwînin "sêks"), spanî û portugalî "seis", fransî "six" (bixwînin "sîs" yan "sî"), îtalî "sei".

Di yûnanî de navê vê hejmarê "hêks" û di ermenî de jî "vêç" bi dengê xwe ji "şeş" ya kurdî pir dûr ketine lê dîsa jî ew jî hevrehên "şeş"ê ne û vedigerin rehê "*swéks" yê makezimanê proto-hindûewropî.

Li aliyekî din, herwiha navê vê hejmarê yê bi zimanên samî jî dişibe navê wê yê bi zimanên hindûewropî. Em çend nimûneyan ji zimanên samî bidin: îbrî/îbranî "şêş", aramî "şita", erebî "sitte", amharî "sidst" ... lê wekheviya wan li gel yên hindûewropî ihtimalen tesadîfî ji ber ku hejmarên din yên sade ne wek hev yan nêzîkî hev in. Li aliyê din, şibîna "6" ya hindûewropî li gel sekiz (heşt) ya tirkî û zimanên din yên tûranî bi zelalî tesadîfî ye.

Heft

Navê hejmara 7 di hemû piraniya devokên kurmançî de "heft" e lê di hin devokên sinorî yên navbera kurmançî û soranî de dikare wek "hewt" jî were bihîstin.²⁰ Di kurdiya başûrî (feylî, kelhurî, kirmaşanî) de jî ew bi awayê "heft" e, di soranî de li hin deveran "heft" e lê bi piranî "hewt" e, di zazakî de bi piranî "hewt", carinan jî "hot" e.

Tiştêkî ecêb yê dengnasî di vê peyvê de H-ya wê ye ku ne wek H-ya di peyvên wek "her, heval, hatin, havîn" lê wek H-ya di navên Hesên û Hisên de ye. Ev deng di vê peyvê de di hemû lehceyên serekî yên kurdî de wiha ye tevî ku di piraniya zar û devokên kurdî de dengê H di peyvên xwemalî de yan peyda nabe yan jî pir nadir e.²¹

Di zimanên din jî yên îranî de navê vê hejmarê wiha ye/bû: farisî, pehlewî û partî "heft", belûçî "hept", avestayî "hepte-". Herwiha di yûnanî de jî "hêpta" ye.

Wek din li derveyî zimanên îranî, dengê destpêkê ne H lê S ye: sanskrîtî "septan", latînî "septem", lîtwanî "septyni"... Diyardeyeke giştî ya dengnasiya dîrokî ya zimanên îranî ye ku S-ya proto-hindûewropî di zimanên îranî de dibe H. Bo nimûne: inglîzî "same" lê kurdî "hem, heman, hev", inglîzî "summer" lê kurdî "havîn".

²⁰ Carinan wek "hevt" jî di nivîsînê de tê dîtin lê ev tenê şaşiyê nivîsînê ye, di rastiyê di ti devokên kurdî de dengê V û T li pey hev di axiftinê de nayê.

²¹ Istisna û awarteyîyek jî vê kurmançiya navendî ye ku di gelek peyvên din jî yên xwemalî de li cihê H-ya wek di peyva "hatin" de, H-ya wek di navê Hesên de dixebitîne: hemû, hirc, hezar... ku di devokên din de bi H-ya wek di peyva "hatin" de tên gotin.

Ji hin zimanan P/F ketiye: hindî "sat", spanî "siete". Di fransî de P di nivîsînê de maye lê êdî nayê gotin: sept (bixwînin "sêt").

Di inglîzî de P/F bûye V (seven), di almanî de bûye B (sieben). Di rûsî de PT ketiye û wek "sêmi" maye. Di ermenî de ji berê ve S ketiye: bi ermeniya kevn navê vê hejmarê "êawtn", niha "yot".

Navê vê hejmarê bi zimanên hindûewropî herwiha pirr dişibe ya zimanên samî jî: erebî "seb'e", maltayî "sebgħa", aramî "şeb'a", îbrî "şeva" lê nêzîkiya wan ihtimalen tenê tesadîfî ye (lê herwiha binêrin hejmara "şeş" li jortir ku ew jî di zimanên hindûewropî û yên samî de dişibin hev.)

Heşt

Navê hejmara 8 di piraniya devokên kurmançî de "heşt" e lê li gelek deveran jî bi awayê "heyşt" e. Di kurmançiya rojhilatî de û herwiha di zimanê nivîskî de forma serdest "heşt" lê di kurmançiya navendî de û herwiha hin caran di nivîsînê de jî forma "heyşt" li kar e.

Di kurmançiya rojhilatî de dengê destpêkê wê wek H-ya di peyva "heval" de ye lê di kurmançiya navendî de ew deng wek H-ya di peyva "heft" yan di navê "Hesen" de ye.

Di soranî de forma serdest û "heşt" e (bi H-ya wek di peyva "heval" de), di kurdiya başûrî de li hin deveran "heşt" û li hinan jî "heyşt". Bi zazakî û hewramî jî "heşt" e.

Ji nav zimanên din jî yên îranî yên niha bi farisî û belûçî jî "heşt" e, bi osetî "est" û bi peştûyî jî "eti". Di avestayî û sanskrîtî de "ešte" bû. H-ya niha li destpêka navê hejmara 8 ji tesîra H-ya di peyva "heft" de ye: bi analojîyê anku wekhevûnê H li navê hejmara 8 jî zêde bûye.

Di hevrehên wê yên bi zimanên din jî yên ewropî de bi piranî H nîne: almanî "acht" (bixwînin "axt"), inglîzî "eight" (bixwînin "êyt"), swêdî "åtta" (bixwînin "otta"), yûnanî "okto", latînî "octo" (bixwînin "okto), îtalî "otto", spanî "ocho" (bixwînin "oço"). Fransî wek "huit" bi H dinivîse lê bêyî H wek "wît" dibêje. Di ermenî de bûye "uyt".

Di nav zimanên balto-slavî de, di şaxê baltî de hê pir nêzîkî formên bi zimanên îranî maye: lîtwanî "aštuoni", latviyayî "astoņi". Lê di zimanên slavî de ji formên îranî dûr ketiye: rûsî "vosêmi", polonî "osiem". Lê di wan de jî hê dengê S maye ku hevberî dengê Ş yê zimanên îranî ye di vê peyvê de. O-ya wê jî wek ya gelek zimanên din yên hindûewropî ye ku di zimanên îranî de bûye E.

Neh

Navê hejmara 9 di tevahiya kurmancî de "neh" e lê li hin deveran H-ya dawiyê dikare neyê gotin. Hin caran ew dikare wek "nih" jî were gotin.

Di zazakî de navê vê hejmarê "new", di soranî de "no" û di kurdiya başûrî de jî li deveran "nûe" û li hinan jî "nû" ye û li çend deveran jî "nih".

Di nav zimanên din yê îranî de navê vê hejmarê wiha ye/bû: farisî "noh", pehlewî "no", avestayî û hexamenişî "neve-". Di sanskrîtî de jî "neve" bû, di hindî de "new" e.

Di piraniya şaxên din jî yê hindûewropî de navên vê hejmarê hê jî gelek nêzîkî formên wê yê îranî maye. Di nav zimanên germenî de bi almanî "neun", bi swêdî "nio", bi inglîzî "nine" (bixwînin "nayn"). Di yûnanî de "ênnea" ye. Di zimanên romî de wiha ye: latînî "novem", îtalî û portugalî "nove", spanî "nueve", fransî "neuf" (bixwînin "nöf").

Wek ji zimanên din diyar e, H li dawiya peyvê nîne û di kurmancî û farisî de ew diyardeyeke nû ye. H-ya wê bi ihtimaleke mezin ji H-ya "deh"ê ye bi analojîyê anku wekhevûnê. Lê wek din jî di zimanên îranî de H û V dikarin bikevin cihên hev, bo nimûne farisî "kohî, kohen" lê kurmancî "kovî, kevn".

Di zimanên balto-slavî de jî tesîra navê hejmara 10 li ser navê hejmara 9 bûye lê ne li dawiyê lê li destpêkê. Ji ber ku li destpêka navê hejmara 10 de di zimanên hindûewropî de D heye, di zimanên balto-slavî de D li destpêka navê hejmara 9 jî cih ji dengê N standiye: lîtwanî "devynî", çekî "devět", rûsî "dêvyati" û hwd.

Deh

Navê hejmara 10 di piraniya devokên kurmancî de "deh" e lê li hin deveran bêyî H-ya dawiyê anku wek "de" tê gotin. Herwiha wek paşgir di hejmarên 11 – 19 de li piraniya deveran wek "-de" anku bêyî H-ya dawiyê tê gotin tevî ku li heman deverê wek navê hejmara 10 bi awayî "deh" jî be.

Di soranî "de" e, di kurdiya başûrî de li gor deveran dikare "dye", "de" yan "deh" be. Di farisî de jî wek di kurmancî de "deh" e lê wek paşgira navên hejmarên 11 – 19 di farisî de jî di zimanê devkî dikare bêyî H-ya dawiyê were bikaranîn. Di pehlewî de jî "deh" bû.

Di zazakî de "des" e, di avestayî û sanskrîtî de "dese-" û di rûsî de "dêsyati" û ermenî de jî "tas" e. Bo guherîna dengên H û S bi hev, bidin ber kurmancî "masî, asin/hesin" lê farisî "mahî, ahen".

Di zimanên din yên hindûewropî de: yûnanî "dêka", latînî "decem" (bixwînin "dêkêm"), portugalî "dez", spanî "diez", îtalî "dieci", fransî "dix" (bixwînin "dîs"), inglîzî "ten", almanî "zehn", swêdî "tio".

Eslê peyvê di makezimanê proto-hindûewropî de wek *dékṃ hatiye veavakirin. Hatiye pêşniyazkirin eslê wê jî *de-kṃt be ku ji maneya "du dest" anku "tiliyên du destan" bide.²²

5. HEJMARÊN DEHGIR

Navên hejmarên dehgir anku 11 – 19 di kurmancî û zazakî de bi du desteyên serekî peyda dibin.

Di desteya kevnar, standard û – bi kêmî di kurmancî de – serdest de navê hejmarê ji formeke navê tilhejmarê li destpêkê formeke navê hejmara 10 jî li dûv wê ava bûye. Bo nimûne:

- desteya tilhejmar + -deh: 14 = çardeh (çar-deh, 4 + 10)

Desteya duyem ji formeke navê hejmara 10 li destpêkê, peyvika "û" li navê û navê tilhejmarê jî li dawiyê ava bûye:

- desteya deh + tilhejmar: 14: dehûçar (deh-û-çar, 10 + û + 4)

5.1. Desteya deh + tilhejmar

²² <https://en.wiktionary.org/wiki/Reconstruction:Proto-Indo-European/d%C3%A9%E1%B8%B1m%CC%A5>

Desteya deh + tilhejmar ji navê hejmara 10 li destpêkê, peyvika "û" li navê û navê tilhejmarê jî li dawiyê pêk tê.

Di eslê xwe de navê hejmarên 11 – 19 li gor vê desteyê wiha ye:

Hejmarên 11 – 19 li gor desteya deh + -û- + tilhejmar (bi nivîskî)	
11	dehûyek
12	dehûdu ²³
13	dehûsê ²⁴
14	dehûçar
15	dehûpênc
16	dehûşeş
17	dehûheft
18	dehûheşt
19	dehûneh

Lê di pratîkê de di piraniya devokên kurmançiya rojavayî de formên wisa li kar in ku tê de H-ya peyva "deh" ketiyê²⁵ û peyvika Û li pey vokala peyva "de-" bûye W û encameke wiha jê derketiye:

Hejmarên 11 – 19 li gor desteya deh + -û- + tilhejmar (devokên kurmançiya rojavayî)	
11	dewyek
12	dewdu ²⁶
13	dewsê ²⁷
14	dewçar
15	dewpênc
16	dewşeş
17	dewheft

²³ Herwiha "dehûdudu, dehûdido, dehûdudo..."

²⁴ Herwiha "dehûsisê".

²⁵ Bo ketina H-ya dawiya "deh"ê herwiha li desteya "tilhejmar + deh" li jêtir binêrin.

²⁶ Herwiha "dewdudu, dewdido, dewdudo..."

²⁷ Herwiha "dewsisê".

18	dewheşt
19	dewneh ²⁸

Desteya deh + tilhejmar di kurmançiya rojavayî de li kar e. Ew herwiha di zazakî de, bi taybetî jî di zazakiya bakurî anku li Dêrsimê û derdorên wê serdest e yan jî niha êdî tekane alternatîv e.

Hejmarên 11 – 19 li gor desteya deh + -û- + tilhejmar (bi zazakiya nivîskî)	
11	desûyek
12	desûdi
13	desûhîrê
14	desûçar
15	desûpanc
16	desûşeş
17	desûhewt
18	desûheşt
19	desûnew

Ji aliyê dîrokî ve desteya deh + tilhejmar ji desteya tilhejmar + deh nûtir e. Di piraniya reha û mitleq ya zimanên îranî de navê hejmarên 11 – 19 bi desteya navê tilhejmar + deh e (li jêrtir binêrin).

Desteya deh + tilhejmar dikare ji ber tesîra tirkî be ji ber ku di tirkî de jî navê hejmarên 11 – 19 bi navê "deh" (bi tirkî "on") + navê tilhejmarê tê avakirin, bo nimûne:

- 11: onbir (ji "on = deh" + "bir = yek)
- 14: ondört (ji "on = deh" + "dört")

Lê hêjayî gotinê ye ku di tirkî de hevwateriya peyvika "û" ya kurdî (bi tirkî "ve") di navbera "deh"ê û tilhejmarê de nîne. Loma qalibê kurdî û yê tirkî li vê derê ne bi tamamî wek hev in:

- qalibê kurmançiya rojhilatî: deh + û + tilhejmar
- qalibê tirkî: on (deh) + tilhejmar

²⁸ Herwiha "dewne".

Qalibê hejmarên 11 – 19 yên kurmanciya rojavayî di rastiye de wek qalibê hejmarên mezintir yên kurdiya giştî, bidin ber hev:

- dehûçar (deh-û-çar)
- bîstûçar (bîst-û-çar)
- heftêûçar (heftê-û-çar)
- ...

Di rastiye de di zimanên kevn yên îranî de hemû hejmarên 11 – 99 bi qalibê tilhejmar + dehhejmar bûn. Bo nimûne:

- avestayî: 25 pença-ce-vîseyti (peyv bi peyv: pênc-û-bîst)

Qalibên wiha hê jî di hin zimanên hindûewropî de hene. Bo nimûne:

- almanî: 25 fünfundzwanzig < fünf und zwanzig (peyv bi peyv: pênc-û-bîst)
- peştûyî: 25 pincê wîşt (pênc-bîst)

Piraniya zimanên hindûewropî di hejmarên ji bîstê mezintir de dest jî vî qalibî berdaye û dehhejmarê li berî tilhejmarê rêz dikin. Bo nimûne navê hejmara 25 bi hin zimanên din (wergera peyv-bi-peyv di kevanokan de):

- inglîzî: twenty-five (bîst-pênc)
- fransî: vingt cinque (bîst pênc)
- rûsî: двадцати pyati (bîst pênc)

Li derveyî zimanên hindûewropî, bo nimûne di erebî de jî peyvrêziya hejmarên 11 – 99 wek di almanî de ye:

- 25: xemse we işrûn (pênc û bîst)

5.2. Desteya tilhejmar + 10

Tevî ku di piraniya zimanên hindûewropî de peyvrêziya navên hejmarên 21 – 99 ji formûlaya "tilhejmar + dehhejmar" veguheriye qalibê "dehhejmar + tilhejmar", dîsa jî di navê hejmarên 11 –

19 de bi piranî formûlaya "tilhejmar + deh" hatiye parastin. Di vê sîstemê de navê hejmara biçûktir berî navê hejmara 10 tê.

Kerem bikin em li navê hejmarên 11 – 19 bi kurmancî binêrin û paşî wan li gel formên zar û zimanên din yê lêzim bidin ber hev û behsa çêbûna wan bikin:

Hejmar	Forma serekî	Formên din	Bidin ber ²⁹
11	yazde(h)	yande(h)	"yek-deh"
12	diwazde(h)	dozde(h), dazde(h), diwanzde(h), donzde(h), danzde(h)	"du-deh"
13	sêzde(h)	-	"sê-deh"
14	çarde(h)	-	"çar-deh"
15	pazde(h)	panzde(h)	"pênc-deh"
16	şazde(h)	şanzde(h)	"şeş-deh"
17	hevde(h)	hivde(h)	"heft-deh"
18	hejde(h)	hijde(h), hîjde(h)	"heşt-deh"
19	nozde(h)	-	"neh-deh"

Çawaniya çêbûna vê desteya hejmaran baş ji navê hejmara 14 "çar-deh" baş diyar dibe. Wek din, di navê hemû hejmarên din yê 11 – 19 de guherîn peyda bûye anku ne yekser ji tilhejmara xwerû û ji peyva "deh" peyda bûne.

Sebebên guherînê yek jê ew e ku gava ev hejmar di zimanî de ji navê tilhejmaran û navê hejmara 10 peyda bûne, navê hejmarên 1 – 9 bi xwe ne wek niha bûn. Sebaba duyem jê ew e ku piştî hingê gelek guherîn jî hem di navên hejmarên 1 – 10 de û hem jî di navên hejmarên 11 – 19 de peyda bûye.

Kerem bikin em pêşî navên van hejmaran li gel navên wan yê bi zar û zimanên din yê lêzim re bidin ber hev. Bo ku cihê wan bike, em ê hejmarên 11 – 15 di tabloyekê de û 11 – 19 jî di xîşteyê de din de pêşkêş bikin. Bo dirêjnekirina meseleyê, ji her zar û zimanî tenê forma serdest di tabloyê de

²⁹ Peyvên di van malikan de wek navên hejmarên 11 – 19 li ti deverê nayên bikaranîn. Ev tenê bo fehmkirina peydabûna navên "yazdeh, diwazdeh, sêzdeh..." hatine nivîsîn.

hatiye dan. Varyantên devokî yên kurmancî li tabloya jortir de ne. Varyantên zarên din yên kurdî di jêrenotan de ne.

Hejmarên 11 – 15 li gor formûlaya "tilhejmar + 10"					
zar/ziman	11	12	13	14	15
kurmancî	yazde(h)	diwazde(h)	sêzde(h)	çarde(h)	pazde(h)
sorani ³⁰	yanze	dwanze	siyanze	çwarde	panze
kurdiya başûrî ³¹	yanze	dwanze	sêzde	çwarde	panze
hewramî	yanze	dwanze	sênze	çwarde	panze
farisî	yazde(h)	dwazde(h)	sîzde(h)	çeharde(h)	panzde(h)
pehlewî	yazdeh	dwazdeh	sîzdeh	çehardeh	panzdeh
zazakî ³²	yewendes	duwês	hîrês	çarês	pancês
avestayî	eêwendese	dwendese	thrîdese	çethrudese	pençedese
sanskritî	êkadese	dvadese	treyodese	çeturdese	pançedese
rûsî ³³	odinnadçati	dvênadçati	trinadçati	çêtirnadçati	pyatnadçati
yûnanî ³⁴	êndêka	dhodêka	trîskaydêka		
latînî	undecim	duodecim	tredecim	quattuordecim	quindecim
fransî	onze	douze	treize	quatorze	quinze
inglîzî ³⁵			thirteen	fourteen	fifteen

³⁰ Varyantên din yên soranî wiha ne: 11 yazde, 12 dwanzde, 13 sêzde/sênze, 14 çarde, 15 pazde/pandze.

³¹ Guhartoyên din yên kurdiya başûrî wiha ne: 11 yazde, 13 sênze/zyade, 14 çorde.

³² Di piraniya devokên zazakî de niha desteya "deh + -û- + tilhejmar" li kar e (li jortir binêrin). Ji desteya "tilhejmar + des" mirov dikare van varyantên devokî bide: 11 yondes/zûyes, 12 duwês/duyês, 15 pancês. Di tabloyê de me zazakî nêzikî avestayî daniye ji ber ku di meseleya hejmaran de zazakî formên kevnares yên nêzikî avestayî parastine.

³³ Hejmarên 11 – 19 di rûsî û zimanên din yên slavî de bi formûlaya "tilhejmar + na (li ser) + formeke navê hejmara 10" pêk tên.

³⁴ Mebesta me li vê derê yûnaniya kevn e. Yûnaniya kevn di binavkirina hejmarên 11 – 13 de (yûnanî 11 – 12) wek kurdî sîstema "tilhejmar + deh" bi kar tîne lê di hejmarên 14 – 19 de pergala "deh + tilhejmar" dixebitîne loma me malikên 14 – 15 li vê derê vala hiştine ji ber ku peyvên yûnanî yên binavkirina van hejmaran ne li gor vê desteya kurdî ne û ji wan re ne hevreh in.

³⁵ Navê hejmarên 11 û 12 (eleven, twelve) di inglîzî de ne li gor vê sîstemê hatine avakirin û loma nikarin li gel navên wan yên kurdî werin berhevdan lê ji navê 13 û pê ve bi heman avaniya kurdî ne.

almanî ³⁶			dreizehn	vierzehn	fünfzehn
----------------------	--	--	----------	----------	----------

Hejmarên 16 – 19 li gor formûlaya "tilhejmar + 10"				
zar/ziman	16	17	18	19
kurmançî	şazde(h)	hevde(h)	hejde(h)	nozde(h)
soranî ³⁷	şanze	hevde	hejde	nozde
kurdiya başûrî	şanze	hevde	hejde	nûzde
hewramî	şanze	hewde	hejde	noze
farisî	şanzde(h)	hifde(h)	hijde(h)	nûzde(h)
pehlewî	şazdeh	heftdeh	heştdeh	nozdeh
zazakî ³⁸	şîyês	hewtês	heştês	newês
avestayî	xşûşdese	heptedese	eştadese	newedese
sanskritî	sodedese	septedese	eştadese	nevedese
latînî ³⁹	sêdecim	septendecim		
fransî ⁴⁰	seize			
inglîzî	sixteen	seventeen	eighteen	nineteen
almanî	sechzehn	siebzehn	achtzehn	neunzehn

5.3. Varyant û taybetmendiyan giştî yên 11 – 19

³⁶ Navê hejmarên 11 û 12 (elf, zwölf) di almanî de ne li gor vê sîstemê hatine avakirin û loma nikarin li gel navên wan yên kurdî werin berhevdan lê ji navê 13 û pê ve bi heman avaniya kurdî ne.

³⁷ Varyantên din yên soranî wiha ne: 16 şanzde/şazde, 17 hivde, 18 hijde/hîjde.

³⁸ Ji bilî desteya "des + û + tilhejmar", varyantên din yên desteya "tilhejmar + 10" di zazakî de wiha ne: 16 sêyês, 17 hotês.

³⁹ Latînî navê hejmarên 18 û 19 ne li gor formûlaya "tilhejmar + 10" lê bi awayê "du ji bîst" (duodēvigintī < duo dē vigintī) û "yek ji bîst" (ūndēvigintī < ūnus dē vigintī) bi kar dianîn.

⁴⁰ Fransî ji hejmara 17 û pê ve derbazî sîstema "10 + tilhejmar" dibe, bo nimûne 17 = dix-sept ("deh-heft"), 18 = dix-huit ("deh-heşt"), 19 = dix-neuf ("deh-neh").

Navên hejmarên 11 – 19 yên desteya "tilhejmar + 10" bi çendîn varyantan bi taybetî di kurmançî de lê herwiha bi rêjeyeke belkî hinekî kêmtir di zarên din jî yên kurdî de û heta di zimanên din yên îranî de jî peyda dibin.

Li vê derê em ê van taybetmendiyên varyantan rêz bikin:

Cudahiyên dangan di navbera 1 – 9 û 11 – 19 de

Hejmarên 11 – 19 bi eslê xwe ji navên hejmarên 1 – 9 + navê hejmara 10 hatine çêkirin û dişibin wan. Lê dîsa jî çendîn cudahî di navbera wan de hene:

1 û 11: Di navê hejmara 1 anku "yek" (yan "êk") de E û K hene ku di navê hejmara 11 (yazde[h]) de peyda nabin. Li aliyekî din, di hejmara 11 de dengên A û Z hene ku di "yek"ê yan "êk"ê de nînin.

Herwiha di navê 11 de N jî mimkin e (ya-n-zdeh) ku di navê hejmara 1 de ne gengaz e.

Di zazakî de di navê hejmara 11 de navgira –en– heye ku navê hejmara 1 de peyda nabe.

2 û 12: Di navê hejmara 12 anku "diwazde[h]" de A û Z hene ku di navê hejmara "du" de peyda nabin. Di navê 12 de herwiha N jî dikare hebe (diwa-n-zdeh) ku di navê 2 de peyda nabe. Hejmara 12 bi dengê –iw– (carinan "-uw-" yan jî tenê "-w-") tê nivîsîn û hejmara 2 bi dengê U lê bi eslê xwe ew eynî deng in.

3 û 13: Herdu dengên navê hejmara 13 bi kurmançî wek dengên hejmara 3 ne. Lê di navê hejmara 13 de dengê Z jî heye ku di navê hejmara 3 de peyda nabe. Herwiha di soranî, başûrî, hewramî û farisî de destpêka navê hejmara 13 "siyanz-" e ku hem N û Z tê de hene ku di navê hejmara 3 de tine ne. Herwiha li cihê vokala Ê ya navê hejmara 3, di navê hejmara 13 de dengên -iya– hene. Di zazakî de di navê hejmara 13 (hîrês) de Ê-ya navê hejmara 3 (hîrê) û Ê-ya paşgira "-ês" bi hev re bûne tenê Ê-yek.

4 û 14: Di navê hejmara 14 de hemû dengên navê hejmara 4 wek xwe hatine parastin, tenê paşgira "-de" yan "-deh" lê hatiye pêvekirin bêyî zêdekirina ti dengê din (bo nimûne Z yan N). Di lehceyên din yên kurdî de jî rewş wisa ye, bo nimûne: çwar > çwar-de, zazakî çar > çarês.

5 û 15: Di navbera navên hejmara 5 û hejmara 15 de çend cudahî hene. Vokala navê hejmara 5 di kurmancî de Ê (pênc) û di soranî de Ê yan E (pênc, penc) ye lê li cihê wê di navê hejmara 15 de di herdu lehceyan de A heye. Lê di zazakî de di navê herdu hejmaran de A heye: 5 panc, 15 pancês.

Di hemû kurmancî, soranî, başûrî û hewramî de û herwiha di farisî de jî di navê hejmara 5 de dengê C (bi kurmancî "pênc", soranî "pênc, penc", farisî "penc") lê li cihê wê di navê hejmara 15 de Z hene: kurmancî "pazde(h)", soranî "panze" û farisî "panzdeh". Lê di zazakî de herdu bi C ne: 5 panc, 15 pancês.

Herwiha di navê hejmara 5 de di hemû lehceyên kurdî de dengê N heye lê di navê hejmara 15 de di piraniya devokên kurmancî û di hin devokên soranî û başûrî de N nîne: 5 pênc, 15 pazde(h).

6 û 16: Di hemû lehceyên kurdî navê hejmara 6 "şeş" e anku vokala wê E ye. Di farisî de jî berê "şeş" bû lê niha bi devkî bûye "şîş". Lê di navê hejmara 16 (şazde[h], şanzde[h], şanze...) de li cihê E-ya navê hejmara 6 ne E lê A ye (ji bilî zazakî ku vokala navê 16 "-î" ye).

Herwiha li hevberî dengê Ş yê dawiya navê hejmara 6, di navê hejmara 16 de ne Ş lê Z heye: şazde[h], şanzde[h], şanze... Dîsa zazakî ji lehceyên din yên kurdî û herwiha ji zimanê farisî jî di vê meseleyê de cuda ye: bi zazakî 16 "şîyês" e.

7 û 17: Di navê hejmara 7 de dengê T heye ku di navê hejmara 17 de peyda nabe. Herwiha di navê hejmara 7 de dengê F heye (di soranî, zazakî û hewramî de W) ku li cihê wê di navê hejmara 17 de dengê V li kar e. Vokala navê hejmara 7 di hemû lehceyên kurdî de E ye (heft) lê di navê hejmara 17 de di hin devokan de I ye (hivde[h]).

Cudahiyêke din jî awayê gotina herfa H ya van herdu hejmaran e: Di hemû kurmancî, zazakî, soranî û hewramî de û herwiha di piraniya devokên kurdiya başûrî de jî H-ya hejmara 7 wek H-ya di navê Hesên yan Hisên de ye (bi alfabeya kurdî-erebî heft = هفت). Lê H-ya navê hejmara 17 di gelek ji van lehce û devokan de jî ne H-ya wek di peyva "heval" de ye (bi alfabeya kurdî-erebî hevde = هفده).

8 û 18: Di navê hejmara 18 de T heye ku di navê hejmara 18 de peyda nabe. Herwiha li cihê Ş-ya di navê hejmara 8 de, di navê hejmara 18 de J li kar e. Vokala herdu hejmaran di gelek devokan de eynî E ye (heşt, hejde) lê di hinan de li cihê E yan EY-a navê hejmara 8 (heşt, heşt), di navê hejmara 18 de I (hijde) heye.

9 û 19: Navê hejmarên 9 (neh) û 19 (nozde[h]) di kurmancî de bi çendîn awayan ji hev cuda ne. Ne E-ya navê hejmara 9 û ne jî H-ya wê di navê hejmara 19 de peyda nabin. Li aliyekî din, di navê hejmara 19 de O û Z hene ku ti ji wan di navê hejmara 9 de ne li kar in.

Niha jî em ê yek bi yek sebebê varyantên di hejmarên 11 – 19 de û herwiha herwiha sebebên cudahiyên navbera hejmarên 1 – 9 li aliyekî û hevberên wan 11 – 19 li aliyê din bikin.

Bi paşgira –deh yan -de

Hemû hejmarên 11 – 19 dikarin di kurmanciya nivîskî de bi paşgira –deh an –de peyda dibin:

- yazdeh, diwazdeh, sêzdeh, çardeh, pazdeh, şazdeh, hevdeh, hejdeh, nozdeh
- yazde, diwazde, sêzde, çarde, pazde, şazde, hevde, hejde, nozde

Li gor devokan di kurmanciya rojhilatî de tenê forma bi "-de" (ne bi "-deh") li kar e. Di kurmanciya navendî de li hin deveran forma "-deh" heye lê dîsa di piraniya devokên navendî de jî varyantên bi paşgira "-de" tên gotin. Di kurmanciya rojavayî de bi piranî tenê formên wek "dewyek, dewdu, dewsê..." (deh û yek, deh û du, deh û sê) tên xebitandin.

Di soranî de tenê varyantên bi paşgira "-de" hene ji ber ku navê xwerû yê hejmara 10 bi xwe jî di soranî bêyî H tê bikaranîn. Di kurdiya başûrî û di hewramî de jî forma serdest an tekane, desteya bi paşgira "-de" ye. Di zazakî de li gel navê hejmara 11 paşgira "-des" (11 = yewendes) yan jî paşgira –ês (12 duwês, 13 hîrês, 14 çarês...) tê xebitandin gava ku desteya "des û yew, des û di, des û sê..." neyê emilandin.

Di farisî de di zimanê nivîskî de formên bi paşgira "-deh" standard in lê di zimanê devkî de "-de" dîsa serdesttir e.

Li gel yan bêyî dengê N

Di navê hejmarên 11, 12, 15 û 16 de di hin devokên de dengê N heye lê di hinan de nîne:

- yazde(h), diwazde(h), pazde(h), şazde(h)
- yanzde(h), diwanzde(h), panzde(h), şanzde(h)

Di kurmancî de adeten formên bêyî N û di soranî de jî formên bi N zêdetir tên bikaranîn. Di soranî de herwiha mimkin e ku di navê hejmara 13 de jî N hebe lê haya me jê nîne ku tiştekî wisa di ti devokeke kurmancî de hebe:

- kurmancî: sêzde(h)
- soranî: siyanze, sênze, sêzde

Gelo kîjan ji herdu forman orijînaltir û kîjan jî nûtir e?

Bersiveke yekcarî nikare were dan ji ber ku tarîxiyên N di hin ji van hejmaran de hebû lê di hemûyan de tine bû. Lê hin devokan ew li van hemûyan zêde kiriye û hinan jî ew ji hemûyan avêtiye.

Dengê N di navê hejmarên 11 û 15 de orijînal e. Bo dîtina vê rastiyê, kerem bikin em li navê van hejmaran bi çend zimanan binêrin:

- 11: zazakî "yewendes", avestayî "eêwendese", yûnanî êndêka", latînî "undecim", fransî "onze", rûsî odînnadçati...
- 15: bidin ber navê hejmara 5 anku "pênc" ku N tê de heye. Herwiha bidin ber navê 15 bi hin zar û zimanên din: zazakî "pancês", avestayî "pençedese", sanskrîtî "pençadese", latînî "quindecim", fransî "quinze", almanî "fünfzehn"...

Lê berevajî wan, gava ku mirov li navên hejmarên 12, 13 û 16 yên bi zimanên din dinêre, bi zelalî dibîne ku N di piraniya wan de li nava peyvê nîne:

- 12: zazakî "duwês", sanskrîtî "dvadese", yûnanî "dhodêka", latînî "duodecim", fransî "douze"...
- 13: zazakî "hîrês", avestayî "thrîdese", sanskrîtî "treyodese", yûnanî "trîskaydêka", latînî "tredecim", fransî "treize"...
- 16: zazakî "şîyês", avestayî "xşûeşdese", sanskrîtî "sodese", latînî "sēdecim", fransî "seize"...

Lê zêdebûna N li navê hejmarên 12, 13 û 16 de ne tenê di kurdî de lê xaseten di farisî de peyda bûye. Wek ku ji navê hejmara 12 bi avestayî anku ji "dwendese" diyar e, N hê ji serdema avestayî ve dest bi belavbûna di hin hejmaran de kiriye.

Di farisî de jî navê gelek ji hejmarên 11 – 19 bi çendîn varyantan peyda dibin lê di farisî de N adeten di navê hejmarên 11, 12, 13, 15 û 16 de tê nivîsîn. Di soranî de jî bi piranî wisa tê kirin.

Lê di rastiyê de N-ya navên 12, 13 ji tesîra N-ya di navê 11 de bûye û N-ya di navê 16 de jî ji tesîra N-ya di navê 15 de ye.

Lê gelo çima N di piraniya devokên kurmançî de kurmançî de heta ji cihê bi xwe lê heyî jî anku ji navê hejmarên 11 û 15 jî ketiye?

Helbet mimkin e ku ev diyarde dikare ji ber sivikbûna dengan be:

- yande(h) > yazde(h)
- panzde(h) > pazde.

Lê eger em li peyvên "yek" û "pênc" (bi piraniya zimanên îranî "penc" yan "penç-") li aliyekî û peyvên "yazde(h)" û "pazde(h)" li aliyekî din binêrin, em ê bibînin ku di navê hejmarên 11 û 15 de dengê A heye lê di navê hejmarên 1 û 5 de E yan Ê heye. Sebebê guherîna E-ya tilhejmaran (1, 5) bi A-ya dehgiran (11, 15) bi ihtimaleke mezin bi bişaftina anku helîna E û N ye. Bi gotineke din, E û N bi hev re bûne A ji ber ku N dengêkî bêvilî ye û dikare vokala berî xwe bike bêvilî. Di pratîkê de ev bo nimûne dibe sebebê wê yekê ku dengê E nêzîkî dengê A dibe û dikare bi demê re bi tamamî bibe A.⁴¹

Di zazakî û avestayî de, ku E-ya di navên hejmara 11 de ne A ye, N jî hatiye parastin:

- zazakî: yewendes
- avestayî: eêwendese

Bi heman awayî dengê E yê hejmara 6 di navê hejmara 16 de bûye A:

- şeş > şazde(h)

Bi heman egerê mirov dikare herwiha navê hejmara 12 jî di kurdî (ji bilî zazakî) û farisî de şirove bike. Navê vê hejmarê bi kurmançî "diwazde(h)" e (li gel varyantên "diwanzde(h), dozde(h), dazde(h)") anku tê de A heye.

Em dizanin ku "diw-" wek "du" (2) ye, Z wek Z-ya di gelek hejmarên din jî yê dehgir de ye (yazdeh, sêzdeh, pazdeh, şazdeh) lê gelo A ji kû hatiye nav "diwazdeh"ê?

⁴¹ Sebebê A-ya di peyva "penc" (pênc) ya zazakî de ihtimalen tesîreke paşvero (paşvekî) ya navê hejmara "pencês" (pazdeh) e. Eger mirov li navê hejmara 5 bi zar û zimanên din binêre, mirov dê bi hêsaniyê bibîne ku dengê A di "penc"ê de tiştêkî bi rêjeyî nû ye.

Eger em li navê heman hejmarê bi avestayî "dwendese" yan sanskrîtî "dvedese binêrin, em ê bibînin ku li cihê A-ya kurdî û farisî, di wan de E heye: dwe-, dve-. Peyva kurdî "diwazdeh" jî destpêka xwe ji navê hejmara 2 digire ji serdemekê ku hê E di navê vê hejmarê de hebû anku ew "dwe-/due-" bû. Lê dîsa E li gel N bûye A wek çawa ku EN di navê hejmara 11 de jî bûye A.

Wek encam, di rastiyê de diviya ku N li nava ti ji hejmarên 11 – 19 tine bûya ji ber ku N-ya di navê 11 û 15 de heyî jî li gel dengê E heliyaye û bi hev re bûne A. Lê berî ku E bi N re bibiştir û bi hev re bibin A, N di hin zar û zimanên îranî de belav bûye nav yek yan çend hejmarên din jî yên ku tê de bi eslê xwe N tine bû (bo nimûne avestayî *dwendese > dvedese).

Dengê Z di hejmarên dehgir de

Di navê hejmarên 11, 12, 13, 15, 16 û 19 de di zarên kurdî (ji bilî zazakî), farisî, belûçî û pehlewî û hin zimanên din jî yên niha û yên navîn yên îranî de dengê Z dikeve sinorê navbera navê tilhejmarê û paşgira "-de(h)". Bi kurmancî bo nimûne:

- yazdeh, diwazdeh, sêzdeh, pazdeh, şazdeh, nozdeh.

Lê di navê dehgirên 14, 17 û 18 Z peyda nabe:

- çardeh, hevdeh, hejdeh

Lê ev Z ne di zimanên îranî yên kevn de di navê van hejmaran de heye û ne jî di piraniya zimanên din yên hindûewropî de di navê van hejmaran de. Loma divê mirov bipirse, gelo ev Z ji kû hatiye û çawa niha peyda bûye?

Wek ku tê zanîn, Z di navê hejmarên 15 û 16 de jî heye. Hêsan e mirov fehm bike ku Z di peyvên "paz-deh/panz-deh" de varyanteke dengê C di peyva "pênc" de be ji ber ku dengê C û yê Z ne gelek ji hev dûr in. Herwiha hêsan e mirov fehm bike ku Z-ya di peyva "şazdeh" de jî varyanteke dengê Ş yê li dawiya peyva "şeş" be ji ber ku dengên Z û Ş jî nêzîk in.

Lê gelo Z-ya navê hejmarên 11, 12 û 13 ji kû hatiye ji ber ku li dawiya navên hejmarên 1, 2 û 3 ti dengêkî nêzîkî Z peyda nabe ku bi Z guherîbe? Mirov nikare bibêje ku belkî serdemekê Z yan dengêkî di yê nêzîkî wî di navên hejmarên 1, 2 û 3 de hebûbe ji ber ku di zimanên kevn yên îranî de (bo

nimûne di avestayî de) ti dengê wisa di van hejmaran de tine bû û di zimanên din jî yê kevna yê hindûewropî de dengê wisa di van hejmaran de peyda nabe.⁴²

Di rastiye de Z-ya hejmarên 11, 12 û 13 bi nisbî nû ye. Bi esehî sebebê peydabûna wê nayê zanîn lê ihtimalen ew ji navên hejmarên 15 û 16 belavî navên hejmarên 11, 12 û 13 jî bûbe. Lê li aliyekî din, ev heman Z li navên hejmarên 14, 17 û 18 zêde nebûye tevî ku 14 û 17 ji 11, 12, 13 zêdetir nêzîkî 15 û 16 ne.

Li gel an bêyî dengê D

Di tevahiya kurmancî de di navê hemû hejmarên 11 – 19 de dengê D li destpêka beşa duyem heye. Beşa duyem dikare "-deh" an jî "-de" be lê her D tê de di kurmancî de heye.

Dengê D herwiha di farisiya nivîskî, pehlewî, avestayî, sanskrîtî û gelek zimanên din jî yê hindûewropî de li kar e. Paşgira "-deh /-de" ji navê hejmara 10 anku "deh" e û dengê D tê de orijînal e.

Lê rewşa hemû zarên din yê serekî yê kurdî cuda ye.

Di soranî de bi di piraniyan devokan de û herwiha bi awayekî giştî di zimanê nivîskî de jî D di navê hejmarên 11, 12, 13, 15 û 16 nayê bikaranîn:

- yanze, dwanze, siyanze, panze, şanze

Lê di soranî de jî D di navê hejmarên 14, 17, 18 û adeten di navê hejmara 19 de jî li kar e:

- çwarde, hevde, hejde, nozde

Di kurdiya başûrî û hewramî de rewş bi piranî wek di soranî de ye.

Di zazakî de navê hejmara 10 "des" e. Ew bi şiklekî neguherandî di navê hejmara 11 de li kar e:

⁴² Di fransî û gelek zimanên din yê jî latînî peyda bûyî (zimanên romî) de dengê Z di navê hin hejmarên 11 – 19 de peyda dibe, bo nimûne fransî: "11 onze, 12 douze, 13 treize" lê Z-ya van zimanan ne hevrehê Z-ya di hejmarên zimanên îranî de ye. Z-ya zimanên romî kurttirina peyva latînî "decim" (10) e. Anku di zimanên romî de Z li cihê navê hejmara 10 tê bikaranîn lê di zimanên îranî de Z hevdem li gel paşgira "-de(h)" tê xebitandin. Herwiha di almanî de jî di navê hejmarên 13 – 19 de paşgira "-zehn" heye lê ev Z jî ne hevrehê Z-ya di dehgirên kurdî de ye lê veguherîna ji peyva "zehn" (10, deh) e.

- yewen-des

Lê di navê hejmarên 12 – 19 de D di nemaye:

- duwês, hîrês, çarês, pancês, şîyês, hewtês, heştês, newês

Tarîxiyên "-des" di zazakî de bûye "*-yes" û taliyê jî bûye "-ês".

Dengê D ne tenê ji zimanên îranî beşa duyem ya navên hejmarên 11 – 19 ketiye. Bo nimûne, di zimanên romî de jî D-ya di peyva "-decim" ya latînî de nemaye: Bo nimûne:

- latînî "duodecim" û îtalî "dodici" lê spanî "doce", fransî "douze", portugalî "doze".

Sivikbûna denga di 11 – 19 de

Wek ku li jor diyar bûye, navê hejmarên 11 – 19 di bingeh de ji navê hejmarên 1 – 9 û paşgira "-de(h)" pêk hatine lê çendîn guherîn tê de peyda bûne. Yek ji van guherînan jî sivikbûna denga e, bi taybetî sivikbûna komên konsonantî lê herwiha diftongên "-ew-" û "-ey-" jî. Lê herwiha hin dengên tek jî ketine.

Di piraniya devokan de paşgira "-deh" bûye "-de":

- çar + deh → çarde

Dengê T di navê hejmarên 17 û 18 de ji komdengên -FTD- û -ŞTD- ketiye:

- heft + -de(h) → *heftdeh → hevde(h)
- heşt + -deh → *heştdeh → hejde(h) / hijde(h)

Komdengên -EY- di peyva devokî "heyşt" de di navê hejmara 18 de bûye I yan Î:

- heyşt + deh → *heyştdeh → hijde(h) / hîjde(h)

Guherîna dengê E bi I

Di navê hejmarên 17 û 18 de di hin devokan de dengê E yê navê hejmarên 7 û 8 bûye I:

- heft → hivde
- heşt → hijde

Guherîna E bi I diyardeyeke giştî ya kurmancî ye. Bo nimûne farisî "kerden" û zazakî "kerdene" lê kurmancî "kirin" û soranî "kirdin". Guherîna E bi I dikare herwiha wek awayekî kurtbûnê yan sivikbûnê were hesibandin ji ber ku dengê E hinekî ji I dirêjtir an girantir e.

Lerzdarbûna dengên bêlerz

Di navê hejmara 7 de dengê F heye ku di navê hejmara beramberî wî dengê V heye. Di navê hejmara 8 de jî dengê Ş heye lê beramberî wî di navê hejmara 18 de J li kar e.

- heft → hevde (ne *hefde)
- heşt → hejde (ne *heşde)

Sebebê van guherînan dengê D yê bilerz anku lerzdar e. Ji ku D dengê bilerz e, ew herwiha dengên berê xwe dike bilerz. Loma F bûye V û Ş jî bûye J.⁴³

Yek ji tiştên balkêş ew e ku heta di soranî û hewramî de jî di navê hejmara 17 de V heye (hevde) tevî ku di navê hejmara 7 de di hewramî û piraniya devokên soranî de ne F lê W li kar e (hewt). Tarîxiyên navê hejmara 17 di van devokan de ne ji forma "hewt" lê ji serdemekê ye ku navê hejmara 7 di wan lehceyan de jî "heft" bû.

Di navê hejmara 16 (şazde[h]) de jî dengê Ş yê bêlerz yê dawiya navê hejmara 6 bûye Z ku dengê bilerz e. Lê bi ne mimkin e mirov bi esehî biryarê bide ka Ş-ya dawiya "şeş"ê bûye Z yan jî di bi awayekî din li wê hejmarê zêde bûye (bidin ber "sê > sê-z-de[h]") û ew Z bûye sebebê ketina Ş-ya dawiya "şêş"ê di peyva "şazde[h]" de.

Eger ji ber lertzê bûya, adeten Ş dê bûba J (*şajde[h]) lê ev form ne di kurdî û ne jî di ti zimanên din yên îranî de peyda nabe. Di zarên kurdî de bi awayên "şazde(h), şanzde(h), şanze" (ji bilî zazakî ku tê de "şîyês" e) û di farisî de jî "şanzdeh" e (bi devkî "şanzê").

6. DEHHEJMAR

⁴³ Binêrin: Tesîra lertzê li ser guherîna dangan: <https://zimannas.wordpress.com/2016/01/08/tesira-lerze-li-ser-guherina-dangan/>

Mebesta me ji peyva "dehhejmar" (dekad, bi inglîzî *decad*) navê hejmarên 20, 30, 40, 50, 60, 70, 80 û 90 e.

Li vê derê em ê navên van dehhejmaran bi zarên kurdî û hin zimanên din yê îranî û hindûewropî pêşkêş bikin. Dûv re em ê behsa çêbûna wan û taybetmendiyên wan bikin-

6.1. Dehhejmar di kurdî û zimanên lêzim de

Li vê derê em ê navên dehhejmaran di kurdî û hin zimanên lêzim de pêşkêş bikin û paşî behsa varyantên kurdî û herwiha awayê çêbûna navên van hejmaran bikin.

Bo dirêjnebûna tabloyê, ji varyantên devokî tenê yê kurmancî hatine rêzkirin û ji her zar û zimanên din tenê forma serdest hatiye dan.

zar/ziman	20	30	40	50	60	70	80	90
kurm. standard	bîst	sî	çil	pêncî	şêst	heftê	heştê	not
kurm. formên din	bîs	sih, sîh, si	çel, çal	pênca, pênci, pêncih, pêncêh, pîncî	-	-	heyştê	nod, newed, nehwêd, newhêd, nehwêt, newhêd, nehwêrt
soranî	bîs(t)	sî	çil	penca	şest	hefta	heştta	newe(t)
kurdiya başûrî	bîs	sî	çil	penca	şes(t)	hefta	heştta	newed
farisî	bîst	sî	çihil, çil	pencah	şest	heftad	heştad	neved
zazakî	vîst	hîris	çewres	pancas	şuştî	heftay	heştay	neway
pehlewî	wîst	sîh	çihil	pençah	şest	heftad	heştad	newed
avestayî	vîseiti-	thrisete	çeth-verisete-	pença-seti-	xşû-esti-	hep-teyti	eş-teyti	neweyti
sanskritî	vimseti	trimset	çetvar-imset	pença-sat	sesti	septeti	esîtî	neveti
rûsî⁴⁴	dvad-sati	trîd-sati	sorok	pyati-dêsat	şêsti-dêsat	sêmi-dêsat	vosêmi-dêsat	dêvya-nosto
yûnanî⁴⁵	êtkosî	triá-konta	tessará-konta	penté-konta	heksé-konta	hebdomé-konta	ogdoé-konta	enené-konta

⁴⁴ Hejmarnavên rûsî: https://en.wiktionary.org/wiki/Category:Russian_numerals

⁴⁵ Hejmarnavên yûnaniya kevn: https://en.wiktionary.org/wiki/Category:Ancient_Greek_numerals

latîni ⁴⁶	vīgintī	trīgintā	quadrā-gintā	quīnquā-gintā	sexā-gintā	septuā-gintā	octō-gintā	nōnā-gintā
fransi ⁴⁷	vingt	trente	quarante	cinquante	soixante	septante	huitante	nonante
îtalî	venta	trenta	quaranta	cinquanta	sessanta	settanta	ottanta	novanta
spanî	veinte	treinte	cuarenta	cinquenta	sesenta	setenta	ochenta	noventa
inglîzî	twenty	thirty	forty	fifty	sixty	seventy	eighty	ninety
almani	zwanzig	dressig	vierzig	fünfzig	sechzig	siebzig	achtzig	neunzig

6.2. Varyantên dehhejmaran di kurdî de⁴⁸

Hemû dehhejmaran di kurdî de du yan zêdetir varyant hene. Di di nav kurmancî bi xwe de ne hemûyan lê hin dehhejmaran varyant hene. Em ê pêşî varyantan rêz bikin û paşî behsa belavbûna wan bikin. Dûv re jî em ê li zarên din yên kurdî binêrin.

Varyantên dehhejmaran di kurmancî de di tabloya li jor de hatine rêzkirin. Li vê derê em ê li ser belavbûna bikaranîna varyantan di devokên kurdî de û herwiha di zimanê nivîskî de rawestin.

20: Wek peyveke serbixwe, di kurmancî de tenê forma "bîst" wek navê vê hejmarê heye. Lê di axiftinê de, gava ku peyva li pey wê bi konsonantekê dest pê bike, hingê navê hejmara 20 wek "bîs" tê kurtkirin:

- bîst + kes > bîs(t) kes

Di nivîsînê de herdem T-ya dawiya "bîst"ê di kurmancî de tê parastin.

Di soranî de hem forma "bîst" û hem jî ya "bîs" di axiftin û herwiha di nivîsînê de jî tên dîtin. Di kurdiya başûrî û di hewramî de bi piranî tenê forma "bîs" (ne "bîst") tê gotin.

Di zazakî de navê hejmara 20 "vîst" e ku V-ya kevnar parastiye ku di zarên din yên kurdî û di farisî de paşî bûye B (li jêrtir binêrin).

⁴⁶ Hejmarnavên latîni: https://en.wiktionary.org/wiki/Appendix:Latin_cardinal_numerals

⁴⁷ Hejmarên fransî: Navê hejmarên 70 – 19 yên li vê derê tenê li hin deverên fransîaxiv li kar in. Li piraniya deveran navên din ji van hejmaran re hene ku li gor sistemeke din hatine avakirin.

⁴⁸ Bo varyantên dehhejmaran li deverên cuda, binêrin vê suhbetê di koma "Zimanê Kurdî" de li ser Facebookê: https://www.facebook.com/groups/zimaneKurdi/1143502899040384/?notif_t=like¬if_id=1472367453916566

30: Navê hejmara 30 di piraniya devokên kurmanciya rojhilatî de "sih" e, di piraniya devokên kurmanciya navendî û rojavayî de jî "sî" ye. Herdu jî di zimanê nivîskî de tînen bikaranîn lê forma "sî" zêdetir. Herwiha forma "sîh" jî carinan di nivîsan de tê dîtin lê bi esehî nayê zanîn ka ew bi rastî jî di nav xelkê de li hin deveran heye yan jî tenê hîperkorektî ye.⁴⁹

Di soranî, kurdiya başûrî û hewramî de forma serdest û belkî tekane "sî" ye. Di farisî de jî "sî" li kar e. Zazakî forma xwe ya kevnar "hîris" bi kar tîne (bo kevnariya wê li jêrtir binêrin).

40: Navê hejmara 40 di piraniya devokên kurmancî de "çil" e û di zimanê nivîskî de jî bi piranî ev form tê xebitandin lê li hin deran forma "çel" jî jî tê bihîstin. Di hin devokên kurmanciya rojavayî de, ku E-ya kurmanciya giştî wek din jî dikin A, mirov dikare navê vê hejmarê bi awayê "çal" jî bibihîze.

Di soranî, kurdiya başûrî û hewramî de forma serdest û belkî tekane "çil" ye. Zazakî dîsa formeke cuda û kevnar ya bi awayê "çewres" dixebitîne.

50: Navê hejmara 50 di piraniya devokên kurmancî de "pêncî" ye û ev form di zimanê nivîskî de jî serdest e lê li hin deran herwiha formên wek "pênçe, pêncî, pêncih, pêncêh, pîncî" jî tînen gotin.

Heta di kurmanciya rojhilatî de jî, ku ji hejmara 30 re dibêje "sih" anku li dawîya wê "-ih" heye, dîsa jî ji hejmara 50 "pêncî" tê gotin anku li dawîya ne "-ih" lê "-î" li kar e. Bi gotineke din, devera bikaranîna forma "pêncih" ne wek ya forma "sih" berfireh e.

Di soranî, kurdiya başûrî û hewramî de forma serdest û belkî tekane "penca" ye. Di zazakî "pancas" e.

60: Di tevahiya kurmancî de navê hejmara 60 "şêst" e. Di soranî de ew bi awayê "şest" e (bi S-ya qelew wek "sed", berevajî kurmancî ku bi S-ya zirav wek "ser" e) lê herwiha forma bêyî T anku "şes" (dîsa bi S-ya qelew) jî berbelav e. Di kurdiya başûrî û hewramî de bi piranî "şes" e: bi S-ya qelew û bêyî dengê T.

Di zazakî de li gor deveran dikare "şestî" yan jî "şestay" be. Bi ihtimaleke mezin "şestî" forma kevntir e û forma "şestay" li ber modela "heftay, heştay" paşgira "-ay" wergirtiye.

⁴⁹ Bo hîperkorektiyê binêrin: <https://zimannas.wordpress.com/2015/07/06/hiperkorekti-anku-zede-rasti/>

70: Di kurmancî de tek forma navê hejmara 70 "heftê" ye⁵⁰ (bi H-ya wek di navê "Hesen" de) lê belkî di hin devokên nêzîkî soranî de mirov dikare wê bi away "hewtê" bibihîze. Di soranî de forma serdest "hefta" ye lê formên "hewta" û pir hindik "hewe" jî peyda dibin. Di kurdiya başûrî û hewramî de jî "hefta" ye, bi zazakî jî "hewtay".

80: Di kurmancî de forma serdets û standard ya navê hejmara 80 "heştê" ye. Ew herwiha tek forma kurmanciya rojhilatî ye. Di kurmanciya navendî de li hin cihan forma "heyştê" peyda dibe li wan deveran ku navê hejmara 8 "heyşt" e. Di kurmanciya rojhilatî de H-ya peyva "heştê" wek H-ya di navê Hesen de ye lê di kurmanciya navendî de bi H-ya wek di peyva "heval" de ye.

Di soranî û hewramî de navê hejmara 80 "heştâ" ye, di kurdiya başûrî de li hin deveran "heştâ" û li hinan jî "heyştâ" ye. Di zazakî de navê wê "heştay" e.

90: Hejmara 90 di kurmancî de ji hemû dehhejmaran û belkî ji hemû hejmarên din jî zêdetir xwedî varyantên cuda ye. Forma serdest û standard "not" e lê herwiha varyanta "nod" jî bi berfirehî di nivîsînê de tê dîtin. "Not" an "nod" li hemû deverên kurmanciya navendî û rojavayî li kar in. Di kurmanciya rojhilatî de jî li Behdînan "not" tê gotin. Lê bakur-rojhilatê deverên kurmancîaxiv (Urmiye, Agirî, Wan, Hekarî, Erzirom...) yek an çend ji van forman li kar in: nehwêt/nehwêt, newhêt/newhêd, newêt/newêd. Li hin deverên Hekariyan heta formeke bi R jî heye: nehwêrt/nehwêrd. Ev R di ti zarên din yên kurdî yan zimanên din yên îranî de di navê vê hejmarê de nîne û peydabûna vî dengî di navê hejmara 90 de bi temamî tiştêkî nepayî û surprîz e.

Di soranî de forma "newet" tê bikaranîn lê li hin deran T-ya dawiyê nayê gotin anku dibe "newe". Di kurdiya başûrî de forma serdest û belkî tekane jî "newed" e. Di zazakî de peyva "neway" wek navê vê hejmarê tê gotin.

6.3. Çêbûna dehhejmarên kurdî

Di hin zimanan de navê dehhejmaran bi aşkereyî ji navê hejmarên 1 – 9 + navê hejmara 10 tên çêkirin. Bo nimûne, bi zimanê fînlandî anku fînî:

⁵⁰ Carinan ew bi forma "hevtê" were nivîsîn jî, ew tenê şaşiya nivîsînê ye ji ber ku V-ya bilerz û T-ya bêlerz nakevin pey hev.

- kaksi (2) + kymmenen (10) > 20 kaksikymmentä (peyva "kymmentä" formeke çemandî ji peyva "kymmenen" anku 10 e)
- kolme (3) + kymmenen (10) > 30 kolmekymmentä
- neljä (4) + kymmenen > 40 neljäkymmentä
- viisi (5) + kymmenen > 50 viisikymmentä

Mirov dikare dehhejmarên fînlandî wisa heta 90ê bidomîne.

Di hin zimanên din de, wisa dixuye ku ti têkiliya navê dehhejmaran (10, 20, 30...) bi tilhejmaran ve nîne. Bo nimûne, bi tirkî:

- 2 "iki" ye lê 20 "yirmi" ye
- 3 "üç" e lê 30 "otuz" e
- 4 "dört" e lê 40 "kırk" e
- 5 "beş" e lê 50 "elli" ye

Kurdî û piraniya zimanên din yên hindûewropî di vê meseleyê de ne bi temamî wek fînlandî û ne jî wek tirkî ne: ji piraniya dehhejmaran diyar e ku ew bi awayekî têkilî tilhejmaran in⁵¹ lê herdem ne zelal e ka çawa dehhejmar ji tilhejmaran hatine çêkirin.

Bo nimûne, mirov dikare bibîne ku ji bilî navên hejmarên 10 û 20, navên hemû dehhejmarên din bi eynî dengê tilhejmara beramber dest pê dikin:

Tilhejmar	Dehhejmar
sê	sî
çar	çil
pênc	pêncî
şeş	şêst
heft	heftê
heşt	heştê
neh	not

⁵¹ Di tirkî de jî gava ku mirov digihe dehhejmara 60 û dehhejmarên mezintir, mirov dibîne ku ew têkilî tilhejmarên beramberî xwe ne lê ew jî wek kurdî ne bi ti paşgireke herdem wek hev tî çêkirin: 6/60 altı/ altmış, 7/70 yedi/ yetmiş, 8/80 sekiz/seksen, 9/90 dokuz/doksan.

Wek ku tê dîtîn, dengê wan yê destpêkê eynî ye lê ti paşgireke diyar nîne ku herdem dehhejmar pê ji tilhejmarê were çêkirin. Heta carinan di tilhejmar û dehhejmara beramberî wê de hejmara deng eynî ye tevî ku deng bi xwe ne heman deng bin jî:

- sê / sî
- çar / çil
- neh / not

Mirov dikare dengê î yê di peyva "pêncî" de wek paşgirekê bihesibîne ku pê "pêncî" ji "pênc"ê hatiye saz kirin lê ew heman deng nakeve pey hejmarên din û pê ti dehhejmarên din ji tilhejmaran çênake. Lê belkî mirov wisa bikare hesab bike ku heman deng di peyva "sî" de jî hebe ku ji "*sê-î" kurt bûbe û tenê wek "sî" mabe.

Paşgira "-ê" dehhejmarên "heftê, heştê" ji tilhejmarên "heft, heşt" çêdike lê ew jî di saz kirina dehhejmarên din de beşdar nabe.

Sebebê tinebûna ti paşgireke aşkera ya avakirina dehhejmaran di kurdî de ew e ku dehhejmarên kurdî pir kevn in û bi demê re kurt bûne û ti paşgireke zelal ya giştgir (komprehensîv) ji wan re nemaye. Eger mirov li navê dehhejmarên kurmancî û hevwateriyên wan yê bi zimanên kevn yê îranî û hindûewropî binêre, mirov dê bi hêsanî bibîne ku ew di kurdî de pir hatine sivikkirin û kurt kirin.

Bo nimûne, em dehhejmarên kurmancî bidin ber yê avestayî, sanskrîtî û latînî:

- kurmancî: bîst, sî, çil, pêncî, şêst, heftê, heştê, not
- avestayî: vîseiti, thrisete, çethverisete, pençaseti, xşûesti, hepteyti, eşteyti neweyti
- sanskrîtî: vimseti, trimset, çetvarimset, pençasat, sestî, septeti, esîtî, neveti
- latînî: vîgintî, trîgintâ, quadrâgintâ, quînuâgintâ, sexâgintâ, septuâgintâ, octôgintâ, nônâgintâ

Kurtbûna dehhejmaran di kurmancî de berçav dibe heta eger mirov wê bide ber zar û zimanên nêzîk jî. Bo nimûne:

- kurmancî: bîst, sî, çil, pêncî, şêst, heftê, heştê, not
- zazakî: vîst, hîris, çewres, pancas, şeştî, hewtay, heştay, neway
- farisî: bîst, sî, çehel, pencah, şest, heftad, heştad, newed

Li vê derê em ê hewl bidin yek bi yek dehdehmarên kurdî bi hevrehên wan yên zimanên din yên hindûewropî ve girê bidin û diyar bikin ku tevî guherînên pir mezin jî di navbera wan de (bo nimûn kurmancî "bîst" û inglîzî "twenty"), ew di rastiyê de ji eynî navên makezimanê proto-hindûewropî û ji navê hejmarên 2 – 9 peyda bûne:

20: Navê hejmara 20 di kurmancî û farisî de "bîst" e. Di soranî de dikare "bîst" an jî "bîs" be, di kurdiya başûrî "bîs" e. Lê di navê vê hejmarê de dengê destpêkî di piraniya zimanên hindûewropî de ne B ye lê V yan W ye: zazakî "vîst", pehlewî "wîst", avestayî "vîseyti", sanskrîtî "vimseti", latînî "vīgintī", fransî "vingt"... Em ji dengnasiya dîrokî ya kurdî û farisî baş dibînin ku V di gelek peyvan de bûye B. Bo nimûne, kurmancî "ba, baran, berf/befr" û farisî "bad, baran, berf" lê zazakî "va, varan, vewre", avestayî "vate-, vare-, vefre-" û sanskrîtî "vate-, var, gebhre-".

Gava ku mirov li navê hejmara 20 bi rûsî "dvadsati", bi inglîzî "twenty" yan bi almanî "zwanzig" dinêre, dibîne ku dengê hê berî dengê V/W jî di navê vê hejmarê de heye. Gava ku mirov navê hejmara 20 bi van zimanan bide ber navê hejmara 2 bi heman zimanan, mirov bi hêsanî dibîne ku eynî deng di herduyan de hene:

- rûsî "dva" (2) û "dvadsati" (20)
- inglîzî "two" (2) û "twenty" (20)
- almanî "zwei" (2) û "zwanzig" (20)

Lê ev dengê destpêkê – ku di makezimanê hindûewropî de DW- bû – di piraniya zimanên hindûewropî de di navê hejmara 20 de tenê V jê maye û V jî paşî di kurdî û farisî de bûye B.⁵²

Anku têkiliya hejmara "bîst" jî bi hejmara "du" re heye tevî ku niha ew wisa ji hev dûr ketine ku êdî ti dengên wan naşibin hev. Li aliyekî din, pêşgira navneteweyî ya ji latînî "bî-, bi-" ya bi wateya "du" pir dişibe navê hejmara "bîst": "bisiklêt" (duçerxe), "biskiwît", "biyenal" (pêşangeha ku her du salan carekê tê sazkirin), "bîlateral" (peymanên dualî), "bîseksuel" (kesa/ê ku hem ji jinan û hem jî ji mêran hez dike)... Di devokên kurdî de ew dikare herwiha wek "pi-" (piskêt, pisiqlêt) yan "bay-, pay-" (baysikil, paysikil) were gotin.

⁵² [https://en.wiktionary.org/wiki/Reconstruction:Proto-Indo-European/dwi\(h%E2%82%81\)d%E1%B8%B1m%CC%A5ti](https://en.wiktionary.org/wiki/Reconstruction:Proto-Indo-European/dwi(h%E2%82%81)d%E1%B8%B1m%CC%A5ti)

30: Navê hejmara 30 di kurdî (sî, sih – ji bilî zazakî), farisî (sî) û pehlewî (sîh) de ji navê heman hejmarê bi zimanên din yê lîzîm dîr dixuye, bo nimûne zazakî "hîris", avestayî "thrisete", sanskrîtî "trimset", inglîzî "thirty" yan fransî "trente". Lê çawa ku navê hejmara 30 bi kurdî pir dişibe navê hejmara 3, wisa di van zimanên din de jî navê hejmara 30 dişibe navê hejmara 3 bi wan zimanan.

Sebebê guherînên mezin yê navbera "sî, sih" ya kurmancî li gel "thrisete" ya avestayî yan "thirty" ya inglîzî ew e ku TH di nav zimanan de nîşana S-ya "fis" anku S-ya navdidanî ye, wek dengê ث yê zimanê erebî ku di peyvên ji erebî hatî de di kurdî û farisî de adeten jî dibe S (carinan dibe T). Cudahiyêke din jî ew e ku R ji navê hejmara 30 di kurdî û farisî de ketiye, wek çawa ku ew di navê hejmara 3 de jî ketiye. Herwiha S-ya wek di "thriSete" ya avestayî de jî bûye H, wek çawa ku di navê hejmara 10 de jî di avestayî û zazakî de S heye (avestayî "dese-", zazakî "des") lê di kurmancî, pehlewî û farisî de bûye H (sîh, sih)⁵³ û taliyê bi temamî ketiye "sî".

Di zazakî de rêbazeke din di navê vê hejmarê de hatiye bijartin. TH nebûne S lê T ketiye û H maye: avestayî "thristete", zazakî "hîris".

40: Navê hejmara 40 li gel navê hejmara 4 di kurdî û zimanên din jî yê îranî bi heman herfa Ç dest pê dike: bi kurmancî "çar" û "çil" (li gel varyanta devokî "çel" û ya pir devokî "çal"). Tevî ku di gelek zimanên din yê hindûewropî de navê hejmara 40 ne bi Ç dest pê dike lê di piraniya wan de navê hejmara 4 û ya 40 bi heman dengî dest pê dikin: bo nimûne 4/40 bi inglîzî "four/forty", almanî "vier/vierzig", fransî "quatre/quarante"...

Gava ku mirov "çil" ya kurmancî dide ber "çethverisete-" ya avestayî yan jî "çetvarimset" ya sanskrîtî, bi zelalî tê dîtin ku di kurdî de kurtbûneke pir mezin peyda bûye. Bo ku mirov bibîne ku çawa "çil" ya kurmancî ji tişteke kevnar ya wek "çethverisete-" ya avestayî yan "çetvarimset" ya sanskrîtî peyda bûye, mirov dikare ji bi xeyalî ji avestayî dest pê bike, paşî were forma zazakî, paşî ya farisî û dawiyê jî ya kurmancî û soranî:

- avestayî "çethverisete-" > zazakî "çewres" > pehlewî "çihil" > farisî "çihil / çil" > kurdî "çil / çel".

50: Navê hejmara 50 bi kurmancî "pêncî" (li gel varyantên xwe) bi zelalî bi navê hejmara 5 "pênc" ve têkildar e. Ew herwiha pir dişibe navê hejmara 50 bi zarên din yê kurdî û zimanên din yê îranî jî: soranî û kurdiya başûrî "penca", farisî "pencah", pehlewî "pençah", zazakî "pancas", avestayî

⁵³ Bi heman awayî di farisî de "masî" bûye "mahî" û "asin/hesin" bûye "ahen". Ev diyardeya guherîna S bi H zêdetir taybetmendiyêke zimanê farisî ye û di kurdî de tenê di navê hejmaran de wisa lê hatiye.

"pençaseti", Li derveyî zimanên îranî, di sanskrîtî de "pençasat", di rûsî de "pyatidêsat" û di yûnaniya kevn de "pêntêkonta" jî dişibin navê hejmara 50 bi kurdî. Di inglîzî de "fifty" yan di almanî de "fünfzig" êdî kêm dişibin kurdî "pêncî" lê dîsa jî gava ku mirov jihevduketina navê hejmarên 5 di van zimanan de wek ku li jor behs kirî bîne bîra xwe, mirov dê zû pê bihese ku peyvên ji heman rehî ne. Bi heman awayî "cinquante" ya fransî gelek ji "pêncî" ya kurdî dûr dixuye û belkî wisa were texmînkirin ku ti têkiliya etîmolojî di navbera wan de nîne. Lê dîsa eger em li jortir li navê hejmara 5 di van herdu zimanan de binêrin û li etîmolojiya wan ya li jor behs kirî vegehin, em ê bibînin ku ew peyvên ji eynî rehî ne.

60: Navê hejmara 60 di kurmancî û zimanên din jî yê hindûewropî de bi zelalî têkilî navê hejmara 6 e. Di heman demê de, di piraniya zimanên hindûewropî de navê hejmara 60 pir nêzîkî hev maye: kurmancî "şêst", soranî û kurdiya başûrî "şes(t)", farisî û pehlewî "şest", zazakî "şestî", sanskrîtî "sesti", spanî "sesenta", inglîzî "sixty"...

70: Navê hejmara 70 jî di hemû zimanên hindûewropî de têkilî navê hejmara 7 e. Di zimanên îranî de destpêka wê wek hev e lê dawîya wê li gor zar û zimanan diguhere: kurmancî "heftê", soranî û kurdiya başûrî "hefta", zazakî "heftay", farisî û pehlewî "heftad", avestayî "hepteyti-". Di piraniya zimanên din yê hindûewropî de navê vê hejmarê ne bi H lê bi S dest pê dike: sanskrîtî "septeti", latînî "septuāgintā", fransî "septante", inglîzî "seventy"... Di makezimanê proto-hindûewropî de li destpêkê bi rastî jî S hebû ku di zimanên îranî de di vê û di gelek peyvên din de jî bûye H (bo vê meseleyê li jortir li etîmolojiya peyva "heft" binêrin).

Wek ku ji navê vê hejmarê bi avestayî, sanskrîtî, latînî û fransî diyar dibe, di navê hejmara 70 de du T hebûne ku di hin zimanên îranî de ya dûvretir bûye D (farisî û pehlewî "heftad") lê di kurdî de bi temamî ketiye (kurmancî "heftê", soranî "hefta") yan jî nerm bûye û bûye Y (zazakî "heftay"). Ketina T/D ya paşvokalî (li pey vokalekê) di kurdî de diyardeyeke berbelav e. Bo nimûne, farisî "bad, bûden, daden" lê kurdî "ba, bûn/bûyîn, dan/dayîn".

80: Navê hejmara 80 jî dîsa di kurmancî (heştê, heyştê) û piraniya zar û zimanên din yê hindûewropî de bi zelalî dişibe navê hejmara 8 (heşt, heyşt). Di zimanên îranî de navê hejmara 80 bi zelalî ji eynî rehî ye: kurmancî "heştê, heyştê", soranî û kurdiya başûrî "heştā", zazakî "heştay", farisî û pehlewî "heştad", avestayî "eşteyiti" (H li destpêka vê hejmarê tine bû, paşî di bin tesîra peyva "heft" de li peyva "heşt" zêde bûye û wisa li navê hejmara 80 jî di gelek zimanên îranî de zêde bûye).

Di sanskrîtî de jî hê bi şiklê xwe nêzîkî zimanên îranî maye "estîtî". Di zimanên din yên hindûewropî de ji navê hejmara 80 bi kurdî dûr dixuyin, bo nimûne latînî "octōgintā" yan inglîzî "eighty" (bixwînin: êytî) lê dîsa jî ji eynî rehî ne (bo zêdetir agahiyan li etîmolojiya navê hejmara 8 binêrin).

90: Navê hejmara 90 wek navê hejmara 9 jî di piraniya zimanên hindûewropî de bi N dest pê dike. Wek din jî navê wê di piraniya zimanên ewropî de kê-m-zêde dişibe hev tevî ku bi taybetî di kurmançî de, bi formên xwe yên serdest "not" û "nod" navê wê pir kurt bûye: kurmançî "not, nod, nehwet..." (li jortir binêrin), soranî "newe(t), kurdiya başûrî "newed", zazakî "neway", farisî "neved", pehlewî "newed", zazakî "neweyti", sanskrîtî "neveti", spanî "noventa", latînî "nōnāgintā", fransî "nonante", inglîzî "ninety"...

6.4. Dehhejmar li gel tilhejmaran

Di kurdî de gava ku dehhejmarên 20 – 90 li gel tilhejmaran (1 – 9) tên bikaranîn, pêşî dehhejmar tê, paşî peyvika "û" dikeve navberê û li dawiyê jî tilhejmar heye:

- 21: bîst û yek
- 46: çil û şeş
- 72: heftê û du

Ev peyvrêziya hejmarên hemû zarên kurdî û herwiha ya farisî ye jî. Anku di wan hemûyan de pêşî dehhejmar, paşî peyvika "û" (yan varyanteke wê li gor lehceyan) û li dawiyê tilhejmar cih digire.

Di gelek zimanên din de jî peyvrêziya dehhejmar û tilhejmaran bi hev re wiha ye anku dehhejmar pêşî û tilhejmar jî paşî tên lê di gelek zimanan de hevwatera peyvika "û" nayê navbera wan. Bo nimûne:

- inglîzî: 21 twenty-one (ne "*twenty-and-one")
- tirkî: 21 yirmi bir (ne "*yirmi ve bir")

Di hin zimanên de hevwatera peyvika "û" tê bikaranîn lê îcar peyvrêzî berevajî ya kurdî ye anku tilhejmar berî dehhejmaran tên. Bo nimûne:

- erebî: 21 waḥid we 'iṣrūn (peyv bi peyv: "yek û bîst")
- almanî: 21 einundzwanzig (< ein und zwanzig – peyv bi peyv: yek û bîst)

Di zimanên kevn yê îranî de (bo nimûne di avestayî de) jî peyvrêzî wek erebî û almanî bû:

- avestayî: 21 eêwe çe viseyti (peyv bi peyv: "yek û bîst")

Di hin zimanan de hem peyvrêzî berevajî ya kurdî ye û hem jî hevbera peyvika "û" nayê bikaranîn.

Bo nimûne:

- hindî: 21 ikk-îs (peyv bi peyv: yek-bîst)

Ev heman peyvrêzî û tinebûna Û di navbera tilhejmar û dehhejmaran de ji xwe di navê hejmarên dehgir 11 – 19 yê kurdî de heye (li jortir li beşa li ser dehhejmaran binêrin).

7. SEDHEJMAR

7.1. Hejmara 100

Navê hejmara 100 di kurmancî, soranî, kurdiya başûrî û hewramî de **sed** e lê carinan D-ya li dawiya wê dikare wek T were bihîstin. Di zazakî de *se* ye anku bêyî D-ya dawiyê ye. Di hemû lehceyên kurdî de ew bi S-ya qelew (ص) tê gotin.

Hevrehên peyva "sed" di hemû zimanên îranî û di zimanên hindûewropî yê Hindistanê de dişibin "sed"ê: farisî û pehlewî "sed", avestayî "sete-", sanskrîtî "sete-", hindî û urdûyî "sew". Di zimanên balto-slavî de jî ew hê dişibe "sed" a kurdî: rûsî û piraniya zimanên din yê slavî "sto", latviyayî "simts", lîtwanî "šimtas".

Di zimanên romî yê niha de jî adeten wek kurdî bi dengê S dest pê dike: fransî "cent" (bixwînin [sant, san]), spanî "ciento, cien" (bixwînin: siyênto, siyên), portugâlî "cem" (bixwînin: sêm) lê îtalî "cento" (bixwînin: çênto).

Ev peyvên zimanên romî ji latînî "centum" peyda bûne ku wek "kêntûm" dihat gotin. Bi eslê xwe di makezimanê hindûewropî de di navê vê hejmarê de ne S lê K dengê destpêkê bû ku di zimanên îranî-hindî de di vê peyvê û gelek peyvên din de jî adeten bûye S.

Maka peyva "sed" û hevrehên wê di zimanên din jî yê hindûewropî de 100 bi proto-hindûewropî **ḱm̥tóm* yan **dḱm̥tóm* bû ku ji peyva **dék̥m̥* (deh, 10) hatiye çêkirin. Piştî gelek guherînên mezin, peyvên wisa pir ji hev cuda lê hevwate yê wek "sed" ya kurdî û "hundred" ya inglîzî jî jê peyda bûne (K-ya proto-hindûewropî di zimanên îranî de dibe S û di zimanên germenî de, ku inglîzî jî jê ye, dibe H).⁵⁴

Hêjayî gotinê ye ku navê hejmara 100 hê ji mêj ve ji zimanên hindûîranî (bo nimûne ji sanskrîtî yan avestayî) derbazî zimanên uralî bûye:

- estonî: sada
- fînlandî: sata
- mecarî/hungarî: száz (bixwînin: saz)

7.2. Sedhejmarên din

Navên sedhejmarên mezintir anku 200 – 900 ji navê tilhejmarên beramber û peyva "sed" tên çêkirin:

- dused, sêsed, çarsed, pêncsed, şeşsed, heftsed, heştсед, nehсед

Hêjayî gotinê ye ku peyvika "û" – ku wek din dikeve navbera gelek hejmaran – di çêkirina sedhejmaran de nayê bikaranîn:

- 300: sêsed (ne "sê û sed" – "sê û sed" dibe du hejmarên ji hev serbixwe anku "3 û 100").

Di gotina bi devkî de komên 3-konsonantî tên sivikkirin û konsonanta navîn tê avêtin:

- pêncsed > pênsed
- heftsed > hefsed
- heştсед > heşsed

Herwiha Ş-ya berî S di navê hejmara 600 de jî adeten nayê gotin yan jî dibe S:

- şeşsed > şesed, şessed

⁵⁴ <https://en.wiktionary.org/wiki/Reconstruction:Proto-Indo-European/%E1%B8%B1m%CC%A5%C3%B3m>

Di hin devokan de (bi taybetî di kurmançiya navendî de lê ne di kurmançiya rojhilatî de) peyva "sed" wek paşgira sedhejmaran dikare bibe "-sid":

- dusid, sêsid, çarsid...

Ji bilî E-ya peyva "sed", herwiha E-ya hejmarên "heft" û "heşt" jî dikare di gotina sedhejmaran de bibe I:

- hifsed, hifsid
- hişsed, hişsid

Di kurdî de sedhejmarên 200 – 900 li gor qeyd û bendên giştî yên "tilhejmar + -sed / -sid" tên çêkirin û formên kevna yên hindûewropî nemane.

Di gelek zimanên din jî yên hindûewropî de rewş niha wisa ye lê di hin zimanan de hê jî navekî taybet bo hejmara 200 heye, bo nimûne farisî "divîst" û rûsî "dvêst" lê kurdî "dused", fransî "deux cents" û inglîzî "two hundred". Anku di kurdî, farisî û inglîzî de navê hejmara 200 yekser ji navê hejmarên 2 û 100 tê çêkirin (di fransî de S-ya pirhejmarîyê jî li peyva "cent" anku "sed" hatiye zêdekirin) lê di rûsî û farisî de navekî taybet bo hejmara 200 heye ku ne yekser ji navê hejmarên 2 û 100 hatiye çêkirin.

Di farisî û rûsî de heta navekî kevna yê bo hejmara 300 jî heye: rûsî "trîsta", farisî "tîrist"⁵⁵ lê ev peyv êdî di farisî de nayê bikaranîn û wê cih daye "sîsed" ya dîsa li gor qalibê "tilhejmar + sed".

Tevî navên taybet bo hejmarên 200 – 300 (di rûsî de herwiha 400) jî, dîsa farisî û rûsî jî bo çêkirina navên sedhejmarên mezintir dîsa formûla "tilhejmar + 100" bi kar tînin.

7.3. Sedhejmar li gel dehhejmar û/yan tilhejmaran

Gava ku hejmara "sed" yan jî sedhejmareke din (dused, sêsed, çarsed...) li gel dehhejmar û tilhejmaran yan jî yekê ji van herduyan tê bikaranîn, di kurdî de pêşî sedhejmar, paşî dehhejmar û li dawiyê jî tilhejmar tê. Di kurdî de "û" dikeve navbera her yekê ji van desteyên hejmaran:

- 101: sed û yek
- 110: sed û deh

⁵⁵ <http://parsî.wîkî/dehkhodaworddetail-838b0008bf3546b6af2ec8e3d3c0cefd-fa.html>

- 120: sed û bîst
- 222: dused û bîst û du

Eger hejmarên dehgir li gel sedhejmaran werin bikaranîn, hingê "û" dikeve navbera sedhejmar û dehgiran lê di dehgiran bi xwe de "û" nayê bikaranîn:

- 214: dused û çarde(h) (ne "*çarsed û çar û deh")

Lê devokên ku hejmarên 11 – 19 bi awayê "deh + tilhejmar" bin av dikin, hingê jî "û" bi kar tînin:

- 111: sed û deh û yek [sed û dewyek]
- 214: dused û deh û çar [çarsed û dewçar]

Di hin zimanan de hevbera "û" di van rewşan de qet nayê bikaranîn. Bo nimûne:

- tirkî: 212: iki yüz yirmi dört (peyv bi peyv: "du sed bîst çar")

Di hin zimanan de hevbera "û" di navbera hin desteyan de tê bikaranîn lê ne di navbera hemûyan de. Bo nimûne:

- inglîzî: 214 two hundred and twenty-four (peyv bi peyv: "du sed û bîst-çar)

Di hin zimanan de peyvrêza desteyên hejmaran ji ya kurdî hinekî cuda ye. Bo nimûne, di erebî de jî wek di kurdî de sedhejmar berî dehhejmar û tilhejmaran tê lê – berevajî kurdî – di erebî de tilhejmar berî dehhejmarê tê:

- kurdî: 125 sed û bîst û pênc (sedhejmar û dehhejmar û tilhejmar)
- erebî: 125 mîe we xemse we 'işrûn (peyv bi peyv: "sed û pênc û bîst" anku "sedhejmar û tilhejmar û dehhejmar")

8. HEZARHEJMAR

8.1. Hezar

Navê hejmara 1000 di piraniya kurmancî û lehceyên din yê kurdî de "hezar" e. Di kurmanciya rojhilatî de ew bi awayê "hizar" tê gotin. Di zazakî de li gel forma serdest "hezar", herwiha varyantên "henzar, hazar" jî peyda dibin.

Di kurmanciya rojhilatî û herwiha di soranî û kurdiya başûrî û farisî de ew bi H-ya wek di peyva "heval" de tê gotin (ه) lê di kurmanciya navendî de ew bi piranî bi H-ya wek di peyva "heft" yan navê "Hesen" (ح) de tê bilêvkirin.

Peyva "hezar" di zimanên din jî yê îranî de bi zelalî hevrehê "hezar" ya kurdî ye: farisî û pehlewî "hezar", avestayî "hezengre-". Lê hevrehên peyva "hezar" herwiha di zimanên hindûewropî yê Hindistanê de jî hene: sanskrîtî "sehesre", hindî û urdûyî "sehesr".⁵⁶

Li derveyî zimanên hindî-îranî, di zimanên din de peydakirina hevrehên peyva "hezar" be hêsan e û biguman e. "Sehesre" ya sansrîtî û "hezengre" ya avestayî (û wisa be "hezar" ya kurdî û farisî jî) bi "mille" (hezar) ya latînî û "xîlîoi" (hezar) ya yûnaniya kevn ve girê didin û hemûyan vedigerînin peyveke proto-hindûewropî ya wek *smih₂ǵ^héslih₂ ya bi maneya "destê tijî" anku "deh tilî" (deh caran sed)⁵⁷ lê hin kes jî ji rastiya vê biguman in û dibêjin ku ihtimalen berî ku zimanên proto-hindûewropî ji hev veqetin, ti navek ji hejmara 1000 re di wan de peyda nebûbû yan jî çend navên deverkî hebûn loma di piraniya zimanên hindûewropî de navê hejmara 1000 ne ji peyveke proto-hindûewropî ya hevpar e.

Peyva îranî "hezar" bi rêya farisî ketiye piraniya zimanên Başûrê Asyayê û di hindî, urdûyî, bengalî û gelek zimanên din de cihê "sehesr" ya wan zimanan jî girtiye. Heman peyv bi rêya zimanekî îranî, ihtimalen pehlewî yan partî, ketiye ermeniya kevn û niha di ermeniya nû de jî li kar e.

8.2. Hezarhejmarên din

Navê hezarhejmarên ji 1000ê li gor qalibê "hejmar + hezar" tên çêkirin:

- du hezar
- sê hezar
- heft hezar

⁵⁶ Binêrin bo nimûne: <https://en.wiktionary.org/wiki/सहस्र>

⁵⁷ Bo nimûne: <https://en.wiktionary.org/wiki/mille#Latin>

- neh hezar
- bîst hezar
- sed hezar
- sêsed hezar

Di hezarhejmaran de komên konsontî carinan tên sivikkirin:

- "heft hezar / hizar > hef hezar / hizar"
- "bîst hezar / hizar > bîs hezar / hizar"

Lê bo nimûne hejmara "pênc" bi "hezar"ê re nayê sivikkirin:

- "pênc hezar" nabe "*pên hezar" (bidin ber "pêncsed > pênsed")

9. HEJMARÊN DIN

Navên hejmarên 1 – 1000 di kurdî, zimanên din yê îranî û piraniya zimanên din yê ewropî de jî peyvên xwemalî ne û bi hezaran salan e ku di wan zimanan de li gor şert û mercên her zimanî cihê xwe girtiye. Berevajî wan, navê hejmarên mezintir û herwiha navê hejmara 0 jî di kurdî û piraniya zimanên din yê dinyayê de bi rêjeyî û nisbî nû ne (ne gelek kevntir ji 1000 salan) û di piraniya zimanan de herwiha peyvên bi eslê xwe biyanî û wergirtî yan "deynkirî" ne. Sebebê vê ew e ku ne zêde demeke dûr û dirêj e ku li aliyekî behsa hejmarên mezin (bo nimûne "milyon, milyar") tê kirin û li aliyê din jî bikaranîna sîstema sifirê (0) di çêkirina hejmarên deharî de ne gelek kevn e.

Di vê beşa vekolîna xwe de em ê mijarê li ser sê beşan parve bikin:

- navê hejmara 0 û dîroka wê û dîroka wê
- navê hejmarên mezin: milyon, milyar...
- navê hejmarên nadir: bêwer, lek, korûr...

9.1. Navê(n) hejmara 0

Bi kêmi nêzîkî 4000 heta 5000 salan e ku di zimanên hindûewropî de nav bo hejmarên 1 – 100 û belkî herwiha hejmara 1000 jî hebûne. Lê ne demeke pir dirêj e ku mirovan fehm kiriye ku sîstema 0 bi kar bînin û bi wê hejmaran dehcarî, sedcarî, hezarcarî û hwd. bikin:

- yek/1 û 0 = deh/10
- 10/deh û 0 = sed/100
- 100/sed û 0 = hezar...

Yekem car ev awayê bikêrhatî li Hindistanê hatiye fehmkirin û bikaranîn. Di heman demê de yekem car 0 wek hejmar hatiye hesabandin. Di zimanê zanistî yê wê demê yê Hindistanê de anku di sanskrîtî de navê "sûnye" li vê hejmarê hatiye kirin ku maneya wê ya bingehîn "vala, xalî, bêpar, tine" bû.⁵⁸

Paşî misilmanan li Serdema Navîn anku piştî destpêka îslamê ev sîstem ji Hindistanê anî Rojhilata Navîn û navê wek *şifr* صفر li erebî wergerand ku maneya wê jî ya eslî wek ya "sûnye" ya sanskrîtî "vala, xalî, bêpar, tine" ye.

Peyva "sifr, sifir" ne tenê di erebî de heta niha jî li kar e lê ew herwiha bûye navê hejmara 0 bi piraniya zimanên din jî yê misilmanan (bo nimûne kurdî, farisî, tirkî, azerî, swahîlî...)

Lê peyva "sifr, sifir" tenê bi zimanên misilmanan ve sinordar nemaye. Ew bi rêya latîniya Serdema Navîn wek "zephirum" derbazî piraniya zimanên serekî yê ewropî jî bûye: spanî "cero" (bixwînin "sêro"), inglîzî, îtalî û almanî "zero", fransî "zéro".⁵⁹ Bi rêya zimanên ewropî peyva "zero" ya ji peyva "sifr" di sedsala bîstem de gihiştîye heta Japonyayê jî. Wê heta xwe gihandîye zimanê hindî jî anku wê deverê ya ku fikra sîstema vê hejmarê jê derketîye û peyva "sifr" jî li ber peyveke wê deverê hatiye çêkirin.

Peyva "sifir" vê dawiyê ji zimanên ewropî dîsa li Rojhilata Navîn jî vegeriye: Peyva "şifre" (hejmar, kod, reqem, parola) niha di kurdî de jî tê bikaranîn. Ew bi rêya tirkî "şifre" ji fransî "chiffre" hatiye lê fransî bi xwe ew ji îtalî "cifra" û îtalî ew dîsa ji erebî *şifr* صفر wergirtiye.

Di kurdî de peyva serdest û standard ya bi maneya 0 "sifir" yan "sifr" e (herdu jî bi S-ya qelew, ص).

⁵⁸ <https://en.wiktionary.org/wiki/%E0%A4%B6%E0%A5%82%E0%A4%A8%E0%A5%8D%E0%A4%AF#Sanskrit>

⁵⁹ http://etymonline.com/index.php?term=zero&allowed_in_frame=0

Hêjayî gotinê ye ku navê hejmara 0 bi nivîsînê pir dişibe navê du tiştên din: madenê "sifir, sifr" anku "mis, paxir, baxir" (bi inglîzî "copper", bi tirkî "bakır") û "sifre" anku "mase, mêze, xwarina danayî" lê S-ya navê hejmara 0 qelew e (ص) wek di peyva "sed" yan "se, seg" de û S-ya van peyvên din di kurmançî de zirav e (س) wek di peyva "ser" yan "sê".

Ji ber eslê erebî yê vê peyvê, hin kurdan hewl daye ku navekî din li vê hejmarê bikin. Çend ji peyvên pêşkêşkirî "nîn, tine, çine, çune, ti, çu, hîç" ne lê ti ji van ne hejmar in. Ti ji wan nehatine qebûlîkirin û piraniya reha û mitleq ya kurdan – wek piraniya dinyayê – li ser peyva "sifir, sifr" ya bi eslê xwe erebî berdewam in û dê berdewam bin.

Li aliyekî din, vê dawiyê navê hejmarên mezin wek "milyon, milyar, trilyon..." ji zimanên ewropî hatine nav zimanên Rojhilata Navîn û Hindistanê jî. Bi gotineke din, van hemû medeniyetan hem rola wergirtinê û hem jî ya diyarîkirinê di navên hejmaran de hebûye.

9.2. Navên hejmarên mezin

Navên di kurdî de berbelav yê hejmarên ji "hezar"ê mezintir hemû yan bi piranî di sedsala bîstem de (hinek belkî ne berî sedsala bîst û yekem) ji zimanên ewropî (adeten bi rêya tirkî, erebî yan farisî) ketiye kurdî.

Di piraniya – eger ne hemû – zimanan de navên hejmarên ji hezarê mezintir nû ne û navneteweyî ye û vê dawiyê zimanan ew ji hev (bi piranî ji du-sê zimanên ewropî) wergirtine.

Navê hejmara 1 000 000 bi kurdî adeten wek "milyon" tê nivîsîn lê dikare herwiha bi forma "mîlyon" jî di nivîsan de were dîtin. Kêm caran ew li ber tesîra zimanê erebî dikare wek "milyûn, melyûn" jî were gotin û herwiha bi forma xwe ya pirhejmar ya erebîkirî "melayîn" (bi milyonan) jî tê bihîstin.

"Milyon" bi rêya fransî yan inglîzî ketiye kurdî û zimanên din yê Rojhilata Navîn. Eslê peyvê bi xwe îtalî "millione" (bi îtaliya niha "milione") ye ku forma mezinkirî (augmentatîv) ji peyva "mille" (hezar) e. Anku "milyon" bi eslê xwe maneya "hezara mezin" yan jî "hezzaaar" dide.⁶⁰

Navê hejmara din ya mezin ya berbelav "milyar" e ku di kurdî de herwiha bi şilkê "mîlyar, milyard, mîlyard" jî tê dîtin û bihîstin. Ew navê hejmara 1 000 000 000 e. Navê vê hejmarê wek "milliard" di

⁶⁰ http://etymonline.com/index.php?allowed_in_frame=0&search=million

fransî de li ber modela "milyon" ya esil-îtalî bi guherandina paşgira "-ione" ya îtalî bi "-ard" ya fransî hatiye çêkirin.⁶¹

Ji bilî "milyon" û "milyar"ên berbelav, di kurdî de herwiha bo nimûne "trilyon" wek navên hejmara 10^{12} anku 1 000 000 000 000 hatiye qeydkirin:

- "Yedega gaza Şahdenîz bi 1.2 trîlyon metre sêga tê texmînkirin."⁶²

"Trilyon" wek "trillion" di fransî de ji "tri-" (sê) ya latînî yan yûnanî û paşgira di peyva "mi-lyon"ê hatiye çêkirin û ji fransî belavî zimanên din jî bûye.

Peyva "bilyon" carinan bi wateya "milyar" û carinan jî bi maneya "trilyon" hatiye xebitandin:

- "Îranê tenê 3 bilyon dolar ji pereyên xwe vegerandiye."⁶³

Peyva "bilyon" ji latînî "bis" (dubare, ducarî – wek di "bi-siklêt" anku "du-çerxe" de) û paşgira "-lyon" ya ji peyva "milyon" hatiye çêkirin.

Di hin nûçeyên aborî de herwiha mirov pêrgî hejmara bi navê "katrilyon" yan "katrîlyon" jî tê ku bi maneya hejmara 10^{15} anku 1 000 000 000 000 000 tê bikaranîn. Ew bi rêya tirkî ji fransî "quadrillion, quatrillion" hatiye ku ji latînî "quattuor" (çar) û beşa dawiya ya peyva "m-ilyon" hatiye çêkirin.

Navê hejmarên mezintir kêr bi kurdî hatine bikaranîn an jî heta niha qet nehatine xebitandin lê eger pêwîst be, dikarin bi hêsanî navên navneteweyî bî wergirtin.⁶⁴

Bikaranîna hejmarên mezin yê ji zimanên ewropî wergirtî li gel hejmarên biçûktir yê xwemalî li gor heman sîstema hejmarsaziya kurdî ye:

- Ew dikarin bi tilhejmarên kurdî bî mezintirkin: *milyonek, du milyon, deh milyar, sed û çil û şeş trilyon...*
- Gava ku hejmarên biçûktir li pey wan tî, bi alîkariya peyvika "û" lê zêde dibin: *milyon û sed hezar, çar milyar û pêncsed milyon û dused hezar...*

⁶¹ http://etymonline.com/index.php?term=milliard&allowed_in_frame=0

⁶² <http://rudaw.net/kurmanci/business/16012014>

⁶³ <http://orient-news.net/ku/newsshow/109616/0/K%C3%AAr%C3%AE-%C3%8Eran-ten%C3%AA-%C3%AA-bilyon-dolar-ji-perey%C3%AAAn-xwe-vegerandiye>

⁶⁴ Mirov dikare lîsteyeke navên hejmarên mezin li vê derê bibîne: https://en.wikipedia.org/wiki/Names_of_large_numbers

9.3. Hejmarnavên nadir

Berî ku navên hejmarên mezin yê bi eslê xwe ji hin zimanên ewropî (milyon, milyar, trilyon...) peyda û belav bibin, navên hin hejmarên mezin ji Hindistanê belav bûbûn û gihiştibûn Rojhilata Navîn jî. Navê çend hejmarên hindistanî di hin berhemên kurdî de jî tên dîtin:

Bo nimûne, Ismaîl Fettah di kitêba xwe ya rêzimana kurdiya başûrî bi fransî⁶⁵ de dibêje ku mirov li cihê navê "sed hezar" herwiha peyva "luk / lok" jî dibîne lê ew peyv "li ba piraniyê winda bûye".

Di ferhenga kurdî-kurdî ya Celadet Bedirxan de peyva "kirûr" bi maneya "jimara 500 000, nîv milyon" hatiye dan.⁶⁶

Ev herdu hejmarnav jî bi eslê xwe ji Hindistanê ne. "Lok/luk" di rastiyê de "lak" yan "lakh" e û – wek ku Fettah jî gotiye – maneya "sed hezar" dide.⁶⁷ Lê berevajî ku Fettah dibêje, ew ne ji devê yan bîra piraniya kurdan winda bûye lê bi ihtimaleke pir mezin ti caran ji aliyê piraniya kurdan ve nehatiye bikaranîn jî. Fettah idia dike ku mirov peyva "lok" dibihîze lê nabêje ka li kû derê ew di kurdî de tê bihîstin.

Herçi "kirûr" e, ew jî ji Hindistanê ye û bi hindî û urdûyî bi awayê "keror" e. Ew wek navê hejmareke sîstema hejmartinê ya hindistanî bi şiklê "crore" ketiye inglîzî û hin zimanên din jî yê ewropî.

Lê berevajî ku di ferhenga Celadet Bedirxan de tê gotin, "kiror" ne "nîv milyon" (500 000) lê "deh milyon" e (10 000 000).⁶⁸ C. Bedirxan ti agahiyên li ser bikaranîna wê nade. Di rastiyê de wek din jî ti delîlên bikaranîna wê di kurdî de nînin.

Ji bilî hejmarên hindî, herwiha navekî taybet di zimanên îranî bi xwe de jî ji hejmara 10 000 anku "deh hezar" re he(bû)ye:⁶⁹

- farisî: bîver
- pehlewî: bîwer
- avestayî: beêweri...

⁶⁵ Ismaîl Kamandar Fattah: Les Dialectes Kurdes Méridionaux, 2001, rûpel 301. Bo peyda kirinê bo nimûne: <https://www.amazon.com/Dialectes-Kurdes-Meridionaux-Linguistique-Dialectologique/dp/9042909188>

⁶⁶ Celadet Bedirxan: Ferheng. Avesta 2009, rûpel 184.

⁶⁷ https://en.wikipedia.org/wiki/Indian_numbering_system

⁶⁸ Heman çavkanî.

⁶⁹ <https://en.wiktionary.org/wiki/Reconstruction:Proto-Iranian/baiwar->

Lê ji vê hejmarê jî ti şûn û şop di kurdî de naxuye: yan nemaye yan jî ti caran tine bûye jî.

9.4. Wergirtina hejmaran di peyvên din de

Ji bilî navê hejmarên mezin, hin hejmarên din jî (bi taybetî latînî û yûnanî) wek beşek ji hin peyvan yan jî bi xwerûyî hatine wergirtin lê ne wek hejmar lê bi maneyeke din tên bikaranîn:

- "Kîlo" wek peyveke serbixwe yan jî wek pêşgir bi maneya "hezar tişt" (kîlogram anku "hezar gram" yan "kîlometre" anku "hezar metre") bi eslê xwe ji yûnaniya kevn "xîlioi" anku "hezar" tê.
- "Santî-" wek di "santîmetre" de yan jî wek peyveke serbixwe "santîm, santîn" ji fransî "cent" anku "sed" hatiye.
- Pêşgira "unî-" di peyvên wek "unîform, unîter, unîversîte" û hwd. ji latînî "un-" anku "yek" tê.
- Pêşgira "bî-, bi-" wek di peyvên "bisiklêt, biskiwêt" de ji latînî "bis" anku "du, ducarî, dubare" tê.

Navê gelek hejmarên din jî latînî û yûnanî wisa di hin peyvên din de hatine nav zimanê kurdî û belav bûne nav piraniya zimanên nivîskî yên dinyayê.

Dê bidome.

Nasandina

Fehengeke soranî-kurmancî-tirkî



Fehenga soranî-kurmancî-tirkî ya **Abdullah Ekici** fehengeke yekalî ye ku peyvên soranî rêz kirine û ew pêşî li kurmancî û paşî jî li tirkî wergerandine.

Ev berhem bi hecma fehengên destan an fehengên berîkan e û ji nêzîkî 340 rûpelan pêk hatiye. Di fehengê de serpeyvên soranî li for

alfabeya kurdî-latînî hatine rêzkirin lê li ber wan serpeyv herwiha bi alfabeya kurdî-erebî jî hatine pêşkêşkirin. Wateyên wan yên kurmancî (û yên tirkî) tenê bi alfabeya kurdî-latînî hatine dan. Herwiha nimûne û hevokên soranî jî tenê bi alfabeya latînî ne.

Hejmara serpeyvên fehengê nehatiye diyarkirin lê texmînen 4000 – 5000 serpeyvên soranî li gel wergerên wan yên kurmancî û tirkî di fehengê de cih digirin.

Ekici dide diyarkirin ku armanca wê bi vê fehengê ew e ku peyvên herî zêde tên bikaranîn bide daku têgihîştina nivîsên soranî – bi taybetî tekstên medyayî – werin fehmkirin. Ew dibêje ku wî peyvên fehenga xwe ji nûçe, nivîs û kitêbên bi soranî wergirtine lê di heman demê de li dawiya kitêba xwe herwiha hin çavkaniyên fehengê jî dide, bo nimûne *Fehengê Resen* ya soranî-kurmancî ya **Mihemed Salih Pêndroyî** û *Fehenga Soranî-Kurmancî* ya **Husein Muhammed**.⁷⁰

⁷⁰ Ev yekem fehenga soranî-kurmancî ye ku ji sala 2001 heta niha tê amadekirin û li ser Internetê peyda dibe û ji aliyê danerê wê ve hê jî tê berfirehkirin: <https://ku.wiktionary.org/wiki/P%C3%AAvek:soran%C3%AE-kurmanc%C3%AE>

Ekici ferhenga xwe ya soranî-kurmancî-tirkî bi awayekî bo bikaranînê hêsan dariştiye. Peyvên soranî tenê bi kurtî li kurmancî û tirkî hatine wergerandin. Lê hin caran wisa kurt ku li beramberî peyva soranî bi kurmancî jî heman peyv hatiye nivîsîn. Helbet di herdu zaran de bo heman maneyê gelek caran jî peyv heye. Lê tenê dana heman peyvê wek wateya eynî peyvê nikare ti alîkariya xwandevanan bike. Bo nimûne, kesê ku li peyva "dar" an "mişk" binêre, dê li ber wê bi kurmancî jî heman "dar, mişk" bibîne anku ti alîkarî di haletên wiha de ji bikarînera/ê ferhengê re nayê kirin (belkî ji bilî wergerên wan yên tirkî).

Ferhenga Ekici di warê rastnivîsînê de ne xirab e: kêmasiyên şaşnivîsînê yan "kêmasiyên çapê" kêman in. Ekici alfabeya kurdî-erebî jî baş bi kar aniye. Lê di ferhengeke wiha de, ku hûn destpêker û hînberan e, divê bi awayekî dengnasiya soranî bi alfabeya kurdî-latînî hê deqîqtir û bidîqettir hatiba pêşkêşkirin.

Bo nimûne, cudahiya L-ya zirav (J) û L-ya qelew (Ĵ) di soranî de gelek giring in û Ekici jî bi alfabeya kurdî-erebî wan baş ji hev cuda dike lê di alfabeya kurdî-latînî de herduyan bi heman L dinivîse.

Di kurmancî de cudahiya wan ne wisa giring e loma di alfabeya kurdî-latînî de tenê L-yek heye. Lê soranî nikare tenê bi L-yekê îdare bike. Di ferheng û berhemên din yên heyî yên soranî yên bi alfabeya latînî de hê ji mêj ve çend çare ji vê meseleyê re hatine dîtin. Bo nimûne, **Şefîq Qezaz** di ferhenga xwe ya bi navê Şarezor ya soranî-inglîzî de û Husein Muhammed jî di ferhenga xwe ya behskirî de li cihê L-ya qelew L-yeke binxetkirî – Ĵ – bi kar tînin. Çareyeke din jî bikaranîna L-ya bibertirk e – Ł – ku bo nimûne Wîkîferheng dixebitîne.⁷¹

Herwiha R-ya sist û R-ya şidandî – ku di alfabeya kurdî-erebî de bi du herfên hinekî ji hev cuda tînin – bi heman R-yê neqlî alfabeya kurdî-latînî hatine kirin. Li şûna K-ya kurdî-erebî û farisî ك Ekici di ferhenga xwe de ك ya zimanê erebî bi kar aniye.⁷²

Ekici bi xwe jî heta li ser bergê paşîn yê ferhenga xwe jî itiraf dike ku di ferhenga wî de dê kêmasî hebin. Bi rastî jî hene:

Bo nimûne, ew li aliyekî dibêje ku di ferhengê de tenê peyvên soranî yên berbelav û giştî dide lê gelek peyvên kêman tînin bikaranînê jî hene. Hin peyv ji ferhengên soranî hatine neqilkirin ku di rastiyê

⁷¹ Binêrin bo nimûne: <https://ku.wiktionary.org/wiki/di%C5%82>

⁷² Ev dikare ji bêimkaniya programên kompûterê be. Heman şaşî di hin ferhengên din de jî heye, bo nimûne fi ferhenga Michael Chyet ya kurmancî-inglîzî de ku serpeyvan ji bilî alfabeya kurdî-erebî jî dide.

de qet di soranî de ne li kar in jî. Bo nimûne, peyva kurmancî "heyv" di hin ferhengên soranî de cih digire lê li ti dera soranî ew nayê bikaranîn û nakeve nivîsên soranî jî û li cihê wê peyva "mang" li kar e ku hem wateya "heyv, hîv" (goga li esmanan) û hem jî maneya "meh, 30 roj" jî dide.

Yan bo nimûne, li bin herfa O hejmara peyvên esil-tirkî hene (ocax, ode, oxir, oyîn...) ku hema-hema qet di soranî de nayên bikaranîn.

Maneya hejmareke peyvan şaş hatiye diyarkirin. Bo nimûne, peyva "hejmûn" bi kurmancî "bandor, tesîr" û bi tirkî jî "tesir" hatiye nivîsîn lê "hejmûn" formeke xirabkirî ji peyva ewropî "hejemonî, hegemonî, hegemonya" anku "hukimranî, serdestî" ye.

Tevî kêmasiyan jî – ji xwe ti ferheng ne bêkêmasî ne – Ekici ferhengeke delal ya bo bikaranînê hêsan diyarî kitêbxaneya kurdî kiriye. Ti şik û guman jê nîne ku gelek kurdîhezên zaryar (evîndarên zar û zaravayan) dê jê kêf û kêr jê wergirin.

Ziman û Cînsî komelayetî



Nûsînî: profêsor Peter Trudgill

Wergêrran le Inglîsiyewe: Hesênê Qazî

Le wane ye yekem şitî sebarete be ew kesaney êwe bo yekem car çawtan pêyan dekewê bîrî lê bikenewe cil û bergokanyan, dengyan, yan rengî çawyan, yan bizey ser lêwanyan bê. Eger êwe wa bîr bikenewe be tewawî hellene. Le rastî da yekem şitî ke be zeynî êwe da radebirê katêk yekem car kesêk debînî ewe ye ew ser be çî cînsêkî komellayetî ye, wate jin e yan piyaw e.

Ewe ewende aşkira ye tenanet bîr lê kirdineweşî nawê. Dabeş bûnî regezî însanî be mê û nêr ewende bineretî û aşkira ye ke ême her pêşî nazanîn. Ew rastiye ke ciyawaziyeke ewende seretayîye bew manayeye seyr niye ke ew ciyawaziye le hemû zimane însaniyekanişda reng bidatewe û nîşan bidrê. Ewe mana nasiyekî dinya gireweye ke le hemû zimane kanî dinyada wekû dû zarawey cûtokey piyaw-jin, kur-kiç, kur-dwêt û htd bûnete wuşey qamûsî û wûşêndrawin.

Belam serincrakêş e, ke zimane kanî ta radeyekî berçaw ciyawazin sebarete be radey ew ciyawaziyey cînsî komellayetiye ke kewtûnete nêw henbaney wûşekaniyanewe. Bo nimûne, le zimanî Almanî da, miro debê ewe diyarî bika katêk basî dostêk deka ew nêr Freund, mê yan Freundin e. Le Inglîsîda ew ferqe danandirê. Zarawey le mer xizmayetîş ciyawazin; bo nimûne le zimanî Inglîsîda wuşey "çousin" (amoza, pûrza, xaloza) be nêr yan mê nîşane nakirê belam le zor zimanî dîke da wekû Feranseyi miro debê diyarî bika gelo basî "cousin" deka yan "cousine". Ewe dekrê le mer bas û

۵۹

hêmakirdin be karî pîşeyş her wa bê, bo nimûne hîndêk le zimanan le waneye "açtor" "hunermendî piyaw"- 'ççtress' " hunermendî jin", "manager" " berêweberî piyaw" –' manageress' " berêweberî jin " û htd le yektirî bikenewe yan nekenewe. Ew babete lew duwayiyane da buwete hoy miştumirrî zor cencalî, lêduwa le ser ewey le dinyay Inglîsî zimanda dekrê be ijnêk bigutirê jairman yan na, le ber ewey kutêkî wuşeke man, piyawê, yan le dinyay Feranseî zimanda dekrê be agirkujênereweyekî mê bigutrê pompière yan na. (ême le bendî 10-î em kitêbe da dêynewe ser em babete.)

Leweş ziyatir ewe her weha cêy serincdanêkî wurdîşe ke ew core ciyawaziye, zor car le rûy rêzimanîşewe le zimanekanî dinya da nîşan dirawe. Şêwey derkewtinî ew ciyawaziye le zimanekan da beşêweyekî berçaw le yek taq û cûte. Rêgeyekî here aşkira bo ew le yek kirdineweye bekar hênanî cênawî ciyawaz bo nêr û mê ye. Hêndêk le zimanekan, wek Mecaristanî û Fenlandî, le dezgay cênawekanyanda hîç nîşaneyekyan niye bo cwê kirdinewey nêr û mê. Le zimanî Fenlandî da, wuşey hân hawtay 'he ' yan ' şe' ye. Ê le zimanî Mecaristanî da on hem be manay 'he' û hem be manay ' şe' ye. Zimanekanî dî, wek Inglîsî cênawî ciyawazyar heye bo le yek kirdinewey cînsî komellayeti belam tenê le doxî kesî sêyemî tak da wate - he (ewî nêr) û şe (ewî mê) – û hêndêkî dîkeyan, wek Feranseî, le doxî kesî sêyemî koş da ewane le yek dekenewe: ils (ewan-î nêr) û elles (ewan- î mê). Tenanet hêndêk zimanî dî le doxî kesî duwemîşda ew dû cînse le yek dekenewe: le zimanî êspanyayî da vosotros (êwe kesî duyemî nêrî ko), vosotros (êwe bo amaje be kesî duyemî mêy ko). Hêndêk le zimanekan bo cênawî kesî yekemî koş ewane le yek dekenewe; dîsan le zimanî êspaniyayî da: nosotros (êmey koy nêr) û nosotras (êmey koy mê).

Ciyawazî cînsî însanî dekrê be rêgey bekarhênanî herfî te'rîf û awelnawî ciyawazîş nîşan bidrê wek le zimanî Feranseî da heye: une étudiante très intelligente (xwêndkarêkî zor jîrî mê), une étudiante très intelligent (xwêndkarêkî zor jîrî nêr). Tenanet ew ciyawaziye dekrê le şêwey kirdaranîş da derkewê, bo nimûne le doxî zemanî rabirdû û doxî şertî le hêndêk le zimane Slawîyekanda. Le zimanî Lehîstanî da "pirzyceçhat" wate (ewî nêr geştê) û "pirzyceçhata" wate (ewî mê geştê).

1. Le zimannasî da bawerêkî asayî heye ke debê cextî le ser bikrêtewe ewîş eweye zimanekan lewey da ke derîdebrin ciyawaz nîn, tenê ciyawazîyan eweye ke çonî derdebrin. Cêyî sernce, ew xeslete rêzimanîyaney ke her êsta amajeman pê kirdin kartêkerî eweyan heye ke her axêwewey be gutinyan cînsî ew kesaney basyan lêwe deka û her weha î xoşî diyarî bika. (helbet ewe dekrê ta radeyek le wuşey qamûsî hemû zimanekanîşda derkewê. Ristey wekû: "I am a happy woman" emin jinêkî şadim, û "I am a sick man" emin piyawêkî nexosim' dekrê haw

watayan be hemû zimanêk derbibirdrê.) Le zimanekanî dinya da wêdeçê jimareyek derfet hebin ke ew derbirrîne pêdawîste rêzimanîyaney le mer cînsî xo bikirê derkewin:

2. Le waneye qet dernekewin- wek le zimanî Inglîsî û zimanî mecarî da. Le romanêkî Inglîsî da ke gêrewere le doxî kesî yekem da qise deka, be hîç rêgeyekî zimannasîyane da nakirê bigutrê ew nêre yan mê ye, megîn ewey nêwî xoy bilê yan serepetêkî dîke bo nasînewey le ber dest xwênerewe binê.
3. Le waneye be rêgey bekarhênanî cînsî awelnaw da derkewê, wek le zimanî Feransewî da "ce suis heureuse" emin şadim, ke jinêk deylê û "ce suis heureux ke formê 'emin şadim'e eger piyawêk bîlê. Le zorêk le zimane Slawî û Romane kanda nawî berkarî kirdarekanîş wek awelnawekan derdekewin, ke eweş akamêkî seyrî lê dekewêtewe, be zimanî Purtugalî, axêwerî piyaw bo ristey 'emin memnûnim' delê obrigado, le katêkda eger jin bê delê obrigada (manay mû be mûy 'obliged'-î Inglîsî ye).
4. Le waneye be rêgey bekarhênanî cînsî kirdarekan le doxî yekem kesî tak da derkewê, wek le zimanî Lehîstanî le doxî rabirdû da: piyawêkî Lehîstanî delê pirzyçeçhatem 'emin geştiymê' û jinêk delê pirzyçeçhatam 'emin geştiymê'.
5. Zor çawrakêştir, le waneye be rêgey bekarhênanî cênawî cwêy kesî yekemî tak derkewê. Hêndêk le zimanekan, wek êspaniyayî ke le serewe da dîtman, nek her ewey şêwey ciyawazî cênawî kesî yekemî koyan heye 'ême', belkû cênawî kesî yekemî takî ciyawazîşyan heye 'emin'. zimanî Ngala y Gîney Nwê şêwey /wn / 'emin' (nêr) û /nan / 'emin' (mê) şî heye. Û le zimanî Tayî da, le yektir duwanî be rêzewe le nêw yeksanan da, piyawêk bo cênawî kesî yekemî tak 'emin' delê phom le katêkda jinêk be xoy delê dijan.

Sernc biden ke eme ta radeyek diyardeyekî çawrakêşe û yekrast rûn niye boçî ziman debê ew nîşaneyey hebê. Aşkiraye ciyawazî rêzimanî le nêwan dû cênawî he û şe da zor car dekrê tewaw girîng bê wekû rêyek bo ewey nîşan bida ew kesey basî lêwe dekrê piyawêke yan jinêke, kurêke yan kiçêke. Belam daxuda hoy derkewtin û peyda bûnî cênawe ciyawazekanî cînsî kesî yekemî tak debê çi bê? teqrîben le hemû barudoxêk da, cînsî axêwer bo gişt layekî pêwendîdar aşkiraye.

Ême renga bikrê bem rêgeyey xwarewe da hewil bideyn bo şî kirdinewey em diyardeyeye. Le sê bendî pêşûy em kitêbe da basî hêndêk lew pêwendîyaneman kird ke le komellge zimaniyekan da le nêwan ciyawazêtî komellayêtî û ciyawazêtî zimanî da heye, û be destnîşankirdinî ew şêwaney ke lew ciyawazêtiye zimaniyane da derdekewin. Dû core ciyawazêtî komellayêtî ke ta êsta ême lêyan

duwawîn birîtî bûn le twêjbendî komellayetî û ciyawazêtî girûpî êtinîkî. Le her dûk nimûnanda ême tuwanîman hawterîbî nêwan ciyawazêtî komellayetî û ciyawazêtî cugrafiyayî cext bikeynewe le mer kardaneweyan le ser ziman: wa wêdeçê, mewday komellayetî, her heman akamî zimanî hebê ke mewday cugrafiyayî heyetî. Destekanî êtnîkî û çînî komellayetî, wek deste herêmiyekan, xesletî zimanî hawbeşyan heye çunkû endamekanyan zor ziyatir pêwendîyan legell yektirîda heye ta legell xelkî dîke da.

Lem bende da, ême legell rehendêkî dîkey ciyawazêtî zimanî rûberûyne ke wênaçê bikrê her be heman şêwe şî bikirêtewe. Be pêy lêkolînewey zimanî zandrawe le zor komellan da şêwey qise kirdinî piyawan û jinan be şêwey cor be cor le yek ciyawazin. Le rastîda, ew ciyawazîyane, le hêndêk nimûnanda dekrê tewaw zor bin, be aşkirayî hestyan pê bikrê, û renge tenanet çalakaneş fêrî mindalan bikirên. Bo nimûne, le zimanî Gros Ventire da, ke zimanêkî Indiyanî Emrîkayîye le Bakûrî Rojhelatî Dewlete Yekgirtuwekanî Emrîka, dengî didanî melaşûyî le qise kirdinî piyawanda, le qise kirdinî jinanda debê be nermemelaşûyî – piyawan be 'nan' delên / dijasta / jinan delên /kcasta /, her awa, le zimanî Yukaghir da, ke zimanêkî Bakûrî Rojhelatî Asiyaye, dengî /tc / û /dic / le qisekirdinî piyawan da, le qise kirdinî jinan da wek /ts / û / dz / derdebirdrên. Ême detuwanîn ta radeyekî zor dilniya bîn ke lew nimûneyey duwayîda ew cwê kirdinewane be zanayî dekrên, çunkû ewan pêwendîyan be ciyawazî temenîşewe heye. Mindalanîş wek jinan şêwey /ts / û / dz / bekar dehênin, le katêkda xelkî besaldaçûy her dû cînseke şêwey /çc /, / cc / bekar dehênin. Ewe bew manayeye ke axêwerêkî piyaw le mawey jiyânî xoyda sê formî ciyawaz bekar dehênê, û boye rêy têdeçê ew agadar bê sebarete bew alugoraney deyka.

Eger be giştî bilêyn, ême natuwanîn ew core ciyawazîyane be pêy mewday komellayetî şî bikeynewe. Le zorbey komellekanda piyawan û jinan be azadane legell yek hels û kewit deken û de pêwendî dan, û wa wêdeçî berhelstî komellayetî zor kem hebê ke kar bikate ser pêwendî çirupirrî nêwan cînse komellayetiyekan. Her boyeş, ême natuwanîn pêşweçûnî ciyawaziyekanî cînsî komellayetî le ziman da wek ciyawazî çîneyetî, girûpî êtinîkî, yan lehcegelî cugrafiyayî bipêwîn. Başê, ke wa bê, ew core ciyawazîyane çon derdekewin?

Boçî zor car şêwey qisekirdinî piyawan û jinan le yekdî cwêye? bila ba basî çend nimûneyek bikeyn ke karyan le ser kirawe, û hewil bideyn bizanîn ew hokaraney le berew pêşçûnyan da girîng bûne çine.

Nimûney kilasîkî ciyawazê zimanê cînsî komellayetî, ke şagirdanî ziman baş lêy agadarin, le mer Hîndîy Rojawaye. Zor car ewe bas kirawe ke katêk Urûpayiyekan bo carî yekem geştine Antîlzî Xuwarû Lesser Antilles û pêwendiyar kird be Indiyaneke Karîbewe, ke xelkî resenî ewê bûn û lewê dejiyan, boyan derkewt lewê piyawan û jnan ' be zimanê ciyawaz qse deken '. Helbet ewe dozîneweyekî zor zeq bû û miro waqî pê wur dema, şitêkî ke wênedeqû le hîç şwênêkî dîkey dinya da le wêney hebê: Le hîç cêgeyekî dî nedozrawetewe ke ciyawazî zimanê cînsî komellayetî ewende gewre bê ke xelik bêne ser ew bawerey ke le rastîda zimangeli cwêy taybetî piyawan û jnan hebin.

Legell eweşda, wêdeçê ew guzarîştane (yan duwatir destêdan û razandinewey ewan) ta radeyek gewre kirabêtinewe. Guzarîştêkî hawçerx lew bareyewe (ke sebarey be çerxî Hevdeheme) delê:

Piyawan jimareyekî zor kute û zarawey taybetî be xoyan heye, ke jnan lêyan têdegen belam xoyan qet nayanlên. Le layekî dîkewe jinanîş wuşe û ristey ewtoyan heye ke piyawan qet bekaryan nahênin, yan eger bekaryan bihênin pêyan pêdekenin û galteyan pê deken. Ca boye katêk legell yektirî dedwên zor car wa wêdeçê jnan zimanêkî cwêyan hebê le î piyawan.

Be pêy ew belganey ew nûserey Sedey Hevdehem, û lew qise gêraneweyey serewe ra derdekewê, wa wêdeçê egerçî ciyawaziyekî rûn û aşkira le nêwan şêwey qisekirdinî piyawan û jnan da hebuwe, ew ciyawaziye tenê lemer jimareyekî kem bûwe. Wate, piyawan û jnan be zimanê ciyawaz qiseyan nekirduwe, belkû ewan be şêwezari ciyawazî 'eynî ziman qiseyan kirduwe- ew ciyawazîyane tenê ciyawazî wuşeyî bûn. Tenanet eger awaş bê, ême be çi şêweyek detuwanîn ew ciyawaziye taybetîyane rûn bikeynewe? Indiyaneke xoyan şîkirdinewe yekyan lew bareyewe hebû ke êsta be berbilawî qolî le ser kêşrawe. Ew guzarîştêy le serewe bas kira berdewam debê û delê:

Wehşîye xocêyiyekanî Domênîka delên hoy eme eweye katêk karîbeka hatin bo dagîrkirdinî em durgane, lew şwênane da hozî Arawak rodenîşt be tewawî cuqewaryan lê birîn, cige le jinekanyan nebê, ke le xoyan mare kirdin bo ewey zew û zû biken û wulateke awedan bêtewe. Hêndêk weyek çûn le nêwan qisekirdinî Arawekanî le derewe ra hatûn û jnanî Karîb da heye.

Bawerî wa bû, ew ciyawazîyane le akamî têkelawî ew dû deste zimaniye, wate Karîb û Arawak da peyda bûbê, ke le akamî dagîrkariyekeda le ser binemay cînsî komellayetî dabeş kirabûn. Ewe dekrê rast bê û rastîş nebê, û le waneye qetîş nezanîn rîşey ew ciyawazîyane le çîda buwe. legell eweşda, şitêk aşkiraye: tenanet eger ew şîkirdineweyê rast bê, ême nakrê ewe sebarey be rîşey

ciyawaziyekanî zimanî cînsî komellayetî le beşe- kanî dîkey cîhanda dabezênîn û be pêwaneyekî dabinêyn. Ême her weha, tenanet lew nimûneye taybetiyeşda debê ta radeyek le tîorî 'dagîrkirdin' bo saz bûnî ew ciyawazîyane be guman bîn. Yekem, ew ciyawazîyaney le nêw Indiyanekekanî Karîb da basyan kirawe ta radeyekî berçaw her ew core ciyawazîyane bûn ke le şwênekanî dîş le nêw zimanekanî dî Indiyânî Emrîkayî da hebûn. Nuxtey duwem eweye, zimannas Otto Cespersen boçûnêkî dîkey hênawete gorê ke belanî kemewe, her awa şiyawî pejrandine û renga bikrê legell nimûney dîkeş da biguncê (ke ême pêman xoşe wa bê). Cespersen delê ciyawazî cînsî, û rengdanewey le zimanda dekrê le akamî diyardey taboo (bive) da bê ke le bendî 1 da qiseman lêwe kird. Ew amaje deka ewe zandirawe katêk piyawanî Karîbî berew şer be rêgawe bûn ewan jimareyek wuşey taybetîyan bekar dehêna ke tenê endamanî nêrî pêgeyiştû boyan hebû biyanlên. Eger jinan yan kuranî bê ezmûn û mêrdmindal, ew core wuşaneyan bekarhêna ba deyangut ewe bedibextî lê dekewêtewe. Ca boye be giştî bive detuwanê karlêkeriyekî behêzî hebê le ser peyvî ciyawazî cînsî komellayetî. Eger wuşe bivekan girêbidrênewe be hêndêk şit yan çalakî ewtowe, ke jinan boyan nebê nawe resenekanyan bihênine ser ziman, diyare le ciyatiyan wuşey nwê yan kînayey nwê bekar dehêndrên, û akamî debête ciyawazî pêk hatin le nêwan cînsî komellayetî da û peyvî tazey be dûda dê. Nimûnekanî wuşey bive wekû hokarêkî şîkerewey ewe le beşekanî dîkey dinyaş da hen. Bo nimûne, bewe zandrawe le Zûlû, jinêk boy nebuwe nêwî xezûrî yan nêwî birakanî xezûrî bênête ser ziman, û eger ew biveyey şikand ba lewane bû be mirdinî tewaw bê. Leweş ziyatir, le bendî 1-î em ktêbe da dîtman ke bive tenanet ew core wuşaneş dekrêtewe ke we wuşey bive deçin. Le zimanî Zûlû da, wêdeçê ewe ewende dirêj bûbêtewe tenanet hêndêk dengî taybetî zimanîşî girtbêtewe. Bo nimûne, ba bilêyn, eger nêwe biveke dengêkî /z/ î têdabûbê, ewe be ruwalet bew manaye buwe ke ew jiney basî lêwe dekrê boy nebuwe wuşeyekî wek amanzi 'aw' bekar bihênê be bê ewey be corêk derîbirê ke denge bivekey têda nebê û le ciyatiyan bilê amandabi. Eger ew core pêvajoye gişt jinekan le nêw komellgeyekda bigirêtewe, akamî ewe dekrê wek lehcegelî cwêy cînsî komellayetî bibîndrê.

Legell eweşda, bive, natuwanê şîkirdineweyekî hemû girewe bê le mer hebûnî ciyawazî zimanî le nêw cînse komellayetiyekan da. Yekem, be rastî tewaw rûn niye gelo dekrê ew core ciyawazîyaney le serewe da bas kiran bigiştêndirên û hemû komellgeke bikirêtewe? Nuxtey duwem eweye le zor nimûney dîkeyda ke wuşî qamûsî nîn tewaw aşkiraye bive bûn le gorêda niye. Bo wêne, lew lêkolînewaney ke le salanî 1930 yekanda kirawn, ciyawaziyekî cînsî zor berçaw le zimanî Indiyânî Emrîkayî Koasati da bîndirawetewe, ewe zimanêke ser be binemaley zimananî Muskogean, ke le Louisiana qisey pêdekirê. Ew ciyawazîyane, ke wêdeçû le serubendî berêweçûnî lêkolînewe da xerîk

bûn bizir debûn, birîtî bûn le doxî dengsazî hêndêk corî taybetî kirdar. ew nimûnane y xurawe le ber çaw bigirin:

'ew xerîke delê' nêr / ka:s/ mê / Kà / . ' helî mehêne' nêr
 / lakawçi:s/ nêr / lakawçin / ' ew xerîke pakî deka' nêr
 / mols/ mê / mol / ' eto agir dekeyewe' nêr / o:sc / mê
 / o:st /

Lew lîstey serewe da ciyawaziyekan ta radeyek têkelpêkel weber çaw dekewin, belam, le rastîda ewan be pêy komellêk qa'idey pêçelpêçewe be tewawî çaweruwankirawin. (bo nimûne, eger şêweyekî mê be vawêlêkî kepoyî kotayî pê bê, şêwey nêr be vawêlêkî na- kepoyî legel /s/ êk kotayî dê, wate / lakawwà / mêye, û / lakawas / nêre be manay ' ew helî degirê'.) Hoy baş be desteweye miro lew bawere da bê ke her ew core ciyawaziye pêşûtir le zimanekanî dîkey binemaley Muskogean da hebûbê, belam lew zimanane da zimane jinane yeke nemawin û kip bûn. (ewe beşêkî bew rastiye pişt rast debêtewe ke le zimanî Koasatî da tenê jinanî pîr ew forme cwêyaneyan parastbû. Jinanî genc lehcekan û formekanî piyawanyan dekar dekird.) Ciyawazî ew core le jimareyek zimananî Emrîkayî dîke da dozrawnetewe. Cige le nimûney zimanî Gros Ventire, ke le serewe da amajey pêkira, coreyek ciyawazî cînsî komellayetî le zimane Indiyane Emrîkayiyekanî Yana û Soux -îş da dozrawetewe û her weha le zimanî Inuît (zimanî êskîmo) ke le durgekanî Bafin qisey pê dekirê.

Lew nimûnane le hîç kamyanda wênaçê wuşey bive dewrêkî ewto bigêrê. Bo nimûne, le dû şêwezari zimanî Koasatî da eger mindalan le dayku babî ewto we fêrbûban ke nasyawîyan legell her dûk şêwezarekeda hebû eger pêwîst ba qisey mindalekeyan rast dekirdewe. Bo nimûne eger kure çikole gutbay /kà /, daykî ke bo xoy şêwazî piyawaney be kar dehêna pêşî pêdegirt û deygut ' na, debê bilêy / ka:s /'. Hîç biveyekî rêpênedraw pêşî pê nedegirt ke ew formêkî awa bekar bihênê. Her awaş katêk piyawêk çîrokêkî degêrawe zor becê deytuwani şêwey mêyane bekar bihênê katêk qisey jinêkî nêw çîrokekey degêrawe -û jinanîş her awayan dekird. Nimûneyekî dîkey yarmetî deka bo selmandinî ew pinkte le zimanî Darxatî Mexulî daye. Vawêle xirekanî /û/ û /o/ le qisekirdinî piyawan bew zimane da debin be vavêlî nêwerastî /ɥ/ û /ø/ le qise kirdinî jinan da, û jinan /ɥ/ û /ø/-î piyawan wek vavêlî pêşewey /y/ û /ø/ derdebirn. Egerçî axêweranî jin /ɥ/ û /ø/ bekar nahênin, axêwerî piyaw bekaryan dehênin, hîç biveyekî rêpênedraw niye ke pêşî ewan bigrê bo be karhênanî ew dengane le nimûney dîkeda.

Ême çon dekirê ciyawazî ew çeşne şîbikeynewe? le zimanî Koasatî da, be lanî kemewe, derkewit ew şêwaney jinan bekaryan dehênin le rûy mêjûyîyewe le î piyawain kontir bin. Be gutinêkî dî wa wêdeçû şêwezarî piyawane goranî be ser hatbê belam ew gorane le şêwezarî jinane da rûy nedabû (yan taze xerîk bû destî pêdekird). Bo nimûne, zimanî Jukji, zimanêke le Sîbêriyay Rojhelat da. Le hêndêk lehcekanîda, ew şêwezarey jinan qisey pêdeken le hêndêk wuşan da konsonantî nêwan vokalanî heye, betaybetî /n/ û /t/ ke ewe lew şêweyey da ke piyawan bekarî dehênin niye; bo nimûne, piyaw delên: /nitvaqaat/, jin delên:/ nitvaqenat/. bizir bûnî Konsonantekanî nêwan vokalan goranêkî dengiye ke zor ziyatir û zor çaweruwana kirawtîre le têwe hênanî konsonantî le xowe, û zor nimûney bizir bûnî konsonant le şwênî awa da le zimanekanî gişt şwênekanî cîhan da bedî kirawe. Ew core ciyawaziyey nêwan qisekirdinî jinane û piyawane be rûnî deyselmênê ke şêwezarî jinane le lehcey piyawane kontire. Eweş le ziyatir le zimanêk da, ca boye axawtinî jinan zor xoparêztîre le qisekirdinî piyawan.

Sere petêkî dîke, dîsan, le zimanî Koasatî da heye, be taybetî le boçûn û têruwanînî xelkî Koasatî xoyan sebarete be dû şêwezarekey zimanekeyan. Axêweranî besaldaçûtîr, be taybetî piyawan, katêk pirsîyaryan lê dekira sebarete be şêwezarekan, deyan gut ewan şêwezarî jinan be baştir dezanin lew şêwezarey ke piyawan be karî dehênin. Ewe girînge, çunkû be şêweyekî çawrakêş ew zanyarîyaney le mer zor le komellge pêşkewtûtîre zimaniyekan ke le rûy têknolojiyewe pêşkewtûtîrin, le ber destman dan dekirê le wan girê bidrê (biruwane xuwarewe). Her weha eweşman pêşan deda ke şêwezare cînse komellayetiyeke nek ewey her ciyawazin: belkû be lanî kemewe le dû zimanan da şêwezare piyawaneyekan tazeyetî û goranyan têdaye û ewanî jinaneke xoparêzin, û le nimûneyek da wate nimûney zimanî Koasatî da şêwezarek be baştir û ewî diyan be xiraptir helsengêndirawe. Ciyawazî ew core debê hasantir bê bo şîkirdinewe le ciyawaziye zimaniyekan, be pakî û sadeyewe.

Ba êsta em lêdwan û qise le ser kirdine hengawêkî dîke berîne pêşewe be çawlêkirdin û lêxurdibûnewe le ciyawazî cînsî komellayetî le zimanî Inglîsî da, ke têyda be giştî ciyawaziyeke zor kemtîrin, kemtîr aşkîran û zor kemtîr ferqyan pê dekrê. Ewe raste, jimareyek wuşe û riste hene ke le şêwey bekar hênanyanda ew ciyawazîyane derdekewin. (be helkewt, zorbey ewane wêdeçê coreyek le waq wurman bin. Ewe pêman delê le waneyê be şêweyek le şêwan le mer wuşey bivawî bê: be dilniyayiyewe le rûy nerîtiyewe le komellî ême da zor ziyatir şiyawî qebûl kirdine ke piyawan le qisekanyan da cinêw biden yan wuşey bive bekar bihênin heta jinan.) legell eweşda, zorbey ciyawaziyeke le zimanî Inglîsî da ciyawazî fonêtîkî û dengsaziye, û bekarhênanî wuşey bive nakrê

ewe şîkatewe. Leweş ziyatir, ciyawaziyekan be giştî ewende kemin zorbey xelik giştyan ferqyan pê naken. Her weha girînge serncî bidrête ke em ciyawazîyane ciyawazî hejimarîn û be manay cwêbûn û ciyawazî reha nîn. Dekrê ciyawazî rêzimanîş le ara da bê, her wek le xuwarewe debînîn.

Zorbey ew belganey sebarete be ciyawaziyekanî cînsî komellayeti le zimanî Inglîsî da be destmaneweyê akamî ew lêkolênewe zimannasîy komellayetiyanen ke le Bîrîtaniya û Dewlete Yekgirtuwekanî Emrîka da kirawin ke ême pêştir hêmanan pê kirdin, belam ême le mer Austiraliya, Efrîkay Xuwarû û New Zealandîş belgeman le ber dest daye. Ew komelle zaniyarîyaney ke lew twêjînewane wedest kewtûn be şêweyekî ew perî çawrakêş nîşane û xesletî hawbeşyan heye. Le gişt ew nimûnaneyda wa çawyan lê kirawe û taqî kirawnetewe, derkewtuwe, be le ber çawgirtinî hokargelî dîke wek hokarî komellayeti, çîneyeti, girûpî êtnîkî û temen, be şêweyekî mam nawendî jinan şêweyek bekar dehênin ke zor le şêwezari standard yan rawêjî be pirêstîj nizîk debêtewe le çaw ew şêweyey ke piyawan bekarî dehênin. Egerçî ême natuwanîn pêşbînî bikeyn piyawêk yan jinêkî taybetî le boneyekî taybetî da çî şêweyek bekar dehênê. Be gutinêkî dî, axêweranî mêy Inglîsî, wek hawtakanyan le zimanî Koasatî da, ew şêwe zimanîyane bekar dehênin ke lew şêwaney piyawan bekaryan dehênin 'baştir' in.

Le bendî 2-î em kitêbe da le hêndêk lew rêyaneman koliyewe ke têyanda hokare gorênere zimaniyekan legell çîni komellayeti lêk bestirawnetewe. Her ew core hokare legoranhatûwane dekrê bekar bihêndrên her be heman şêwe bo nîşan danî ciyawazeti cînsî komellayeti.

Em reqemaney xuwarewe le berçaw bigirn. Le Detriot axêweranî ser be çîni serewe kemptir nimûnekanî na standarî fire xistine doxî nefî bekar dehênin (wek: I don't want none) le çaw axêweranî çîni nêwerast. legell eweşda, eger çaw le çîni komellayeti bikrê, jinan be şêweyekî mam nawendî ew şêwane kemptir le piyawan bekar dehênin:

Le sedî bekar hatûwî xistine fire doxî nefî le nêw twêjî serwey çîni nêwerast da:piyawan 6. 3, jinan 0. 0, le nêw twêjî xuwarewey çîni nêwerast da : piyawan 32. 4, jinan: 1. 4, le nêw twêjî serwey çîni kirêkar da piyawan : 40. 0, jinan: 35. 6, le nêw twêjî xuwarewey çîni kirêkar da piyawan 90. 1, jinan: 58. 9

Le rastî da ciyawazî nêwan twêjî nêwerastî çînî nêwerast û twêjî xuwarewey çînî kirêkar gelêk zore: zor ziyatir rêy têdeçê piyawan ziyatir le jinan bilên I don't want none, ewe derî dexta jinan zor hestyartir le piyawan le mer tebî'etî bednêw kirawî ew xeslete rêzimanîye. Leweş ziyatir, ew hestiyarêtiye, her be xeslete zimaniyekanewe ber best nabê. Bo nimûne, le şewey qisekirdinî reşekanî Detriot da, jinan le sedêkî ziyatir le piyawan /r/ î na- ber le vokal bekar dehênin (nîşaneyekî be pirêstîj her wek ewey le New York heye), leberçaw girtinî ew xeslete le nêw çînî komellayetî da bem şeweyey xuwarewe ye:

Le sedî bekarhatûy /r/- î na- ber le vokal le şewey qisekirdinî reşan le Detriot le nêw twêjî serewey çînî nêwerast piyawan 66. 6, jinan 90. 0, le nêw twêjî xuwarewey çînî nêwerast piyawan 52. 5, jinan 70. 0, le nêw twêjî serewey çînî kirêkar piyawan 20. 0, jinan 44. 2, le nêw twêjî xuwarewey çînî kirêkar piyawan 25. 0, jinan 31. 7

Hêndêk le nûseran hewlyan dawey ew core nimûneye le nêw komellgey reş da be amaje kirdin bewe şî bikenewe ke binemaley Efrîkayî Emrîkayî çînî xuwarewe nimûney binemaley mê wecaxî (matarîçhal) ye û le binemale da ewe dayke karubarî malê legell dinyayî derewe heldesûrêne û pêwendî pêşeyî legell axêweranî şewezarî bepirêstîj heye. Belam, em şîkirdineweye tewaw niye, çunkû her heman nimûne le nêw komellgey sipîyan û le Inglîsîy Birîtanyayîş da debîndrê. Bo nimûne, le Inglîsî Norwij da, her heman core nimûne le gorênerî (ng) da derdekewê (axêweran çî bilên walking yan walkin'). Em xişteyey xuwarewe şewey bekarhatûy le sedî na- RP (telefuzî wexokiraw)-î in'' le nêw axêweranî çîne ciyawazekan û destekanî cînsî komellayetî bedestewe deda:

Tuwêjî nêwerastî çînî nêwerast piyawan 4, jinan 0, twêjî xuwarewey çînî nêwerast piyawan 27, jinan 3, twêjî serewey çînî kirêkar piyawan 81, jinan 68, twêjî nêwerastî çînî kirêkar piyawan 91, jinan 81, twêjî xuwarewey çînî kirêkar piyawan 100, jinan 97

Dîsan, jinan le sedêkî beriztir le şewe ' başekan' ziyatir bekar dehênin. Le Inglîsîy Lendenîşda, zor ziyatir rêy têdeçê piyawan bestî gerûyî ziyatir le jinan bekar bihênin le wuşey wekû butter û but da. Ê ew diyaredeye tenê be Inglîsî Birîtaniyayî û Inglîsîy Emrîkayî berbest nabê. Bo nimûne, le Efrîkay Xuwarû le Transvall lêkolîneweyek kirawe bo berawurd kirdinî şewey qise kirdinî Inglîsî axêweranî nêr û mêyî şagirdanî xwêndingey amadeyî ke hawtemen bûn û her xelkî heman şar bûn. Ew lêkolîneweyê sebarete be telefuz kirdinî çuwar vawêlan kira:

1. Vawêl le wuşey gate, da, ke le Efrîkay Xuwarû şewey derbirînî le î here bepirêstîjewe RP dest pêdeka [geit] ta degate şewey here kem pirêstîjî Efrîkay Xuwarû [gzt], ke kutî yekem zor dête xuwarê û zor dête nêwerastewe û berew dîftong deçê, wek le wuşey bird da.
2. Vawêl le "çan't" da, ke le [ka:nt] î RP yewe heye ta, [kD:nt] î xuwarûy Efrîkayî, ke çonêtî vawêleke zor nizîke lewey le on î RP da heye - vawêlêkî xirrî ke berew piştewe derdebîrdê.
3. Vawêlî out, ke le derbirînî [awt] î RP yewe dest pêdeka ta degate [æut] î Xuwarûy Efrîkayî, ke yekem kutî le pêşewe derdebîrdê û we vawêlî cat deçê le RP da.
4. Vawêlî wuşey boy ke le şewey derbirînî RP yewe dest pêdeka [boi], ta degate şeweyekî ke kutî yekemî xir derdebîrdê [bui] wek derbirînî wuşey sjool le RP da.

Kuran, zor rêy têdeçê telefuz kirdinekanî nawçeyî nastandard zor le kiçan ziyatir be kar bihênin.

Ke wabû, le beşe ciyawazekanî dinyay Inglîsî ziman da, herweha le Koasatî da, derkewtûwe ke axêweranî jin ew şewane beka rdehênin ke be 'baştir' û 'durust tir' dadendirên lew şewanen ke piyawan bekaryan dehênin. Ew dozînewane duwacar le jimareyekî zor le zimananî dîkey Urûpa û şwênî dîke da dûpate kirawnetewe û be modêl dandrawin. (legel eweşda, lew bareyewe, lêre da debê rast kirdineweyekî girîng bikrê: lew komellgeyaneyda ke şewezarî standard tenê be rêgey perwerde û/ yan be rêgey pêwendî legell derewey komellgeke wer degîrê û xelik fêrî debin, ew jinaney wa le xwêndin û perwerde û/ yan sefer bê beş kirawin aşkiraye ke şewe standardekan le piyawan ziyatir bekar nahênin – bo nimûne, ewe sebarek be hêndêk komellgey 'Erebî ziman gutirawe.)

Le rastîda, ême detuwanîn bilêyn ke ciyawazêtî cînsî komellayetî ew core take dozînewey here şîlgîre ke le karî zimannasî komellayetiyewe le sertaserî dinya le mawey sî salî rabirdû da serî helhênawe. Ewe bo debê wabê? wulamî durust ewe ye ke ême be wurdî nazanîn, belam zimannasanîy komellayetî lew bareyewe jimareyek pêşniyazî ciyawaz, û be pêwîstî cêy pirsiyarî, hênawete gorê.

Yekem, amaje bewe kirawe ke axawtinî çînî kirêkar, wek hêndêk layenekanî dîkey kultûrî çînî kirêkar le komellî ême da, wêdeçê manay serbestirawî piyawane bê yan be nêrayetî bestirabêtewe, ke eweş detuwanê piyawan bigeyênete ewey ke kewtine ber kartêkerî şewe nastandardekanî ziman ziyatir le jinan be layanewe pesindtir bê. Eweş, be norey xoy, renga leber ewe bê qîsekirdinî çînî kirêkar be 'tuf bûn'ewe bestirawetewe, ke le rûy nerîtiyewe wa dandirawe ewe yekêk le xesletekanî jiyani çînî kirêkare - û 'tuf bûn' be berbilawî wa dadendirê xesletêkî be dilî piyawane û nêrane bê.

Duwem, amaje bewe kirawe zor le komellan wêdeçê çaweruwani astêkî ziyatir le pêbendî be norme komellayetiyeke – akar û kirdewey baştir – le jinan biken ta ewey ew çaweruwaniyeke le piyawan hebê. Eger babêk şewêkî şemo be mestî bêtewe malê û be ser mafûrey jûrî berdestan da birrşetewe, ewe xirape. Belam eger daykeke ewe bika, zor le xelik wa hest deken ewe xiraptir bê. Jinêkî Norwêjî ke le pirojeyekî lêkdanewey lehce da çawpêkewtinî legell kirabû, katêk pirsiyarî lêkira boçî ew telefuzî bepirêstîjî [ɛg] 'egg' bekar hênawe, belam birakanî gutuwiyane [æg]: le wulam da gutbûy 'bo jinêk nabê bilê [æg]. Her wek le New Zealand zimannasî komellayetiê êlîzabêt Gordun amajey pêkirduwe, ew biwarey ke le rûy nerîtiyewe be raşikawî çaweruwani akarî 'baştir' le jinan kirawe, le ber dûpêwaneyî bûn le komellî êmeda, buwarî çalakî cînsî buwe. Ew delê le waneye jinan le ber ewe be şeweyekî zor bepirêstîjtir qise biken bo ewey gumanî eweyan lê nekirê ke le rûy cînsiyewe herze bin.

Be leber çawgirtinî ewey ke le komellgeyekî axawtin da gorênerî zimanî hen û pêwendiyekî hawçeşnêtiyan legell çînî komellayetiê da heye (ew formaney çînî serewe bekarî dehênin pile û pirêstîjî lew formaney çînî xuwarewetir bekarî dehênê ziyatir yan 'durust' tire), boye guşarêkî komellayetiê le ser axêweran heye pirêstîjî wedest bihênin yan be 'durust' we ber çaw bîn be bekar hênanî formekanî çînî serewetir. Legel eweşda, eger şitekanî dîkeş bo jinan û piyawan yeksan bin, renege ewe rastiyeke bê eger bigutirê ew core guşarane le ser jinan ziyatirin. Le serêkî dîkeşewe, guşar heye bo berdewam bûn le ser bekar hênanî şewey kemtir be pirêstîjî nastandard, her wek le nimûney Martha's Vineyard (pêştir durgeyekî tak kewtû buwe le qeraxî New England le Bakûrî Rojhelatî Dewlete Yekgirtuwekanî Emrîka) da dîtman wek nîşaneyekî hawpêwendî desteyî û nasêney kesêti. Belam, lêre da ew core guşarane le ser piyawan ziyatirin ta jinan, eweş le ber çemkekanî piyawetiê û nêrayetiê ke le komellî ême da bawin.

Ta ew cêgey ke pêwendî be zimanî Ingîsiyewe hebê ême belgey zor çawrakêşman hen le mer ewey ke çon nirxe komellayetiyeke û dewrî cînsî komellayetiê karlêkerî debê le ser boçûn û ruwangey axêweran le ast şewê zimanîyeke – û her weha bekar hênanî be kirdewey ew şewane le layen ewanewe. ême belgeyekî zorman be desteweye nîşan bideyn ke, le Ingîstan, Ingîsiy standard û rawêjî RP pirêstîjêkî berzyan heye. (bo nimûne, ewe zor be başî pêy zandrawe, ew axêweraney ke serincêkî zor dedene ser şewey qise kirdinî xoyan le barî zimanîyewe berew arastey ew şewezare be pile û payane deçin.) ey başe, ew qiseye çî ke delê şewey axawtinî çînî kirêkar ziyatir be lay şewey qisekirdinî piyawanî dadeşkênê? Daxuda ême detuwanî bîselmênî ewe waye? qiseyekî awa be

rastî pişt bew bawere debestê ke şêwezarekanî zimanî nastandardî çînî xuwareweş core 'pirêstîj' êkiyan heye, û ewe be taybetî le mer piyawan waye. (ême dekrê way dabinêyn ew qiseye raste:dena eger wa nebê debû zor axêwerî ziyatîrî RP û Inglîsîy standard hebûban lewey ke le rastîda hene. Belam diyare ewe rezamendiyekî zor pêk dehênê eger miro bituwanê nîşanî bida.)Labov nêwî ew core 'pirêstîj'ey nawe pirêstîjî şarawe çunkû boçûnî lew çeşne be aşkirayî dernabirdrên, û be şêweyekî berçaw le nirxe komellayetiye baw û serekîyekan dûr dekewnewe (wate le xwêndinge û damezrawekanî dî) ke hemû kes pêyan dezanê. Bo nimûne, wuşey pesnawî wek 'baş' û 'xoş' be asayî bo şêwezare standarde be pirêstîjekan terxan kirawe.

Nimûney belgeyek ke nîşan deda pirêstîjî şarawe heye be şêwey xuwareweye. Le lêkdanewey lehcey şariyaney Norwij da, dawa le zaniyarîderan kira le taqî kirdineweyek da ke 'bo xoyan helîsengênin' beşdarî biken, bo ewey lewe bikoldrêtewe ewan bo xoyan pêyan waye wuşeyek çon telefuz deken û le rastîda şêwey telefuz kirdinekeyan çone. Le taqîkirdinewekeda be dengî beriz wuşe be dû yan ziyatir telefuz kirdinî ciyawazewe bo zaniyarîderekan xwêndranewe bo nimûne wuşey 'tune' carêk wek [tju:n] û carêk wek [tu:n]. (şêwey yekemyan 'î' [j] têdaye ke, dexizê, ewî duwemyan 'toon' ewey têda niye. Ew dû core telefuzkirdine her dûkyan le Norwij bawin. Ewey yekemyan telefuzêkî RP ye, û pirêstîjî zor le wey duwemyan ziyatire.)Duwaye dawa le zaniyarîderekan kira be nîşane kirdin le ser xişteyek jimareyek binûsn û diyarî biken be asayî ewan xoyan kam telefuz dekar deken. Be berawurd kirdinî akamekanî ew taqîkirdineweye ke le rastîda wulamekanyan be dem hawpirsekiyekanda le ser recorder aste kirabûn, helî ewe rexa ciyawazî nêwan ewey ke zaniyarîderekan pêyan wabû telefuzyan kirduwe û ewey ke le rastîda kirdibuyan derkewê. Akamekan le derbirînî vawêlî wuşey wek tune, student, music û htd da zor çawrakêş bûn, û le xiştey jimare 7 da nîşan dirawin. Zaniyarîderekan be dû deste dabeş kiran: ewaney ke 50 le sed yan ziyatir [c] yan be kar hênabû le qisekaniyanda ke Leser recorder aste kirabû be bekarhênerî dirêjkerewey [c] dandiran, û ewaneş ke kemptir le 50 le sedyan bekar hênabû, be bekar nehêner dandiran. Ew xişteye nîşan deda zorbey ewaney boxoyan pêyan wabû wuşekeyan çon telefuz kirduwe wulamekeyan rast bû: 84 le sedî ewaney le qise kaniyan da]] dirêj kiraweyan be kar nehênabû, rayangeyand bekaryan nehênawe, û tenê 16 le sed le waney ke bekaryan nehênabû le rastîda îdî'ayan kird ewan şêwey zor be pirêstîjtiryen bekar hênawe, le katêkda bekaryan nehênabû. Belam serinc bidene ser ewaney dengekeyan dirêj kird buwewe. Le katêkda ke 60 le sedyan wulamekeyan rast bû, le rastîda 40 le sedyan îdî'ayan kird ewan telefuzî pile xuwarû, ne pirêstîjî [tu:n] yan bekar hênawe tenanet egerçîş wek kasêtî recordereke nîşanî da gutbuyan [tcu:n]. ême dekrê bew core

xelkane bilêyn ' gêrewerey xirap' çunkû ewan îdî'ayan dekird şêwey kemptir be pile û payeyan kemptir bekar hênawe le katêk da wa nebû, û dekirê be 16 le sedekêy dîkeş bilêyn ' gêrewerey çak' çunkû çakî boçûbûn.

Xiştê 7. Xo biryar dan le ser çilonayeti telefuz kirdinî tune le Norwiş

zaniyarîderekan be %

ewaney gutyan dengî vawêlekeyan dirêj kirduwetewe 60

ewaney gutyan dengî vawêlekeyan dirêj nekirduwetewe 40

ewaney ke dengekeyan le rastîda dirêj kird buwewe 16

ewaney ke dengekeyan le rastîda drêj nekir dibuwewe 84

Ca êsta ême eger ew pinktaney ko kiranewe be pêycînsî komellayeti dabeş bikeyn, akamekanî zor şit derdexen. Le nêw 40 le sedî ' gêrewerey xirap' da nîweyan piyaw û nîweyan jin bûn. Belam le nêw 16 le sedî 'gêrerewey çak' da, giştyan jin bûn. Hejmarekanî ew taqîkirdineweye be giştî le xiştêy 8 da diyarî kirawn.

Ême detuwanîn bibînîn ke zaniyarîdere piyawekan, be şêweyekî serincrakêş zor le hawta jinekan wulamekanyan rast tire. Jnekan, detuwanîn bilêyn, le zor nimûnanda, delên ke şêwekanî çînî serewetiryan bekar hênawe bê ewey ewe wa bê – le waneye ew core wulamd aneweyewe le ber ewe bê ewan awatyan wa buwe ke telefuzyan wa bê yan wayan bîr kirduwetewe ke debê telefuzyan wa bê, ca boye, rêşî tèdeçê be rastîş lew bawere dabûbin ke telefuzyan î şêwey çînî sereweye. Ew axêweraney ke delên şêweyekî taybetî bekar dehênin û mebestyane wa biken ew şêweye be layanewe pesindtire lewey ke ewan be asayî bekarî dehênin. (wa wêdeçî hîç xo helxeltandinêkî wuşyarane le gorê da nebê.)

Le xuwarewetir hejmarekanî xiştêy 9 le berçaw bigirin. ewe akamî taqîkirdineweyek nîşan deda ke axêweran xoyan helyansenganduwe sebarete be vawêlî em wuşane ear, here, idea le Inglîsî Norwij da (le Norwij dû şêwey serekî ew vawêle heye yekyan [ɪə] RP ye ewî dîkeyan [:ɛ] ye, vawêlî wuşey care, ear, air, here, hair wek yek wan.)Ew xiştêye nîşan deda zorbej jinekan gutuwyaneyan ewan şêwey RP vawêleke be kar dehênin, ke le rastîda wa niye, belam nîweî piyawekanîş be pêçewaneyan wulam dawetewe. Ewan gutuyane şêweyekî kemptir be pile û paye, û zortir î çînî xuwarewetiryan be kar

hênawe lewey ke be asayî bekarî dehênin. Eweş belgeyekman dexate berdest ke axêweranî piyaw le Norwij, be bê ewey xoyan hestî

Xiştêy 8. Xo biryardan le ser çilonayetî telefuz kirdinî tune le Norwij

zaniyarîderekan be %

ewaney le wulamekeyan ziyad kirduwe be giştî 13

rêjey piyawan 0

rêjey jinan 29

ewaney le wulamekeyan kem kirduwe be giştî 7

rêjey piyawan 6

rêjey jinan 7

wulamî durust be giştî 80

rêjey piyawan 94

rêjey jinan 64

pê biken, şêwekanî nastandard û pile nizmî axawtînyan belawe pesndtîre - le rastîda, ewende zore, ke ewan îdî'a deken ew şêwane bekar dehênin yan tenanet dengî xoyan awa debîyên ke bekaryan dehênin tenanet le katêkîş da ewan awa naken. Wêdeçê, jimareyekî zor le axêweranî piyaw, ziyatir bîr lewe bikenewe ke pirêstîjêkî şarawe be dest bixen ta ewey piley komellayetiyan dest kewê(ke zor be asayî awa diyarî kirawe). Le ruwangey piyawî Norwijî yewe (û renga ême, bituwanîn le ser piyawî xelkî cêgey dîkeş bilêyn) şêwey qisekirdinî çînî kirêkar hem be pile û hem be pirêstîje. Le serêkî dîkewe, pêçewaney aşkiray ewe bew pinktaney le boçûnî jine zaniyarîderekanewe lew bareyewe derkewtûn dadegîrêtewe, û nîşan deda ewan (ewan ta 68 le sed 'gêrerewey çak' nîn le nimûney vawêlekanî nêw wuşegelî le gwên ear da), zoryan be lawe pesndtîre formekanî RP çînî nêwerast bekar bihênin. Ew ciyawazî boçûnane le nêwan piyawan û jinan da ewe şîdekatewe boçî ew ciyawazêtiyey le mer cînsî komellayetî le nimûney ng Norwij û dû hokare le goranhatuwekanî Detriot ew şêwane be xoyanewe degirin. Le ber ewey komell xeslete ciyawazekan le nêw dû cînsî komellayetî da ciyawaz heldesengênê, pirêstîjî şarawe karlêkeriyekî zor be hêztir û pitewtir le piyawan deka, û ew karlêkerîye le ser jinan pirêstîjî ' asayî' ye. Akamekeşî eweye ke eger çînî komellayetî be cînsî komellayetî bibestirêtewe ciyawazêtî rawêj derdekewê herwek le serewe da wêna kira.

Xiştêy 9. Xo biryardan le ser çilonayetî telefuz kirdinî ear le Norwîj

zanyarîderekan be %

ewaney le wulamekeyan ziyad kirduwe be giştî 43

rêjey piyawan 22

rêjey jinan 68

ewaney le wulamekanyan kem kirduwe be giştî 33

rêjey piyawan 50

rêjey jinan 14

wulamî durust be giştî 23

rêjey piyawan 28

rêjey jinan 18

Le zimanî Koasatî, û betaybetî le zimanî Jukji da dîtman axawtinî jinan zor le î piyawan xoparêztire. Goranî zimanî, ke le layen piyawanewe serkêşî dekira, û duwaye jinanîş be şwênnyanda çûn, eger çûbêtin. Nimûney ewto, diyare be şêweyekî zor aloz û pêçelpêçtir, le nêw komellge rojaway yekanîş da debîndrê: bo wêne, katêk bas dête ser gorane zimanîyekan ke be arastey dûrkewtinewe le standardî pirêstîj da deçin, wêdeçê jinan zor le piyawan xoparêztir bin – bo nimûne le saz kirdinî bestî gerûy glottal stop î /t / le zimanî Inglîsî da. Lew nimûnaney da ke coreyek şêwezarî pile berz yan pêwerêkî neteweyî le gorê daye, ew demî goran berew arastey ew norme xoy derdexa, ke eweş zor car, le layen jinanewe serkêşî dekirê. Bo wêne, le Hillsboro, Californiyay Bakûrî, wêdeçê jinan pêşengî goranî normêkî kontirî pirêstîj bin berew yekî nwêtir. Le katêkda şêwe qisekirdinî xwendewaraney Başûrî bew corey le rabirdû da le Hillsboro be pirêstîj da dendira kemptir dengî /r/y dekar dekira, êsta be taybetî jinan normêkî ber bilawî neteweyî bepirêstîj bekar dehênin ke /r/y na ber- le vokalî têdaye le wuşegelî wek "çar" û "çart" da.

Berew pêşçûnêkî ewtoş le nawçey Larvik le Başûrî Norwêj rûy dawê, û êsta formekanî nêw şarî be nawçekanî derewî şar da bilaw bûnetewe û cêgey formekanî pêşûy gundîyaneyan girtuwetewe. Lêreş da jinan serkêş û rêşanderin. Le nêw zor binemalanda dekrê sê qonaxî ciyawaz le yektirî bikirênewe: baban le nawçekanî derewey şarîda zor xoparêztir le kurekanyanin, û korekanîş be norey xoyan zor le daykekan û xuşkekanyan xoparêztirin. Bo nimûne, zor wêdeçê jinan formî bepirêstîjî şarî [Mɛlk] 'şîr' bekar bihênin ta formî tewaw gundiyaney [mjɫɹæk] û be giştî wêdeçê wecêk le pêş axêweranî piyaw bin.

Le Norwîjîş, her ew core nimûneye ser heldehênê, lewêş jinan pêşengî goranin berew telefuzkirdinî be pirêstîj. Legel eweş, le Inglîsîy Norwîj da rêzperêk heye, ewîş eweye goranî zimanî nimûney asayî ciyawazêtî cînsî komellayetî şêwanduwe. Hokare gorênereke lew nimûne naasayî yeda dengî vawêlî wuşegelî wek top, hot, dog e. Le Norwîj ew denge dekrê wekû vawêlêkî piştewey xir bibîstirê, wek le telefuzî RP da derdekewê [pɔt], yan vawêlêkî kirawe [pɔt]. Em reqemaney xuwarewe le sedî bekar hênanî formekanî na RP le layen axêweranî ciyawazewe nîşan deda.

Piyawî ser be twêjî nêwerastî çînî nêwerast 1, piyawî twêjî xuwarewey çînî nêwerast 11, piyawî twêjî serewey çînî kirêkar 44, piyawî twêjî nêwerastî çînî kirêkar 64, piyawî twêjî xuwarewey çînî kirêkar 80.

Jinî ser be twêjî nêwerastî çênî nêwerast 0, jinî twêjî xuwarewey çînî nêwerast 1, jinî twêjî serewey çînî kirêkar 68, jinî twêjî nêwerastî çînî kirêkar 71, jinî twêjî xuwarewey çînî kirêkar 83.

Bo destekanî çînî nêwerast, her wek miro çawrê deka, pinktî piyawan le î jinan balatire (wate ewan formekanî ne- be pirêstîj ziyatir be kar dehênin). Le layekî dîkewe, bo sê destey çînî kirêkar, pinketekan berdewam be lay dîke da (' hele') da dekişê: Le nêw ewanda pinktî jinekan balatire. Ême dekrê ewe awa şîbikewewe: vawêlî serewe le Norwîj êsta xerîke dekewête ber goranî zimanî: vawêle xirekanî corî rawêjî RP le ziyad bûn dan, her wek le xuwarewe le sedî bekar hênanî vawêlî xir le nêw deste cor becore temenyekanda nîşan deda.

Ewaney temenyan le nêwan 10 ta 29 salan daye %55, ewaney temenyan le nêwan 30 – 49 salan daye% 63, ewaney temenyan le nêwan 50 – 69 salan daye %67, ewaney le serewey 70 salanin %93

Legell eweşda, ew gorane be şêweyekî serincrakêş û naasayî rû deda, vawêle xire nwêyeke le layen jinanî çînî nêwerastewe le rawêjî RPiyewe hênrawete nêw Inglîsîy Norwîj, ke şêwekanî be pirêstîjyan be lawe pesinde û boye nizîkey 100 le sedî vawêle xirekan bekar dehênin. Ewe, her weha piyawanî çînî kirêkarîş hênawyanete nêw lehceke, bo lasayî kirdinewey şêwe axawtinî çînî kirêkar le nawçey Lenden û melbendî dirawsêyan Suffolk. Ew rawêjaney çînî kirêkar ke [ɔ]ş bekar dehênin bo piyawanî Norwîj manayekî serbestirawî (pirêstîjî şarawe) yan heye, her boyeş ewan ziyatir vawêlî xir bekar dehênin û pinketakanyan le jinanî çînî kirêkar kemtire. Eme, xoy nimûneyekî naasayî ye le pirêstîjî aşkira û guncan legell pirêstîjî şarawe û ew dewre deselmênê ke ciyawazêtî cînsî komellayetî detuwanê le goranî zimanî da bîgêrê.

Ke wabû, ciyawazêtî cînsî komellayetî le ziman da, ew kate ser heldeda, her wek ême dîtman, ziman, wekû diyardeyekî komellayetî le nizîkewe be boçûn û ruwangey komellayetiyewe bestirabêtewe. Piyawan û jinan le ber ewe le barî komellayetiyewe ciyawazin çunkû komell qalibî ciyawazî dewrî komellayetîyan bo dadenê û çaweruwani nimûney hels û kewtî ciyawaziyan lê deka. Ziman tenê înkas û rengdanewey ew rastiye komellayetîyeye. Leweş ziyatir, eger dewrî komellayetî piyawan û jinan goranî be ser dabê, her wek êsta le nêw zor komellan da ew gorane be rêweye, ke wabê, rêy têdeçê ciyawazî cînsî komellayetî le ziman da bigordirê yan kemîş bêtewe, û ême le serewe da hêndêk belgeman dî ke dekrê le dûy ew boçûne biden. Leweş ziyatir, eger bimanewê ew " qalibey komell bo jin û piyawanî danawe" bigordrê, ew demî debê ta radeyek le ser ziman cext bikirêtewe û hewil bidrê bo gorînî. (le bendî 10 da hemûlayentir lew mijare dedwêyn.)

Boçûn û ruwangey komellayetî, be rûnî pêwendiyekî girîngî be nasênewe heye. ême le bendî pêşû da dîtman ke ziman detuwanê dewrêkî girîng bigêrê le nîşandanî nasêney êtnîkî da. Debê eweş bizanîn nîşandan û derbirînî nasêney gender (cînsî komellayetî)ş her ewende girînge. Aşkiraye cwêbûnî cênawî kesî yekemî tak be hîç cor pêwîstîyekî reha niye, her boyeşe zorbey zimanekan ew ciyawazîye cênawîyeyan niye. Belam ew cwêbûnane, lew zimananey da ke heyane dewrêk degêrin û nasêney axêwer wek piyaw yan jin nîşan deden û ray dehêzênin. Her awaş debê lewe têbigeyn hokare gorênerekanî wuşeyî, dengsazî û rêzimanî, ke lew bende da basman kirdin, dewryan heye.

Serçawey em wergêrane, bendî 4-î kitêbî: Sociolinguistics An introduction to language and society, Peter Trudgill, Penguin Books, Fourth editon 200, pp.61-80

Kovara Kanîzar bi hevkarî li gel koma Zimanê Kurdî⁷³

FERHENGOKA ZIMANÊ ZAROKAN

Mebest ji "zimanê zarokan" li vê derê hin peyv in ku mezin di navbera xwe de bi kar naînin lê zarok di jiyê anku temenê xwe yê biçûk de dibêjin û herwiha gelek caran jî mezin wan di axiftina xwe ya li gel zarokan de dixebitînin.

Armanca me li vê derê rêzkirina wan peyvan e ku di axiftina di navbera mezin û zarokan de tîbî bikaranîn û zarok wan ji mezinan hîn dibin û nifş bi nifş ew kêr-zêde wek xwe dimînin. Merema vê ferhengokê ne ew e ku wan peyvan rêz bike ku yek yan hin zarok "şaş" dibêjin.

Peyv ji agahîderên (informant) ji çendî de verên cuda hatine komkirin. Piraniya agahîderan kurmancîxiv bûne lê hin jî soranîxiv. Piraniya peyvan di "zimanê zarokan" de li de verên kurmancîxiv de tîbî bikaranîn lê çend peyv jî ji soranî ne ku di kurmancî de ne li kar in.



Eger (S) li dûv peyvê hebe, ew bi soranî lê ne bi kurmancî ye. Eger (S) li pey peyvê tine be, ew tenê bi kurmancî ye yan jî kurmancî û soranî ye.

⁷³ <https://www.facebook.com/groups/zimanekurdi>

Di vê hejmarê de em ê ferhengoka peyvên zimanê zarokan belav bikin û di hejmara bê de jî taybetmendiyên zimanê zarokan vekolin.

ala binêr êla

be'êk bizin

biv e, bive germ e, xeter e (dikare bişewitîne, dikare bisoje)

cucu çûçik, teyr, firinde

çaç çav

çeç (tet) dest, lep, mist, kulm

çiç, çiço şîrê dayikê, bersînga dayikê

çiz 1) [Z-ya qelew] mîz: *çizê kirin* mîstin 2) [Z-ya zirab] dest nediyê, dest nekiyê, dest neavêjîyê

çîç (S) ciwan, spehî, rind, delal, bedew

çûçe, çûçî rûniştin: *çûçî ke rûne*

dadê, dede xwişk, xwişka mezin

eçê, eçî lêdan: *eçê ke lê bide, lê bixe*

ehê [ehê] 1) gû: *ehê kirin* rîtin, gû kirin 2) lêdan: *ehê ke lê bide, lê bixe*

eq, eqo gû, rîtin

elok telefon

'em xwirak, zad, xwarin: *'em kirin* xwarin

ewe diêşe, têşe, êş dike

êla, êlla (L-ya qelew) xew, razan, raketin, nivistin: *êla ke raze, rakeve, binive*

gixik ken, kenîn

hakê, hayê, haê xew: *hakê ke binive, raze, rakeve, xewê bike*

hepo xilas, qediya, nema

hepu (S) = **hewo**

hewo, hewok [hewo, hewok] se, kûçik, seg, her heywanê tirsnak

hilo rabe

hêz hembêz, koş

hop, hopelês xwehilavêtin, xweçengkirin

huto, hito [huto, hito] keçikên biçûk

'inê tirimpêl, otomobîl, erebe, seyare, maşîn

jîjî goşt

kaka şîrînahî

kako, keke, keko bira, birayê mezin

kekir şekir

kix e, kixe pîs e (nexwe, ji devê xwe biavêje)

lalê 1) girar, pîlav, birinc 2) xew: *lalê ke binive, raze, rakeve*

lola xew: *lola ke binive, raze, rakeve*

lolo mîz

meme, mem, memme vexwarin, şîr, av

mî'ek mî, mih, berx

nîna, nînî dans, reqs, govend, dîlan, dawet:
nîna ke bireqise, dansê bike

nono, nunu (S) xwarin, şîrînahî

oçê goşt

o ke, olê ke raze, rakeve, binive, xewê bike

paç maç, ramûsan

papecane (S) pêlav, sol, kewş

papo pêlav, sol

pe' e, pe'e pîs e (nexwe)

pep pê, ling

pepe nan

pido, pidok kîr, xirr, endamê cinsî yê nêran

pifo (S) xwarin, xwirak

pişik pisîk, kitik (di hin devokan de "pişik"
tenê bi zimanê zarokan e û bi zimanê
mezinan "kitik" e)

pito, pizo kurrikên biçûk

pitê keçikên biçûk

poç porr, pirç, mûyên serî

qaqa hêk

qeb-qeb, qebo-qebo were hemêza min, were
milê min, were koşa min!

seke, se ke bisekine, raweste

şoşo, şoşok ker (dewar)

tatî meş, birêveçûn, çûn, livîn: *tatî ke* bimeşe,
bilive

tet (çeç) dest, lep, mist, kulm

tit (çiç) bersîng, çiçik, memik

tix, tix e pîs e (ji devê xwe biavêje, neke devê
xwe)

tîtê tirimpêl

totî rûniştin: *totî ke* rûne, rûne xwarê

vav av, vexwarin

wişik xweşik, delal, rindik, pê şa bûn

xito = huto, hito

”Karîn”, ”şiyân” û ”tiwanîn” û hevrehên wan di zarên kurdî de

Bi hevkarî: Hasan Aslan (zazakî), Muhemmed Teqevî (kurmanciya Xorasanê), Ali Bayrakli (kurmanciya rojavayî) û Husein Muhammed (zar û zimanên din)

Di zimanê kurdî de, li gor zar û devokên cuda, sê peyvên ji rehên cuda bi maneya ”taqet hebûn, pê çê bûn, jê hatin, qabiliyet hebûn, hêz û qewet bo kirina tiştekî hebûn” (bi inglîzî ”can, to be able to”) tên bikaranîn:

- karîn (herwiha ”kanîn”)
- şiyân (herwiha ”şên, şe kirin, şu kirin”, bi zazakî ”şayene, eşkayene, şikayene, bese kerdene”)
- tiwanîn (herwiha ”tiwanisîn, tiwanistin, tanistin”)

Mirov dikare bergeh û cografyaya bikaranîna van peyvên wiha diyar bike:



Karîn (kanîn, kaynîn, kûynîn)

"Karîn" û forma wê ya duyemîn "kanîn" di kurmanciya navendî û serhedî de ji sinorê deverên ermenîaxiv li bakur-rojhilata Kurdistanê heta bigihe deverên erebîaxiv yê Sûriyê tê bikaranîn. Formên "kaynîn, kûynîn" (rehê dema niha -kû-: ez dekûm, ez nikûm) di kurmanciya Xorasanê de li gel hev wateyên xwe "weşe kirin" (weşe dekem, weşe nakem) tî xebitandin (bo "weşe kirin" li jêrtir binêrin).

Şiyan (şu kirin, şe kirin, şayene, weşe kirin, bese kerdene)

Peyva "şiyân" di kurmanciya rojhilatî de bi berfirehî tê bikaranîn û li wan deveran ne peyva "karîn" ne jî ti formeke wê ya din (kanîn, kaynîn, kûynîn) peyda nabin.

Peyva "şiyân" (rehê dema niha "-şê-") di soranî de jî heye lê bi maneya xwe ji "şiyân" ya kurmancî bisinortir e û tenê wateya "mimkin bûn" tê bikaranîn.

Hevreha peyva "şiyân" di farisî de jî wek "şayesten" heye lê wateya wê "hêja bûn, layiq bûn, jêhatî bûn, bi kêr hatin" e.

Di kurmanciya rojavayî de jî bi maneya "şiyân, karîn" formên wek "şu kirin, şe kirin" hene ku hevrehên peyva "şiyân" (rehê dema niha "-şê-") ne.

Di zazakî de peyva "şayene" (rehê dema niha "-şena-") hev wate û bêguman hevreha "şiyân" ya kurmanciya rojhilatî û "şu/ şe kirin" ya kurmanciya rojavayî ye.

Di zazakî de bi heman maneyê herwiha peyvên "şikayene, eşkayene" (rehên dema niha "-şikên", "-eşken-") hene ku bi ihtimaleke mezin ew jî hevrehên "şayene" ya zazakî û "şiyân" ya kurmanciya rojhilatî ne lê sebêbê hebûna dengê K di wan de nayê zanîn.

Di kurmanciya Xorasanê de bi heman maneyê peyva "weşe kirin" heye ku hevreha "şe kirin, şu kirin" ya kurmanciya rojavayî û "şiyân" ya kurmanciya rojhilatî ye. Dengên "we-" di "weşe kirin" de divê pêşgîrek be.

Di zazakî de jî (li Dêrsimê) lêkera "bese kerdene" heye ku tam hevreha "weşe kirin" ya kurmanciya Xorasanê ye. Di zazakiya dêrsimî de adeten Ş dibe S. Lê tiştê ecêb ew e ku adeten li beramberî B-ya kurmancî di zazakî de V heye lê di vê peyvê de di zazakî B û di kurmancî W li kar e.

Tiwanîn (tiwanisîn, tiwanistin, tüanisîn, tüanistin, tanistin)

Peyva serekî ya bi wateya "karîn, şiyar" yê kurmancî di soranî de "tiwanîn" e. Heman peyv di devokên kurdiya başûrî de bi awayên "tiwanisîn, tiwanistin, tüanisîn, tüanistin" (rehê dema niha "-tiwan-") tê bikaranîn. Di devokên şêxbizî de li Rojavaya Tirkîyê ew bûye "tanistin" (rehê dema niha "-tan-") lê herwiha "tüanistin" jî tê gotin. Hevrehê wê herwiha di farisî de jî wek "tevanisten" (bi devkî herwiha "tûnisten, tûnissen", rehê dema niha "-tevan-, -tûn-") peyda dibe.

Wisa diyar e ku di ti devokên kurmancî de peyva "tiwanîn" peyda nabe yan jî nemaye. Lê mirov dikare ji aliyê etîmolojî ve hem peyva "şiyar" û hem jî peyva "tiwanîn" wek peyvên xwemalî yê îranî vegeirîne heta makezimanê proto-hindûewropî.⁷⁴

Tinebûna peyva "tiwanîn" di lehceyên ne-hevsinorên farisî de (kurmancî, zazakî) dikare nîşana wê yekê be ku "tiwanîn" ji farisî ketiye soranî û kurdiya başûrî lê bi esehî nayê zanîn. Eger ji farisî hatibe jî, bi berî sedan salan hatiye ji ber ku hem ji aliyê paşgira xwe ve bûye kurdî (bi soranî bi paşgira "-în" beramberî "-isten" ya farisî) û hem jî ji aliyê cografî ve di hemû soranî de (hem li Rojhilata Kurdistanê û hem jî li Başûrê Kurdistanê) tê bikaranîn.

Lê gelo "karîn" û hevrehên xwe ji kû tên?

Tiştê ecêb ew e ku di kurmanciya rojhilatî de "şiyar" û di kurmanciya rojavayî de jî hevrehên "şu, şe" û heta di zazakî de jî hevrehên wan yê wek "şayene, şikayene, eşkayene, bese kerdene" hene lê di kurmanciya navendî de – ku dikeve navbera van hemûyan, ti şûn û şopên hevrehên "şiyar"ê peyda nabin.

Ji bilî kurmanciya navendî û hin deverên kurmanciya Xorasanê, hevrehên "karîn" (yan "kanîn, kaynîn, kûynîn"ê) ne di ti devokên din yê kurmancî de, ne di ti zarên din yê kurdî de û ne jî di ti zimanên din yê îranî de peyda nabin. Loma ew mirovî neçarî vê pirsê dikin:

Gelo "karîn" û hevrehên wê "kanîn, kaynîn, kûynîn" ji kû tên?

⁷⁴ Bo etîmolojiya "şiyar"ê binêrin <https://ku.wiktionary.org/wiki/%C5%9Fiyar> û etîmolojiya "tiwanîn"ê jî binêrin <https://ku.wiktionary.org/wiki/tiwan%C3%AEn>

Hin nivîskarên kurd hewl didin peyva "karîn, kanîn" bi hevwatera wê ya inglîzî "can" (bixwînin: ken), almanî "kann", swêdî "kan" û hwd. yên zimanên germenî ve girê bidin.⁷⁵

Rast e ku "karîn, kanîn" bi rastî hevwaterayên van peyvên germenî ne lê ji aliyê dîrokî ve ew bi rastî ne hevreh in anku ne ji eynî rehê proto-hindûewropî peyda bûne ji ber ku K-ya proto-hindûewropî ne di zimanên îranî de (ji bilî çend cînavan wek "kî") wek K dimîne (adeten di zimanên îranî de dibe S yan Z) û ne jî di zimanên germenî de (adeten di zimanên germenî de dibe H).

Ya rast, "can, kann, kan" yên zimanên germenî ne hevrehên "karîn, kanîn" lê hevrehên peyva "zanîn" û "nasîn" yên kurdî ne.⁷⁶ Eslê maneya peyvên "can, kann, kan" yên zimanên germenî jî ne "karîn, kanîn, şîyan" bû lê "zanîn" bû û paşî watera wan veguheriye.⁷⁷

Tinebûna "karîn"ê û hevrehên wê di devokên din yên kurmancî de û di zar û zimanên din yên kurdî û îranî de gumaneke mezin peyda dikin ku ew nikare peyveke xwemalî ya kurdî be û mirovî neçar dikin ku bo peydakirina etîmolojiya wê li zimanên derdorê binêre.

Erebî, tirkî û aramî – ku serekaniya gelek peyvên kurdî ne – ew jî di vî warî de mirovî bêhêvî dikin û ti hevrehên peyva "karîn" nadin me. Lê gava em berê xwe didin ermenî, bersiv hêsan e û heta em dikarin bibêjin ku bêguman e jî:

Di ermeniya kevn de կար⁷⁸ (kar) maneya "hêz, qewet"ê dide, կարոլ⁷⁹ (karol) tê watera "bihêz", û կարոլաւալ⁸⁰ (karolanal) yan bi ermeniya rojavayî կրոնալ (karonal) tên watera "karîn, kanîn, şîyan, tiwanîn". Bi ermeniya kevn jî "karîn, şîyan" bi awayê կարնալ (karênal) bû.

Di formên ermenî de mirov hem dikare rehê "-kar-" (karîn) û hem jî yê "-kan-" (kanîn) bibîne. Formên "kaynîn, kûynîn" bi zelalî ji encama guherîna R bi Y ne, wek di peyva "merîk/meyîk" de.

Formên "kaynîn, kûynîn" yên kurmanciya Xorasanê ji du aliyan ve gelek giring in:

- 1) Ji peydabûna vê peyvê di kurmanciya Xorasanê de diyar e ku "karîn" û varyantên wê ne vê dawiyê ji ermenî hatine. Dîroka dirêj ya wergirtina "karîn"ê û varyantên wê herwiha ji wê jî diyar e ku "şîyan" û hevrehên wê bi temamî ji devokên kurmanciya navendî winda

⁷⁵ Bo nimûne: Baran Rizgar: <http://candname.com/tekiliya-lekeren-kanin-karin-u-zanin/>

⁷⁶ <https://en.wiktionary.org/wiki/Reconstruction:Proto-Indo-European/%C7%B5neh%E2%82%83->

⁷⁷ <https://en.wiktionary.org/wiki/Reconstruction:Proto-Germanic/kunnan%C4%85>

⁷⁸ <https://en.wiktionary.org/wiki/%D5%AF%D5%A1%D6%80>

⁷⁹ <https://en.wiktionary.org/wiki/%D5%AF%D5%A1%D6%80%D5%B8%D5%B2>

⁸⁰ <https://en.wiktionary.org/wiki/%D5%AF%D5%A1%D6%80%D5%B8%D5%B2%D5%A1%D5%B6%D5%A1%D5%AC>

bûne. Herwiha ji klasîkan jî diyar e ku wergirtina "karîn" û hevrehên wê bi kêmî bi qasî pêncsed salan kevn e ji ber ku ew bo nimûne di *Mem û Zînê* de jî hatiye bikaranîn:

Ya ne wehe em çira nikarîn

Mecrûh û çerîf û dilfekar in

- 2) Ew diyar dikin ku carekê hem R û hem jî N li dawiya rehê lêkerê hebû "*-karn- ("karnîn", bidin ber ermenî "karênal") û dû re N ji hin devokan ketiye û bûye "karîn" û R jî hin devokan winda bûye û bûye "kanîn" lê di kurmanciya Xorasanê de ti ji herduyan winda nebûne lê R-ya "*karnîn"ê bûye Y anku "kaynîn" û dû re jî "kûynîn".

KOKA ZIMANÊ KURDÎ



D. N. MacKenzie

ji inglîzî: Newzad Hirorî

Profesor **V. Minorskyî** [1] di nivîsareka xwe de ya ku wî di sala 1938-ê de li Brukselê pêşkêşî kongreya cîhanî ya 20-ê ya rojhilatnasan kiribû hemî belgeyên dîrokî, û hinek yên zimannasî, yên berdest li dor koka gelê kurd berçav kiribûn. Wî babetî pêwendiyeka rastûrast bi vê lêkolînê ve heye, çunkî heger koka kurdan misoger bihata zanîn, vekolîna dîroka zimanê wan dê hêsantir bûya.

Di destpêkê de, pêngava herî baş ew e ku mirov hinek ji wan teoriyên ku di vî warî de ji rastiye dûr in ji holê rake. Hinek ji wan, tevî belavbûna nivîsara profesor Minorskyî, hêj dijîn. Rehmetî Basile Nikitineyî hejmarek ji wan di beşê yekê yê lêkolîna xwe ya berfireh li ser kurdan de rêz kiribûn [2]. Kardoxoy (*Kardoûcoi* bi yûnanî) ya Xenophonî hemî wextan ji bo kesên ku li babûkalên kurdan digerin [3] bijartina herî rehet bûye. Lê em dibînin ku hinek kesan hewil daye kurdan bi xaldiya urartuyan, sagartuyan, yan zikirtuyan, û herweha gutiyan ve girê bidin li ser bingehê ku wan peyvan wekhevîyeka dengî, çî zêde çî kêr, li gel navê îro yê vî gelî heye. Xaldî, xweşbextane, ji meydana hatiye derxistin çunkî ew, wek têt zanîn, navê xudêyekî ne yê miletekî ye [4]. Hemî girêdanên di ji aliyê naveroka xwe ve ne mimkin in.

Diyar e ku derbasbûna navên *Kmrtioi* (kurtyoy) yan *Cyrtii* [5] (kurtî) di nivîsên Polybios, Livius û Strabonî de bi rastî amajeya eşkere ya yekane ye bo kurdan di berhemên nivîskarên kevin yên berî

me de. Herdu nivîskarên yekê behsa wan wek qolên rimhavêj di leşkerên Med û Asyaya Biçûkê de dikin. Lê Strabon wan eşkere bi çiyayiyên kûvî yên ku li Med û Ermenistanê, lê herweha li Parsê, dijîn, bi nav dike. Ji bilî vê îdîaya daawiyê, hemî belgeyên pozîtîv nîşan didin ku kurd gelekê medî ye. Profesor Minorsky vê dîtîne bi germî hembêz dike.

Heger em bihên serdema ereban, em dê bibînin ku navê *kurd* ramaneka nû ya heqaretbûnê wergirtiye û di pratîkê de bûye hevmaneya “koçer”-ê. Bo nimûne, profesor Minorsky gotinên erdnasê sedsala nehê Ibn Rustayî vediguhêze dema ew wesfa lombardan dike û dibêje ku ew “wek kurdan, li deştê di kûnan de dijîn” [6]. Ev nav îro bi geşbûna hesta neteweyî ya kurdî ji bo hema bigire hemî gel û eşîrên ku di navbera tirk û ereban li rojavayî û farisên xwerû li rojhilatî de hene têt bi kar anîn. Ev, di nav gelên îranî de, ji bo lor û eşîrên goranî yên cida jî derbaz dibe. Dîtina kurdên vê serdemê jî li ser dîrokê ji xwe sade ye. Çunkî ew hest dikin ku pêwîstiya wan bi babûkalên lehengî heye û dibînin, wek bibêjî, kes li medyên desthilatdar xwedî derneketiye, vêca bê dudilî xwe bi wan ve girê didin. Bi cidî, niho li nik wan bûye adet ku hejmara 612-ê, sala ku mediyên Nînewa dagîr kirî, li ser tarîxa me zêde bikin û bi navê tarîxa medî bi kar bînin.

Di vê tevlihevbûna faktayên kêr û texmînên pir de, belgeyên zimannasî roleka giring dilîzin. Lê, ev war jî qet ne zelal e, çunkî profesore navdar N. J. Marrî carekê ji caran hêvî dikir şopepeyvên “kurdiyeka kevna” di kurdiya nûjen de bibîne da bibe beşek ji grûpa kertî yan gorcî ya tayê zimanên yafitî. [7] Gotina pêdvî di heqê teoriyên weha de ew e ku ew ji bo piştgiriya xwe hêj li benda wan faktayan in yên ku dê bi borîna wextî eşkere bibûna. Halê hazir, em dikarin bi rehetî bibêjin ku kurdî zimanekê îranî yê normal e. Erkê min yê pêşîn ew e ku divêt ez kurdiyê bi rêya destnîşankirina sîmanyên ku wê ji devokên dî yên îranî cida dike bidim nas kirin. Mixabin! Divêt ez her ji destpêkê li xwe mukir bihêim ku encamên min bi giştî negatîv in, çunkî hema bibêje her sîmayeka kurdiyê hembereka xwe di devokekê yan pirtir yên îranî de heye.

Berbiçavtirîn sîma guhorîna [m]-ya pêşvokal bo [v]-yê, paşî di hinek devokan de bo [w]-yê ye; b.n.:

kurdî [8] *nav/w* < avestayî *namen-*

hav/wîn < *hamine*

dû(v) < *dume*

kev/wan : farisî *keman*

Hinek nimûneyên vê guhorînê, wek ku Paul Tedescoyî di nivîsara xwe de “Dialektologie der Westiranischen Turfantexte” [9] de diyar kiribû, di parsiya manî de jî hene. Guhorîneka wek vê carcarkî di belocî û loriyê de û sistematîk di vefsiyê [10] de jî xuya dibe. Lê ev nabe belge ku ew sîma sîmayeka hevbeş ya malbatî ye di van hemî devokan de. Ev di hejmareka berbiçav ya peyvên ji erebiyê nûdeykirî de di kurdî û vefsiyê de têt dîtin, b.n.

kurdî *hev/wîr*, vefsî *hewîr* erebî *xemîr*

civat *cema’et*

tewaw *temam*

(*şem*) *şewe* *şeme’*

Ev sîma bi tenê di devoka belociya jorî de [11], ya ku ji hemî devokên dî yên belociyê pêşveçûyîtir e, heye û bi [m]-ya navvokal ve girêdayî ye. Zêdebarî vê jî, vokala berî wê ginginî ye.

belociya jorî *haveg* : belociya jêrî *bameg* “zevî”, farisî *zam*

nyava : *nyama* “nîva” *miyane*

nevaş : *nemaş* “nivêj” *nemaz*

Kurdî di guhorîna grûpên dangan [şm] û [zm]-an bo [v] yan [w], li gor devokan, bêhempa ye. Tesaduf, ev diyar dike ku guhorîna [m] bo [v/w]-yê paştir çê bûye, çunkî ketina konsonanta yekê ya van grûpan gelek belav e, b.n.

çeşma farisî, ya ku bi kurdî *çav/w* e, di belocî, goranî [12] û vefsiyê de *çem* e, di gîlekiyê [13] de *çum* e û di ormurriyê [14] de *cimî* ye.

tuzma farisî, ku bi kurdî *tov/w* e, di belocî û goraniyê de *tom* e û di peştoyê de *toma* (di maneya “hevîr” de) ye.

şuzma farisî, ku bi kurdî şov, şow, şêf e, di belocî û goraniyê [15] de şom e û di vefsiyê de şûm e.

Hebûna [k]-ya destpêkê hember [x]-ya îranî, [kh]-ya sanskrîtî, bi dîtina serpe, wek sîmayeka xwerû kurdî xuya dike, b.n.

kurdî *ker* (guhdirêj) : farisî *xer*, avestayî *xere-*

kenîn : *xendîden*, îranî *Ö xend*

kanî : vefsî *xanya* avestayî *xen-*

Rast e ku formên weha di devokên rojhilatî jî de tên dîtin, b.n. [16]

belociya jêrî *ker*, paraçî *khör* “*ker* (guhdirêj)”

kendeg *khen-*, wexî *kand-* “*kenîn*”,

lê ev guhorîn di van devokan de li gel guhorîneka wek vê ya frikatîvên destpêkê yên dî, [f], [q], ya ku şopên wan di kurdiyê de nînin pêk tînin. Lêkera kurdî, *kirrîn* (farisî *xerîden*), ya ku bi temamî jî **xrî-* ya îranî, *krî-* ya sanskrîtî û **q̄rei* ya hindo-ewropî hatiye, hemî hîviyên ku kurdiyê bi awayekî **kh-* ya pêşîranî parastiye pûç dike. Ev xuya dike ku [k]-ya destpêkê di hemî nimûneyên kurdî de jî frikatîva îranî hatiye.

Parastina şêweyekê kevnar yê riha çyu- “ç-” (ji lêkera –çûn-ê) sîmayek e ku kurdiyê jî gişt cîranên wê yên nêzîk cida dike. Mirov dikare piştrast bibêje ku [ç] di qurmên ku jî vê rihê ava bûne de di hemî devokên kurdî de heye, lê ew di devokên îranî yên rojavayî yên dî de jî mêt e bûye [ş]. Şêweyê kevintir di devokên îranî yên rojhilatî de zindî ye wek ku formên li jêrê diyar dikin.

peştî *j-*, [17] wexî *ç’aw-*, [18] paraçî *çh-*, [19] ormurrî *caw-*, [20] osetî *caaw-*.

Bi kurtî, ez jî bilî vê [ç]-yê û guhorîna [şm] û [zm]-an hîç sîmayeka dî ku di nav hemî devokên kurdî de belav e û li derveyî wan nahêt dîtin nabînim. Diyar e jî bo veqetandina bêdudilî ya kurdiyê jî devokên dî yên îranî, pêwîst e ku ew hema hîç nebe li gel her devokeka îranî ya rojavayî bihê hember kirin û sîmayên wan yên wekhev û jêkcida bihên rêz kirin. Divê, ji bona hoyên pratîkî, kurdî, ya ku jî

aliyê îranînasan ve bi giştî bi “kurdî” hatiye nav kirin, li gel cîranên wê yên kevin û nû yên herî nêzîk bihêt hember kirin.

Ev cidakirina dawiyê hat kirin da amaje bi wê nivîsara Tedescoyî bêt kirin ya ku wî tê de [21] diyar kiriye ku belocî, herçend ku îro serekî li xilasiya başûr- rojhilatê de vera îranî têt peyvîn, di esl de zimanekê îranî yê bakur-rojavayî bû û cîraneka nêzîk ya kurdiyê bû. Tedescoyî gelek sîmayên hevbeş di nava wan de rêz kirine. Lê, yek sîmaya serekî ku têra veqetandina belociyê ji hemî zimanên dî yên îranî yên rojavayî û kurdiyê dike parastina temam ya konsonantên navvokalî di belociyê de hemberî dereceyên cida yên guhorînê li cihên dî ye. Hember bike!

-p- belociya jêrî *ap* :kurdî *av/aw* :goranî *awî*

-t- *dîte* : *dî* : *dî*

-ç- *roç* : *roj* : *ro*

-k- *zemîk* “deramet” : *zev/wî*

-d- *wad* : *xwê*

-c- *drêc* : *dirêj*

-g- *rogen* : *ron* : *rûen*

Devokên lorî, û ji wan bextiyarî [22], di warê zimannasiyê de îro cîranên kurdiyê yên herî nêzîk in ji aliyê başûrî ve. Ev zêde wek farisiya nû ne û lewre divê bi hev re bihên mamele kirin. Ew bi hejmareka guhorînên dengsazî, ku farisîbûna wan baş têt zanîn, ji kurdî, belocî û devokên dî yên îranî yên bakurî têt cida kirin. Mirov dikare [d]-ya farisî hember [z]-ya îranî dane, b.n.

farisî *danisten* : kurdî *zanîn* bextiyarî *danisten* belocî *zaneg*

damad : *zav/wa* *dûma, dowa* goranî *zema*

Paşî [h]-ya farisî heye ya ku ji [q] (yan [s]) û [d]-ên kevin hatiye û li hember wê di kurdî û yên dî dibe [s] yan [z] ye; b.n.

farisî, bextiyarî *ahen* : kurdî, belocî *asin*

farisî *ahû*, bextiyarî *ahî* : kurdî, belocî *as(i)k*

farisî, bextiyarî *mahî* : kurdî *masî*, goranî *mas[awî*

farisî *xwah-*, bextiyarî *xo-* : kurdî *xwaz-*, goranî *waz-*

Li dawiyê, [z]-yê farisî ji [c]-ya kevin, ya ku di belociyê de hatiye parastin û di kurdiyê de bûye [j], hatiye; b.n.

farisî *zen*, bextiyarî *zêne* : kurdî *jin*, belocî *cen*

farisî *zîsten* : kurdî *jîn*

farisî *zih* : kurdî *jê*, belocî *cig*

Cîranên kurdiyê yên dawîn yên ku divêt bihên behs kirin devokên herî nêzî wê ne. Bi rastî, gotina “cîran” ne gotina herî di cih de ye çunkî devokên goranî yên ku em dê behsa wan bikin niho kin bûne û bûne giravên axiftinê yên biçûk di nav deryayeka kurdiyê de. Di cihên ku goranî tê de taybetmendiyan bakurî nîşan dide, kurdî piranî caran bi devokên farisî re ye. Yek ji van haletan, guhorîna [y]-ya destpêkê bo [c]-yê di farisî, kurdî, û belociyê de ye ya ku di goraniyê de hatiye parastin nimûneyek e ji wan haletan; b.n.

goranî *yeve* : farisî *ceu* : kurdî *co* < avestayî *yeve-*

yeker : farisî *ciger* : kurdî *cerg* < avestayî *yaker-*

Dibe ku ev herdu peyvên kurdî ji farisiyê hatibin deyn kirin, lê ev yek ji bo peyva kurdî *car-ê*, ya ku dikeve hember *car*-a farisiya navîn û *yavena* ya parsî, qet derbaz nabe. [\[23\]](#)

Goranî di guhorîna [hw]-ya destpêkê ya eslî bo [w]-yê de wek belociyê ye, lê encam di kurdî û farisiyê de [xw] ye; b.n.

goranî, belocî *wan-* : farisî *x^wan-*, kurdî *xwên-* < *Öhwan*

goranî, belocî *wer-* : farisî *x^wur-*, kurdî *xo-* < Ö*hwer*

goranî *wê*, belocî *wet-* : farisî *x^wud-*, kurdî *xo-* < Ö avestayî *x^weto*

Di vê navê de, hêja ye bêt gotin ku di vî halî de kurdî taybetmendiyeke, ew jî guhorîna [hw] bo [f]-yê ye [24], ya ku ji bo medyê têt hesab kirin nîşan nade.

Ev hevalbendiya netemam ya kurdî li gel herdu terefan hizrekê li ser wargehê eslî yê devokên kurdî – yan jî yê eslê wan yê hevbeş – li gel devokên îranî yên rojavayî yên dî peyda dike, lê ev babet pêdvî lêkonlînên zêdetir e. Tedescoyî [25] behsa wan kiriye tevî ku ew mijûlî devokên bakur-rojavayî yên tekstên tofanî, anku parsiya manî, bû û wî ew wek devokeka yekgirtî lê ji parçeyên hev girtî diyar kiribû [26]. Niho mimkin e mirov dîtînen Tedescoyî piçek serast bike bêyî ku encamên wî bihên guhortin. Wî cedwelek ji bo Hauptbeispielea xwe [nûnerên serekî] ku pîvanên wî bûn ji bo grûpkirina devokan çê kiribû. Min ew cedwel kiriye diyagram. Bêguman, aliyê wê yê rastê, bi taybetî yê girêdayî navên “Caspian” (xezerî) û “Central” (navendî), gelek hatiye hêsan kirin; lê, bi dîtina min, aliyê çepê, ku kurdî tê de ciyê xwe di navbera proto-belocî û farisîyê de dike, rewşê qenc dinimîne.

Xêzên cidaker yên eleqedar ev in:

(1) ya ku devokên ku qurmê dema niho ya bi dengê difinî ji lêkera “kirin”-ê, *kun-* hwd. parastîye ji devokên ku qurmê ji riha *ker-* heye cida dike,

(2) ya ku devokên xwedî formên partisîp yên ku ji **a-gete* ne ji wan yên ku ji **a-gmete* yê çê bûne cida dike, (Heger em bikarin ji navê paytextê mediyan biryar bidin, kurdî li vê derê jî ji medyê vediqete. Eynî ev *-gmete* di navê paytextê mediyan de bi yûnanî *Agbatana* (açbetana) û *Ekbatana* (ekbatana) û bi farisîya kevin *He(n)gmetane-* ê de heye, bes di kurdîyê de nahêt dîtînen.)

(3) ya ku devokên xwedî terkîba îzafeyê, ya ku ji cînavê girêkî yê kevin çê bûye, ji devokên bêyî terkîba îzafeyê cida dike; û li dawiyê

(4) ya ku devokên ku [dw]-ya eslî ya destpêkê kiriye [d] ji wan yên ku ew deng kiriye [b] cida dike û devokên ku [y]-ya kevnar kiriye [c-] ji wan yên ku ew deng parastîye cida dike. Bi tenê peyvek heye ku van dengguhortinan diyar dike, ew jî *şîr* yan *şift* e.

Bi awayekê siruştî, diyagrama han bi tenê îmkanekê nîşan dide û wê hîç giringiya cografîk nîne. Tertîbkirina devokên behskirî bi her awayekê dî, li gel parastina heman xêzan, dê rewşê aloztir bike.

Kêm ji wan sîmayên mayî yên ku Tedescoyî behsa wan kiriye alîkariya me dikin ku em cihên kurdî, belocî û farisîyê diyar bikin. Bo nimûne, guhorîna [w]-ya destpêkê bo [b]-yê, ya ku di farisî û hindek devokên kurdî de rû daye, guhorîneka nû ye çunkî ew bi taybetî di wan devokên kurdî yên jêrî de yên ku gelek nêzîkî farisîyê ne xuya nabe. Profesor K. Barr [27] bi hizra min rast dibêje ku ev cidahî di devokên kurdî de vedigere tesîra goraniyê li ser devokên jêrî. Ev [w] di piraniya devokên dî yên îranî yên rojavayî de hindik hatiye guhortin, lê ew di belociyê de bûye [g(w)]; b.n.

farisî, bextiyarî *bad* : goranî, kurdiya jêrî *wa* : belocî *gwat*

kurdiya jorî/navendî *ba* semnanî [28], zehrayî [29] *va*

farisî, kurdiya jorî/ *baran* : goranî, kurdiya jêrî *waran* : belocî *gwarîş*

navendî zehrayî *varan*

semnanî *variş*

kurdiya jorî/navendî *bîr* : goranî, kurdiya jêrî *wîr* : belocî *gîr*

(farisî), bextiyarî *bêz-* : goranî *wêç-* : belocî *gêç-*

kurdiya jorî/navendî *bêj-* kurdiya jêrî **wîj-*

Dîsan xuya dibe ku kurdî û farisî di guhorîna [qr]-ya îranî ya kevin bo [s]-yê de wekhev in. Tedescoyî bi tenê yek nimûne [30], ku hejmarê “3” yê ye, bi kurdî *sê*, bi dudiliyeka qebûlbar *dabû*. Lê mirov dikare peyveka *dî jî*, ya ku bi îhtîmaleka mezin ne deynkirî ye ji ber ku nasa *wê* ya şopbar ya herî nêzîk bi tenê di devoka başkerdî ya Makranê de heye, lê zêde bike. Ew peyva kurdî *pê-xwas*, yan -*xawus*, e ku di başkerdiyê de *pa-xwewes* e. Li milê *dî*, peyva *pa-wirwa* di goraniyê de heye û mirov di zehrayiyê de *pa-xarowa* û *-xaropa*-yan dibîne. Ev hemî form, wek ku Dr. I. Gershevitchî, yê ku peyva başkerdî *dîtibû*, bi camêrî ji min re diyar kirî, vedigerin peyva avestayî *x^wa.aoqra-* ku wateya *wê* “*kewşa xwe li pê xwe kirin*” e. Vêca,

avestayî *x^wa.aoqra-* > **xwause-* > *xwas* [di kurdiyê de]

> **(x)wau(h)re-* > **wawir* > *wirwa* [di goraniyê de]

(hb. goranî *yerê* “3” < **hrê* < **qreyeh-*,

û dengguhorkanê di kurdiya navendî de

birrwa < *bawir*)

> **x(w)au(h)re-* > **xaru-* (+*pa*) [di zehrayiyê de]

(hb. zehrayî *xos-* “*xew*” < *x^wefse-*)

Ji bîr neke ku [s]-ya ku ji [qr]-yê çê bûye di belociyê de jî heye; b.n.

puseg “*kur*” < **puqre-ke-*, *as* “*agir*” < **aqr-*

Bi kurtî, em dikarin sîmayeka *dî* li xêza cidaker ya çarê zêde bikin.

Encamên guhorîna [rd] û [rz] di devokên nefarisî yê cida de yekcar nezela in çunkî peyv ji hemî aliyên ve hatine deyn kirin. Şik tê de nîne ku guhorîna [rd] bo [l] yan [r] di gelek devokan de rû daye; b.n.

semnanî *vel(e)*, goranî *wilî* “gul” > **werde-*

goranî (kendulayî) *zil* “dil” > **zrd-*

Lê pêşpirtika lêkerê *hur* jî, ya ji *iridue*-ya avestayî hatiye û hember *ul*-a farisiya navîn e, di goraniyê de heye. Hembera wê di kurdiya jorî de *hil* û di ya navendî de *hel* e û bi eynî wê fonema [l]-yê e ya ku em di lêkerapalawtin, *palêw-* de dibînin. Heger em wê ji vê formê **pere-daveye-*, ya ku *palay-* ya farisî jî dide [31], darêjin, em dê bibînin ku formeka me ya xwerû kurdî bi [w] li şûna [y]-yê, wek parsiyê [32], heye. Lêkerekê kurdiya jorî bi heman wateyê heye, ew jî *parzinîn* e ya ku di goraniyê wek *çay-parzên* “sefînka çayê” têt dîtin û paşî wek *perzel* “filter, sefandin” ketiye di nav zimanê ermenî de. Bêşik, herdu lêker dikarin di kurdiyê de bijîn, lê parastina [rz]-yê tiştêkê balkêş e. Tedescoyî [33] diyar kiriye ku ev grûp di hindêk devokan de bûye [l] bêyî ku di qonaxa [rd]-yê de derbaz bibe. Herçend ev dîtin bo cara yekê biguman têt ber çavan, lê dibe ku ev rewşa kurdiyê be, çunkî di dema ku [z] di peyvên wek *zanîn* û *zava* de [34] hatiye parastin, hejmareka pirtir ji peyvên bi [l]-yê (kurdiya jorî) yan [ll]-yê (kurdiya jêrî) ku hemberî [rz]-ya kevnar lê ne parastina wê grûpê ne di kurdiyê de heye. B.n.,

kurdî *bil/lind* [35] : avestayî *birizent-*

hêştin, hêl/l- : Öhrz

mil : *mirizu-*

mal/lîn [36], *mal/l-* : Ömrz

kurdiya navendî *spil* : *spirizen-*

kurdiya jorî *balgê, balîf* : *beriziş-*, farisî *balîş*

gilî : Ögrz, farisî *gile*

lê,

kurdî *berz* < avestayî *beriz-*

herzin < **h(e)rzene-*, farisî *erzen*

û belkî

kurdiya jorî *gazin(de)* < Ögrz

Goraniyê bi tenê *berz* di maneya “bilind” de heye, lê wê (kendulayiyê) herweha *bala* “jor” jî heye. Wê *mil ûmal-* “malîn” wek kurdiyê hene, lê herweha *mazî* “stûna piştê” jî ku ji **merz-* hatiye heye. Ez bawer nakim mimkin be ku mirov piştrast bibêje ka bi rastî kîjan guhorîn ya kurdiyê ye, lê mişeyiya peyvên bi [l] yan [ll]-yê, çi resen bin çi deynkirî bin, giring e.

Wisa diyar e ku belociyê [rd] û [rz] jî parastine, lê delîl kêman in. Yek gotina şîrî, *zirdê* di wateya “dil” de, ku tê de [rd] peyda dibe heye. [rz] di peyva *berz* “bilind” û herweha *berzî* “barzîn” [37] de têt dîtîn. Ji van peyvan û ji peyvên *dil* “dil”, *gul* “gul” û *palay-* “sefîn-” ku ji farisiyê hatine deyn kirin derkeve, bi tenê peyvên aloz *balad* “bilindî”, ku ji **berzad-* ya îranî ye, û lêkera *ileg, işte* “hiştin”, ku ji Öhrz hatiye, têt dîtîn. Cidahiya di navbera kurdî û belociyê de di vî warî de têt wê maneyê ku proto-kurdiyê têkiliyên nêzîktir li gel farisiya li başûrî hebûn.

Em ji Tedescoyî dûr dikevin û dibêjin ku eynî boçûna li jorê ji bo hejmareka peyvên ku di esil de xwedî [nd] ne derbaz dibe. Me berê jî peyva *kenîn* < Ö *xend* dîtibû û em dikarin *genîn* “genî bûn” < Ö *gend* ya kurdiya navendî, *benî* [38] < Ö *bendeke-* ya kurdiya jorî û belkî *hinartin, hinêr-* a kurdiya jorî, ku di kurdiya navendî de (*he*)*nardin, nêr-* e û ez li hember ya farisiya manî ya navîn *hen(n)ar-* di maneya “çav zil kirin” ê de < *han + Öder* [39] dadinim, lê zêde bikin. Weha, kurdî, wek farisiya manî ya navîn, [nd] kurt dîke û dîke [n] .

Wekheviya dawiyê di navbera kurdî û farisiyê de di parastina [fr]-ya detpêkê de ye ya ku di gelek devokên îranî yên bakur-rojavayî de bûye [hr] û dengên wek wan û di belociyê de bûye [ş]; b.n.

farisî *furûş-* : goranî *wureş-* : belocî *şeweşk-* < **fre-vexş-*

kurdî *firoş-* vefsî *rûş-*

kurdî *firman* : goranî *hermane* “kar” (hb. kurdî *ferman*)

Li ber rohniya nêzîkbûna kurdîyê ber bi farisîyê ve, bi min giring e ku qet ne be mirov gotinên profesor Minorskyî binirxîne dema ew dibêje ku “kurdî, bi naveroka xwe, ... bê şik zimanek e ji grûpa bakur-rojavayî ya zimanên îrani” [40] û herweha tekeza wî ku “divê kurdî li ser bingehê mediyê bihêt zelal kirin”. [41]

* * *

Mijara me heta niho serekî li ser dengsaziya kurdîyê, wek zimanekê yekgirtî, bû. Ev yekgirtin di warê peyvsaziya de ne mimkin e. Min newekheviyên di navbera devokên kurdiya jorî û navendî yên cida de li cihên dî şirove kirine. [42] Zanyariyên me di heqê devokên kurdiya jêrî de hêj ne tamam in, lê ew zanyarî dikarin nîşan bidin ku ew devok bi qeder cidahiya wan ji kurdiya jorî ji hev cida ne. Lewra, ez dê di lêkolîna li pey egerên jêkcidabûna devokên kurdî de xwe piraniya caran bispêrim devokên jorî û yên navendî.

Devoka jorî xuya dike ku ew bi çend awayan ji ya dî kevintir e. Ew di warê dengsaziya de tenê bi parastina fonemên [v] û [w]-yan, ku hember [w]-ya devokên dî ne, kevnatiya xwe nîşan dide. Bo nimûne,

kurdiya jorî *civîn* : kurdiya navendî *cinêw, cön* < *duşnam*

nivistin : *nûstin* < *ni + Ö ped*

şev : *şew* < *xşep-*

lê,

kurdiya jorî *bawer(î)* : kurdiya navendî *bawir, birrwa* < *waver*

kurdiya jorî û navendî *mewîj, mêwîj* < **medwîçe-*

Di heman wextî de, kurdiya jorî di wergirtina fonemên biyanî de, ji wan dengên qelew [s], [t] û [z] [43] yên zimanên samî, dengên nehewadar [p], [t], [k] (yên ermenî !) û herweha [ç]-yeka dakişandî yên ku di zarên dî de peyda nabin, ji devokên dî merdtir bûye.

Li milê dî, kurdiya jorî di warê peyvsaziyê de xwe gelek li ber guhortinan ragirtiye, lê herweha hinek terkîbên xweyî, ku mirov texmîn dike alternatîvên wan yên eslî hene, avêtine. Bo nimûne, wê li dema ku sîstemeka temam ya tewanga navdar û cînavan parastiye, dev bi yekcarî ji paşpirtikên cînavî berdaye. Di devokên dî de, tewang têk çûye, lê paşpirtikên cînavî hêj gelek karan ji karên xwe dikin. Binêre,

kurdiya jorî *wê jinê nan pat* : kurdiya navendî *ew jine nan-î kird*

nanî bide min : *nan-im biderê*

Dîsa, demên borî yên lêkerên têper di kurdiya jorî de ramana xwe ya pasîviyê di sadetirîn formê de diparêzin; b.n.

kurdiya jorî *ez derman kirim*

Terkîba han kêman jî wê ya ku di farisiya kevin de têt dîtin dûr dikeve

ime tye mene krtem

1. kurdiya jorî *eve-ye yê min kir*

(Devokên navendî çî qas jî vê formê dûr ketine dê li jêrê bihêt dîtin).

Hîç forma lêkerî ya dî jî bo derbirîna pasîviyê di demên niho de di kurdiya jorî de, wek ya ku di devokên dî yên kurdî de peyda bûne, diyar nebûye. Terkîbeka sade li şûna wê têt bi kar anîn; b.n.

kurdiya jorî *dê hête kuştin*

Heger em bala xwe bidin kurdiya navendî, em dê hejmareka guhortinên peyvsazî bibînin. Hinek jî wan teqrîben nû çê bûne. Yek jî wan, berfirehkirina terkîba “boriya têper” bi zêdekirina paşpirtika kesî, ku wezîfeya objektê nedîrek dike, bi ser lêkerê ve ye, b.n.

kurdiya navendî *xew-im dîw-e* “min xewnek dîtiye”

lê *xew-im pêwe dîw-ît* “min xewnek bi te ve dîtiye”

Heman guhorîn di devoka hewramî ya goraniyê de, ya ku min qeyd kiriye, têt dîtin.

hewramî *kitêbeke-m da-nî pene* “min pirtûk daye te”

lê ji ber ku hîç nimûne di materyalê hewramî yê Benedictsênî [44] de nahên dîtin, ev sîma nabe sîmayeka hevbeş ne di devokên hewramî ne jî di goraniyê de. Divêt mirov ji bo ravekirina gelek sîmanyên dî yên kurdiya navendî ji goraniyê pê ve dûrtir neçe.

Li pêşiyê, veqetandeka binavkirinê *-eke* di hewramî, devokên dî yên goranî yên serekî û herweha di zazakiyê [45] de jî heye. Bikaranîna vê paşpirtikê bi tenê di devokên kurdî yên navendî û jêrî de heye. Di kurdiya jorî de, rêya binavkirina navdêrê bi tenê bi bikaranîna rengdêrên îşarkî têt kirin. Zanyariyên li ser veqetandeka dî, *-a* yê, ya ku di hejmareka berbiçav ya devokên îranî yên rojavayî de belav e ne gelek balkêş in. Ya balkêştir ew e ku ev veqetandek bi yekcarî di kurdiya jorî de nîne.

Me berê jî dît [46] ku terkîba îzafeyê hem di kurdî û devokên ku me jê re “devokên îranî yên navendî”, ji wan goranî, gotiye de û hem di farisiyê de heye. Wekhevî ji wê derê pê ve xelas dibe. Awayekê îzafeyê yê devokên kurdiya jorî yên kevin heye ku heta niho maye û wek cînavê girêkî têt bi kar anîn. Îzafê, wek hemî cînavên dî di van devokan de, zayenda xwe ji navdêra pêşî xwe werdigire; b.n.

kurdiya jorî *bab-ê min*

dî-a min/dayk-a min

ew kes-ê ewwilî bêt

ew mesela ku ez bo hatîm (mesele-a)

Nîşanên pêşiyê yên têtçûna vê sîstemê di wan devokên navendî de yên ku zayend têt de parastî ye têt dîtin.[47] Di van devokan de, formên nêr *-î* û mê *-ê* hatine guhartin. Ev formên nû eynî morfemên tewangê ne. Ne dût e ku ew ji wê raweyê hatibin. Di hemî devokên kurdî yên mayî de şêweyekê sade û giştî, ku *-î* ye, ji bo îzafeyê heye.

Dîsa em du formên îzafeyê ku ne li gorî zayendê lê li gorî wezîfeyên wan ji hev tîna cida kirin di goraniyê de – di devoka hewramî de – dibînin. Ev herdu form, ku ez ji yekê re dibêjim îzafeya rengdêrî –î û ji ya dî re îzafeya genetîv –û, ji bo herdu zayendan tîna bi kar anîn; b.n.

hewramî *kurr-êw-î cwan* “kurekê xort”

kurr-û min “kurê min”

kinaçêwe-y cwane “keçeka xort”

kinaçêwe-w xanî “keçeka Xanî”

Bi bawerîya min, kurtebûna îzafeya kurdiya navendî û ya jêrî bo –î-yê mimkin e ji ber tevlihevbûna herdu sîsteman be. Helbet, mirov dikare hizra tesîra farisîyê jî bike, lê divê tesîreka wesa li ser zimanê nivîskî ne yê devkî be. Hîç tesîreka wê li ser peyvsaziya kurdiyê nahêt dîtin.

Îzafe ne rêya bi tenê ye ji bo girêdana navdêran bi wesîfkarên wan ve. Hemî devokên goranî, li gel kurdiya navendî û ya jêrî, xwedî terkîbekê ne ku ez navê “hevduvaniya vekirî” lê dikim. Ev terkîb hîngê tîna bi kar anîn gava frasa navdêrî binavkirî be û nîşana wê jî vokaleka pevgirêdanê ye; b.n.

hewramî *kurr-e cwan-êke* “kurê xort”

a kurr-e cwan-e “ew kurê xort”

kinaçe cwan-ekê “keça xort (kinaçê)”

î kinaçe cwanê “ev keça xort”

Hember bike

kurdiya navendî *kurr-e cwan-êke* “kurê ciwan”

ew kurr-e cwan-e “ew kurê ciwan”

kiç-e cwan-êke “keça ciwan”

em kiç-e cwan-e “ev keça ciwan”

Hîç şopên vê “hevdudaniya vekirî” di kurdiya jorî de nînin.

Kurdiya navendî di warê paşpirtikên cînavî yên kesîn de ji goraniyê cida ye, lê ne bi qasî cidabûna wê ji kurdiya jorî. Ev paşpirtik heman rola giring di hevoksaziya goranî û kurdiya navendî de dilîzin. Cidahiya serekî di navbera herduyan de formên wan in. Goraniyê ji bo kesê sêyê eynî formên farisîyê, *-ş, -ş(a)(n)*, hene, lê kurdiyê *-î* û *-yan* hene. Ji bo kesên dî, form di herdu grûpan de wekhev in; anku, kesê yekê *-m, -ma(n)*, kesê duyê *-t, ta(n)*. Di devokên kurdiya navendî yên xweparêz de, formên eslî yên kurdî yên paşpirtikên kesê yekê û kesê duyê yên pirhejmar, *-in* û *-û* (hb. avestayî *-no, -wo*), hatine parastin. [48] Ev rewş divêt li gel rewşa kurdiya jorî, ku tê de paşpirtikên cînavî yên ji vî rengî wenda bûne, bihêt hember kirin. Kurdiya jorî û zazakî di vê guhorînê de şîrîk in. Forma kesê sêyê *-î* (hb. avestayî *-hê*) di belociyê de jî xuya dibe û mirov dikare ji şopên ku di daçekên xweser yên kurdiya jorî û ya navendî de mane [49] texmîn bike ku ev form berê di hemî devokên kurdî de hebûn. Mirov dikare bigehe vê encamê ku parastina paşpirtikên cînavî di kurdiya navendî de ji ber tesîra dîrek ya goraniyê ye. Hêza goraniyê di asîmîlebûn û guhorîna formên kurdî de jî diyar dibe.

Berî niho behsa forma pasîva neserekî ya lêkerên kurdiya navendî û jêrî hat kirin. Ew di kurdiya jêrî de, wek qaîde, bi alîkariya morfemên *-yê* ji bo dema niho û *-ya* ji bo dema borî pêk têt. Ev awayê “pasîva y-”-yê di goranî û zazakiyê de jî heye û dibe ku forma kurdiya jêrî dîrek ji goraniyê hatibe deyn kirin. Lê ev qet ji bo kurdiya navendî nahêt gotin çunkî herçend ew awa bi karê xwe wek wê ye lê bi forma xwe ji wê cida ye. Morfemên pasîviyê di kurdiya navendî de *-rê* ji bo dema niho û *-ra* ji bo dema borî ne. Tifaq li ser vê yekê heye ku ew li ber formên kevnar yên lêkera “kirin”-ê hatine çê kirin; weha,

Têper Pasîv

ke- (< *ker-*) : *kirê-* (< *krye-* + *-îh-*) : : *X-* : *X-rê-*

ku *X-* qurmê lêkera têper ya dema niho ye. Heger îdîaya ku forma pasîva neserekî ya han di kurdiya berê de nebû qebûlbar be, peydabûna wê di kurdiya navendî de dikare ji goraniyê be.

Nimûneyeka dî ya biçûk ji tesîra goraniyê di lêkguhartina pêşpirtika lêkerî ya kurdiya jorî, *ve-yê* (bn. *farisîbez, ve*) bi “paşpirtika lêkerî” –*ewe-yê* di kurdiya navendî de têt dîtin. b.n.

kurdiya jorî *ve kir* : kurdiya navendî *kird-ewe, goranî kerd-ewe*

ve girt : *girt-ewe*

ve şart : *şard-ewe şara-we*

Goraniyê ne bi tenê eynî paşpirtika –*ewe-yê* di vî wezîfeyî de heye, lê wê du paşpirtikên “paşlêkerî” yê di jî hene.

kurdiya jorî *rû nişt* : kurdiya navendî *da nişt* : goranî *nîşt-ere*

kurdiya jorî û navendî *da xist* : *wist-ere*

ku di kurdiyê de nînin.

Bona ku terazû biedile, sîmayeka kurdiya jorî heye ku ji devokên kurdî yê di pirtir nêzî hewramiyê ye. Di devokên dî de, morfema pirhejmariyê ya gelemperî, wek farisiya kevin, –*an* e; lê kurdiya jorî û hewramiyê sîstemeka durawe di pirhejmarî û herweha di yekhejmariyê de parastiyê. Vêca, –*a(n)* di kurdiya jorî de bi taybetî morfema tewangê ya pirhejmariyê ye, lê pirhejmara xweser bê pirtik e; b.n.

kurdiya jorî *mişk der keftin*

ez dê va mişka der êxim

Du morfemên pirhejmariyê di hewramiyê de hene: –*ê* xweser û –*a* tewang; b.n.

hewramî *a kitêbê* “ew (gelek) pirtûk”

a kitêba bare “wan pirtûkan bîne”

Diyar e ku guhorîn di van herdu devokan de hemdem lê serbixwe bûye. Devokên dî yên goranî, yên ku O. Mannî qeyd kirine, eynî prosesa giştîkirina morfema pirhejmariyê –a, wek kurdiya navendî, derbaz kiriye; b.n.

kendulayî [50] *dizekan ramay* “diz revîn”

kerekan-iş besyanawe “kerên wî hatin girê dan”

gelwerayî [51] *a tûtane kuşîsin* “ew kûçik kuştî bûn”

Di hinek devokên kurdiya jêrî û devokên goraniyê de, vê prosesa nûjen ya peydabûna morfemeka giştî ji bo pirhejmariyê pêngavek pêştir avêtiye. Di wan devokan de, morfema “kolektîv” –gel yan jî jêderên wê li şûna–an-ê têt bi kar anîn.

Bi kurtî, çar diyarde hene, derveyî nûtirîn guhortinan jî, ku diyar e kurdiya navendî û ya jêrî ew ji goraniyê deyn kirine.

- paşpirtika binavkirinê –eke
- “hevdudaniya vekirî” li şûna îzafeyê
- forma pasîviya neserekî ya lêkeran
- paşlêkera –ewe

Du diyardeyên dî jî ku wan ji kurdiya jorî cida dike vedigerin tesîra goraniyê. Ew jî

- sivikkirina sîstema îzafeyê, û
- parastina paşpirtikên cînavî yên kesîn

Heger em bala xwe bidin belavbûna niho ya kurdiya navendî û jêrî û li gel giravên goraniyê yên mayî hember bikin, ez bawer dikim ku encama mirov nikare jê bireve ew e ku substratumeka (zemîneka) goranî di van devokên kurdî de heye, lê devokên kurdî yên jorî reseniya xwe heta radeyeka mezin parastiyê.

Berî niho tezekkirina wê rastiye ku elementên, bi awayekê serekî, îraniya başûr-rojavayî di kurdiyê de hene ji min re zehemet bû. Bervajî wê, sîmayên bakur-rojavayî di goranî û zazakiyê de baş berçav

in. Nêrîneka serpê jî li rewşa îro ya herdu grûpan diyar dike ku ew grûp di qonaxên cîguhoriyê yê berbiçav re derbaz bûne. Ne zehmet e ku mirov van encamên zimannasî, heger mirov bikare wan wesa bi nav bike, wegerîne ser termên cografîk û dîrokî. Xweragirtina gelê zaza, yê ku wek têt zanîn di esil de ji Deylemê li ser qeraxê başûr yê Xezerê hatiye, di yekîneyeka biçûk û veder de faktoreka giring e ku mirov bala xwe bideyê. Bêyî delîlên dîrokî yê zêdetir, ne beraqil e ku mirov biryarê bide ka ew ji ber pêlên kurdan ji ciyê wan ber bi rojavayî ve hatine guhastin yan jî wan xwe di nava devereka saxlem ya li bin desthilata kurdan de xistiye. Kêm zêde, ravekirina pêşiyê dikare mimkintir be.

Vêca, texmîneka giştî dê hosa be. Li pêşiyê, piraniya kurdan ber bi bakurî ve bo nav Ermenistanê çûne, û bi ihtimal zaza derxistine. Paşî, goranan Zagrosê başûr û derdorên wî dagîr kirine û li dawiyê, di demên paştir de, pêleka di ya kurdan ji bakurî hatiye û xwe bi ser goranan de girtiye û hêdî hêdî ew tev, ji bilî yê ku mane, di nav xwe de helandine. Dijwarî di tarîxkirina van bûyerên texmînî de derdikeve. Lê, pêwîst e mirov ji bo çareserkirina vê pirsgirêkê li delîlên ne bi zimanî ve girêdayî bigere.

Wergêr:

Newzad Hirorî

nhirori@hotmail.com

Stockholm

* Sernivîsa orijînal ya vê nivîsarê “The origins of Kurdish” e. Ew di sala 1961-ê de di *Transactions of the Philological Society* de belav bûye. [Wergêr]

Kurtkirinên ku di wergera vê nivîsarê de hatine bi kar anîn: *b.n.* “bo nimûne”, *bnr.* “binêre”, *hb.* “hember bike”, *hs.* “heman serkanî (çavkanî)”, *n.* “not”, *rûp.* “rûpel”. [Wergêr]

Wergêr spasiya Arif Zêrevanî ji bo rastkirin û têbîniyên wî li ser reşnivîsa vê wergerê dike.

[1] “Les origines des Kurdes”, *Actes du XX* Congrès International des Orientalistes*, Louvain, 1940, 143

- [2] *Les Kurdes, étude sociologique et historique*, Paris, 1956, 2-16.
- [3] Bnr. bo nimûne, li G. R. Driver, "The Name Kurd and its Philological connexions", *JRAS*, 1923, 393, û berhemê vê dawiyê I. M. Oranskij, *Vredanie v iranskuju filologiju*, Moskva, 1960, 316.
- [4] Bnr. A. Goetze, *Kleinarien*, Munich, 1957, 191, n. 6.
- [5] Bnr. Driver, "The Name Kurd", 397.
- [6] *Bibliotheca geographorum Arabicorum*, Tome, VII, 128.
- [7] Veguhastina Nikitineyî ye, *Kurdes*, 4.
- [8] Hemî nimûneyên kurdîyê ji notên min in.
- [9] *Monde Orientale*, XV, 208.
- [10] Devokek e ji rojhilatê Hemedanê; bnr. M. Mughaddam, "Gûyûşhayî vefs ve aştiyan ve tefrîş", *Îran Kûda*11, Tehran, 1949.
- [11] Nimûne ji W. Geiger, *Etymologie des Balūčī*, Munich, 1890.
- [12] Nimûneyên goranî bi piranî ji notên min in li ser devoka hewramanî (ya Hewramanî Lahon) ya ku gelek kevnar e. Nimûneyên dî ji materyalê O. Mannî ne, *Mundarten der Gûrân, ... bearbeitet von Karl Hadank*, Berlin, 1930.
- [13] A. Christensen, *Contributions á la dialectologie iranienne*, Copenhagen, 1930, 288.
- [14] G. Morgenstierne, *IIFL*, I, 390.
- [15] Bnr. nivîsara min "Bâjalânî", *BSOAS*, XVIII, 435.
- [16] *IIFL*, I, 37; II, 457.
- [17] Morgenstierne, *EVP*, 77; *AO*, I, 268.
- [18] *IIFL*, II, 519.
- [19] *IIFL*, I, 244.
- [20] hs., 391.

[21] "Dialektologie," 252-3.

[22] Nimûneyên bextiyarî ji D. R. Lorinser, *Phonology of the Bakhtiari ... Dialect ...*, London, 1922, 102-106 hatine wergitin..

[23] Tedesco, "Dialectogie," 193.

[24] E. Benveniste, "Persica II", *BSL*, 31, 73.

[25] "Dialectologie," 253-4.

[26] hs, 246.

[27] *Iranische Dialektaufzeichnungen, aus dem Nachlass von F.C. Andreas*, Berlin, 1939, 144.

[28] Christensen, *Contributions II*, Copenhagen, 179-87.

[29] Zehra devereke başûrê Qezwînê, nêzîkî Takistanê, ye. (v. Henning, *TPS*, 1954, 159). Devokên zehrayî yên du navendan, Bermowa (Îbrahîmabad) û Sezciwa (Segzabad) ji aliyê Celal Al Ehmedî ve di *Tat-nîpînha-yi bulûk-i Zehra*, Tehran, 1958 de hatine şirove kirin.

[30] "Dialektologie," 199, n. 1.

[31] W. B. Henning, "Das Verbum des Mittelperischen der Turfanfragmente", *ZII*, 9, 209.

[32] Tedesco, "Dialektologie," 197

[33] hs., 206.

[34] Bnr. rûp. 4 li jorê

[35] Kurdiya navendî herweha *bala* "bejin" jî heye lê bi tenê di *bejn-û-bala* û *bala-berz* "bejinbilind"-an de.

[36] Radera *maltin* yan *maştin* di hinek devokan de

[37] Morgenstiene, "Notes on Balochi Etymology", *NTS*, V, 41.

[38] Di frasa "ez benî"-yê de

[39] Henning, "Verbum," 193.

[40] "Origins des Kurdes," 145.

[41] hs., 152.

[42] *Kurdish Dialect Studies I*, London, Oriental Series, 1961.

[43] *h* û ' di kurdiya jorî û navendî de hene.

[44] *Les dialectes d'Awraman et de Pāwā, textes recueillis par ... B. revus et publiés...par arthur Christensen*, Copenhagen, 1921.

[45] Devokên vê grûpê li ciyê herî bakur-rojavayî yê de vera kurdiyê niho tên, û heta berî midetekê jî dihatin, bi kar anîn, lê ew gelek nêzîkî goraniyê ne; bn. berhemê O. Mannî *Mundarten der Zâzâ,...bearbeitet von Karl Hadank*, Berlîn, 1932.

[46] Di diyagrama rûp. 7-ê de li jorê

[47] Bi taybetî pişderî û mukrî, bnr. *K(urdish) D(ialect) S(tudies) I*, §§ 179.h, 183.a.

[48] Bnr. *KDS I*, § 197.a


[49] hs., §§ 237, 302.

[50] *Mundarten der Gûrân*, 311 û 322

[51] hs., 454

kitêba Maurizio Garzoni

Rêzimanê kurdî ji sala 1787



Kitêba qeşeyê îtalî **Maurizio Garzoni** *Grammatica e Vocabolario della Lingua Kurda* (Rêziman û ferhengoka zimanê kurdî) sala 1787ê li Romaya Îtalyayê hatiye çapkirin. Ew wek yekem berhema li ser zimanê kurdî ya bi

zimanekî ewropî tê nasîn. Bi qasî ku tê zanîn, ew heta niha jî tekane rêziman û ferhenga kurdî ye ku bi zimanê îtalî hatiye belavkirin.

Garzoni kitêba xwe bi pêşgotineke li ser zimanê kurdî dest pê dike. Dûv re ew dengnasiya kurdî dide nasîn, paşî jî hewl dide yek bi yek beşên rêzimana kurdî pêşkêş bike.

Lehceya kurdî, ya ku Garzoni di kitêba xwe de dide nasîn, kurmancî ye, hê jî deqîqtir kurmanciya wilayeta Mûsilê ya wê demê ye. Ji ber kêmasiyên mezin yên rêzimanî û rastnivîsînê, zehmet e ku mirov bigihe qenaeteke bêguman ka ew devokeke rojhilata Mûsilê (kurmanciya rojhilatî, bo nimûne dihokî) yan jî devokeke rojavaya Mûsilê (kurmanciya navendî, bo nimûne şingalî) neqil dike lê bo nimûne ji ber bikaranîna cînavê "hingo, ingo" (bi nivîsîna Garzoni "ungho") li cihê cînavê "hûn" wisa texmîn dikim ku ew bingehê kitêbê devokeke kurmanciya rojhilatî anku behdînî ye.

Garzoni peyv û hevokên kurdî li gor rastnivîsîna zimanê îtalî pêşkêş kirine. Ew di kitêba xwe de tabloyeke berhevdana alfabeya latînî û erebî dide lê di kitêba xwe de di pratîkê de bi xwe jî herdem li gor tabloya xwe nanivîse. Di tabloyê de hemû herfên di alfabeyên zimanê erebî û yê farisî de heyî hatine pêşkêşkirin tevî gelek ji wan di kurdî de wek dengên serbixwe peyda nabin (bo nimûne ث ظ غ ض ص ط غ).

Garzoni hewl daye ku bi kurdî behsa gelek aliyên rêzimanî yên kurdî pêşkêş bike. Lê hema ji her rûpela kitêbê diyar e ku ew bi xwe jî baş hînî rêzimana kurdî nebûye. Bo nimûne, ew dinivîse ku qaşo mirov bi kurdî dibêje "ez kî ye, tu kî ye, ew kî ye, em kî ye, ungo kî ye, wan kî ye" (bi nivîsîna Garzoni "az kiia, tu kiia, au kiia, am kiia, ungho kiia, vvan kiia", rûpel 24) lê di rastiyê de mirov bi kurmançî dibêje "ez kî me, tu kî yî, ew kî ye, em kî ne, hûn/hingo kî ne, ew kî ne."

Garzoni li ber modela erebî (û belkî herwiha modela tirkî jî) idia dike ku kopula (lêkera "bûn" ya statîv di dema niha de) di kurdî de nayê bikaranîn û loma li şûna ku bibêje "ez birîndar im, tu birîndar î, ew birîndar e, em/hûn/ew birîndar in", dinivîse "ez birîndar, tu birîndar, ew birîndar..." (r. 24) lê bikaranîneke wiha erebmancî yan tirkmancî ye.

Di nasandina dema borî ya sade de Garzoni idia dike ku mirov bi kurdî dibêje "ez bû, tu bû, ew bû, em bû, hingo bû, wan bû" lê li ber cînavên "ez" û "em" herwiha forma "bûm" jî dide: "ez bûm, em bûm" (r. 25) lê di rastiyê de mirov dibêje "ez bûm, tu bûyî, ew bû, em bûn (bi kurmançiya rojhilatî "em bûyn"), hûn bûn (hin deverên kurmançiya rojhilatî "hingo bûn"), ew bûn".

Ji şaşiyên rêzimanî diyar e ku ihtimalen Garzoni kurdiya xwe ne yekser ji kurdan lê belkî ji yek an çend fileyên Kurdistanê hîn bûbe yan jî ew wek çavkaniya xwe bi kar aniye/anîne. Fileyên devera Behdînan bi kurdî diaxivin lê bi hin kêmasiyan ku gelek ji wan bi heman awayî di kitêba Garzoni de jî berçav dibin. Ji ber ku Garzoni qeşe bû û li Kurdistanê têkiliyên wî bi fileyên Kurdistanê re xurt bûn, ev jî vê baweriya min bi texmîna bikaranîna fileyên Kurdistanê wek informantên (agahîderên) zimanê kurdî xurt dike.

Ji rêzimanê jî zêdetir pirsgirêk tevliheviya nivîsînê ye. Ji hin peyvan gelek zehmet e were zanîn ka mebesta Garzoni çi ye eger mirov li wergerên wan yên îtalî nenêre. Bo nimûne, ew dinivîse "ahhkraft" li şûna "axaft" û "scesc" li cihê "şeş" yan "aia" ji dêlva "heye".

Ji beşa rêzimanê çêtir biserketî pişka ferhengê ye. Ferhengok li gor rêzbendiya îtalî ye anku peyvên îtalî hatine rêzkirin û ew li kurdî hatine wergerandin.

Kovara Kanîzar û Malpera Zimannas bi serbilindî vê berhemê dixin ber destê vekolerên zimanê kurdî:

<https://zimannas.wordpress.com/2016/09/16/rezimanek-kurdi-ji-sala-1787/>

ÇEKUYÊ MA KOTÎ RA YENÊ?

nuştox: Husein Muhammed

açarnayox kurmancî ra: Mahîr Dogan

Çekuyê heme ziwanan çend çimeyanê cîyayan ra yê. Sey nimûne:

- Bi xo keyeyê nê ziwani ra (kurdî de proto-hindûewropakî, proto-hindûarkî û proto-îrankî ra)
- Ziwananê cîranan ra (sey nimûne, ziwananê Rojhelatê Mîyanênî de yewbînan ra girewtiş: erebkî, fariskî, kurdî, tirkî...)

- Çimeyanê mîyanneteweyîyan ra (sey nimûne, çekuyê sey “kamera, radyo, televîzyon” ke zafêrîya ziwananê dinya de seypê ya)
- Çekuyê ke felan ziwanî de bi xo çekuyanê estbîyayeyan ra ameyî viraştene (çekuyanê cayîyan ra, sey nimûne “dest-pê-kerdiş”, yan zî çekuyanê cayî û xerîban ra, mavajîme “fehm-kerdiş”, yan zî çekuyanê xerîban ra, mesela “talih-û-nesîb”)

Armancê nê cigêrayîşê kilmî yo ke dîyar bibo ka çekuyê kurdî (bitaybetîkurmanckî/kirdaskî) kamcîn çimeyan ra yê. Hedefê nê cigêrayîşî nawitişê çimeyanê çekuyanê kurdî yo, yanî gelo çekuyê ke kurdî de estê, kotî ra ameyê. Meremê nê cigêrayîşî yo serek nîyo ke eşkera bikero ka çekuyê kurdî şîyê kamcîn ziwanan. Na zî erja yewna cigêrayîşî ya, la tîya de mewzûyê ma nîyo.

Her ziwan de cumleyî estê ke çekuyanê “cayîyan” ra yenê pêra û ke tena nê ziwanî yan zî nê ziwan û ziwananê xisiman de estê ke sey mîras maya nê ziwanan ra mendî. La zafêrîya çekuyanê sadeyan yê heme ziwanan eslê xo de xerîb a: nê ziwananê bînan ra ameyî girewtene.

Sebebê ci no yo ke çekuyî pê çîyan yenê viraştene. Demo ke kesêk televîzyono yewinviraştî, çekuya “televîzyon”î zî viraştî. O ra dime êdî hewce nêbîyo ke her milletêk yewna nameyî seba nê çîyî virazo. No tena seba çîyanê viraşteyan ney, la heta dereceyêk zî seba çîyanê tebîîyan beno. Sey nimûne, meymun Kurdîstan de heywanêko ke zaf vila bîyo, nîyo. Wexto ke mintiqaya bîne ra ame Kurdîstan (yan kesan no ardo), o taw çekuya “meymun”î zî ey reyde ameye. Yan zî wexto ke kurdî şîyî mintiqaya ke tede meymunî estbîyî, înan nameyê ci zî uca hesnayo û tey ardê Kurdîstan. Madem ke çekuya “meymun”î yewna ziwan de xora estbîya, kurdan qet lazimîya seba viraştişê nameyê bînî nêdîya.

Ge-gane meylê xebitnayoxanê “sadeyan” serê viraştişê çekuyanê neweyan de ver bi çekuyanê xerîban estbî. Madem ke çekuyêke esta, na eşkena bi asanî ravîyaro ziwanêko bîn zî û hewce nîyo merdim ke sereyê xo pê bidajno heta ke bi xo yewna çekuye virazo.

La semedê tayê sebananê sîyasî û komelkîyan ra tayê kurdî û tayê kesê miletanê bînan ra zî wazenê xo çekuyanê esilxerîban ra bipawê. Bi bawerîya nînan rindêr o ke merdim çekuyanê “safî” û “pakan” yê kurdî bîyaro herinda çekuyanê esilxerîban de.

La gelo, bi to, kamcîn çekuyî şîrinêr ê: “belê, şeker, welat” (belê, şeker, welat) yan zî “diwazdeh, tirşî, xwê” (diwês, tirşî, sole)? Eke îlleh lazim beno, ti hazir î/a nê komanê çekuyan ra kamcîn ziwane kurdî ra bierzê?

Xora rast “belê, şeker, welat” eslê xo de xerîb û “diwazdeh, tirşî, xwê” zî kurdîya “safî” û “pak” ê!

Hetê ziwannasîye ra qedr û qîymetê çekuyanê cayîyan yan zî yê esilxerîban yewbînî ra cîya nîyê. Ser o kî, zafêrîya çekuyanê esilxerîban ê ke cayê xo girewto, çekuyanê neweviraşte û kêmfehmkerdeyan ra baştir ê. Heme kurdî çekuyanê esilxerîbanê sey “kitêb, qelem, defter” (kitab, qeleme, defter) ra fehm kenê û mabenê kurdan de têkilîya bi nê çekuan asan a. La çekuyê sey “pirtûk, pênuş, lênûsk” seba zafêrîya kurdan “xerîb” ê, herçiqas ke nê bingeyê çekuyanê kurdan ser o virazîyayê zî.

Bi dîyarkerdişê kok û ristimanê çekuyanê kurdî, armancê min qet no nîyo ke qedr û qîymetê tayê çekuyan bigirî tayêna ser o û ez bi qet hewa zî dewaya çekuyanê xerîban ra “pakkerdişê” kurdî nêkena. La bi dîyarkerdişê çimeyanê çekuyanê kurdî ez wazena tarîx û derûdorê ziwane kurdî nîşan bikerî.

Yewna, hetê “pîrozîye” û qedrgirewtîş ra heme nê çekuyî seba zerrîya mi seypê yê: “roj” proto-hindûewropakî, “şem(b)” îbrankî ra, “welat” erebkî ra, “şeker” sanskrîtkî ra, “nivişt” fariskî ra, “savar” armenkî ra, “sax” tirkî ra, “semawer” uriskî ra, “xerîte” yûnankî ra, “qesr” latînkî ra, “kompûter” ingilizkî ra, “destpêkirin” ke kurdî de bi xo ame viraştene, “xuşîn” ke vengê tebîî yê nê karî ra ameyo xeliqnayene.

Ziwane kurdî bingeyê xo de ziwane kî hindûewropakî yo. Zafêrîya ziwane Ewropa (îngilizkî, franskî, yûnankî, rûskî...), yê Kurdîstan û Îranî ra heta Hindîstanî ziwane nê keyeyî ra yê. La, sey nimûne, erebkî û tirkî nê keyeyî ra nîyê.

Çekuyê tewr kanî yê ziwane kurdî proto-hindûewropakî ra (maya ziwane hindûewropakî) yê. Sey nimûne, heme hûmarê kurdî (xeyrja “sifir”î), heme zemîrê kurdî (ez/mi, ti/to, o/ey, a/aye, ma, şima, ê/înan), zafêrîya endamanê leşe (sere, çim, dest, pay...), xeyle heywanê kedî û yê nêçirî (ga, estor, mîye, kutik, verg, luye...), zafêrîya çekuyanê aw û hewayî (awe, va, varan, vewre, hêga...) kokanê hindûewropakî ra yê, yanî çekuyê sey nînan yan ci ra tenê vurîyayî ziwane hindûewropakî yê bînan de zî mendî. Merdim şeno nimûneyanê hûmarname, zemîr, hewyan û parçeyeka leşe bido:

- **zemîrê “mi”**: kurdî: “min, mi”, fariskî “men”, avestakî “mene-“, sanskrîtkî “ma, mam”, yûnankî “me”, latînî “me”, fransî “me, moi”, îngilizkî “me, my, mine”, rûskî “minya”.
- **hûmara “2”**: kurdî “di, du”, fariskî “do”, avestakî “dve”, rûskî “dva”, yûnankî û latînkî “duo”, fransî “deux”, îngilizkî “two”, swêdkî “två”, almankî “zwei”.
- **heywanê “ga”yî** (gameş, manga, golik): kurdî: “ga”, fariskî “gav”, avestayî “gav”, sanskrîtkî “gav, go”, rûskî “govyado”, armenkî “kov”, îngilizkî “cow” (biwane: “kaw”), almankî “Kuh”, swêdkî “ku”.
- **parçeya leşe “pay”** (linge): kurdî “pê, pay”, fariskî “pa”, belûçkî “pad”, avestakî “pade”, latînî “pês”, yûnankî “pous”, fransî “pied”, îngilizkî “foot”, almankî “Fuss”, swêdkî “fot”.

Wina zî zafêrîya karanê kurdî yê bingeyênan zî kokanê hindûewropakî ra yê: “bîyene” (îngilizkî: *be*), “dayene” (fransî: *donner*), “girewtene” (îngilizkî: *grab*), “mendene” (îngilizkî: *re-main*).

Goreyê teorîyanê nikayinan, qiseykerdoxê ziwananê hindûewropakî başûrê Rûsya ra kewtê raye, tayê şîyê ver bi rojawan û Hindîstan, Îran û Kurdîstan de ca girewto. Ziwane kurdî eslê xo de wina ameyo Kurdîstan. No barkerdiş û cagirewtiş texmînen 4.000-3.000 serrî verî virazîyayo.

La no nêno na mana ke heme kurdî bi eslê xo mintiqaya bîne ra ameyî Kurdîstan: şaro kurd û – sey zafêrî, eke heme ney – şarî zî netîceyê têkilbîyayîşê komanê cîya-cîyayan o. Seke heme kurdî eynî kokê gonî ra nîyê, wina heme çekuyê kurdî zî eynî kokê hindûewropakî ra nîyê. Rewşa heme ziwanan wina ya.

Îrankî ra:

Kurdî, fariskî, belûçkî, pehlewî û avestakî tayê ziwane îrankî yê serekeyê nikayinî yan ê verên ê. Merem bi “îrankî” sînorê Îranî yê nikayinî ney, la mintiqayêk û keyeyêkê ziwanan o ke Îran ra hîrayêr o. Nê ziwanan de tayê çekuyê muştarekî estê ke ziwananê hindûewropakî yê bînan de peyda nêbenê. Çekuyê winasî sey çekûyê “îrankî” nas benê.

Tayê çekuyê îrankî sîyasî û eskerî yê: *azad, bac, ceng, leşker, qehreman*. Tayê ci hunerî yê: *awaz, stran, newa, huner*. Tayê kî nameyê hewyan û nebatan û têkilîya înan ê: *her, kerge, pîyaz, nuke, avis*. Tayêna çekuyê rojane yê: *têşan, weş, xane/ban...*

Sûmerkî, Akadkî û Aramkî ra:

Gama ke kurdkî û zıwanê îrankî yê bînî ameyî herêma koyanê Zagrosan û peyê Mezopotamya, verê înan de tayê medenîyetê ucyî estbîyî yan zî verê cû estbîyî la êdî nêmendbîyî. Sîvîlîzasyonê îrankî yê verênî Împaratorîya Medî û Împaratorîya Parsî bîyî. Nê her dîyan xeylê tesîr medenîyetanê hemdeman yan verênan ra (sûmerkî, akadkî yanî babîlonkî, aşûrî yanî aramkî) girewt. Hem nuştîşê bi sertîrikan (*cuneiform*) nê sîvîlîzasyonan ra ame kopya kerdene, hem zî pê înan xeylê çekuyî kewtî zıwananê îrankî.

Çend çekuyê muhîmî yê nê çaxî nê yê: “*dîwan*” (eslê xo de bi manaya “nuştîşgeh”) sûmerkî “*tippu*” (nuştene) ra, “*şîşe*” bi rayîrê akadkî misirkîya kane ra, “*şemî*” (û “*-şeme*” ya ke peynîya zafêrîya çekuyanê hewteyî ya: *dişeme, sêşeme...*) bi rayîrê aramkî îbrankî ra.

Badê cû, zıwanê aramkî sey cîranê zıwanê kurdkî xeylê çekuyê muhîmî dayî kurdkî: “*gawir, gore, kirîv, pergal...*”

Çekuyê aramkî kurdkî de hîna zî zaf ê, la zafêrîya înan bi rayîrê erebkî kewtî kurdkî.

Erebkî ra:

Rind zanîyeno ke zıwanê erebkî bi rayîrê îslamî û çekuyanê têkilîya dînî zıwanê kurdkî û heme zıwananê musulmanan ser o tesîr kerdo. Çekuyê sey “*dua, zekat, hec, şehde, Quran, ayet, mele, camî, tobe, zikir...*” erebkî ra ameyî.

La nê çekuyanê dînîyan ra teber zî çekuyê sîyasî û îdarî zî bi zafêrî erebkî ra yê: “*dewlete, îzin, meaş, medrese, next, sîyaset, ticaret, welat, zilm, zerar, zewac, zirat...*” La ser o zî zafêrîya çekuyanê zanistî yan teknîkî zî: “*wext, saete, deqa, îlm, kitab...*”

La ney ra zî dot xeylê çekuyê kurdkî yê sadeyî zî: “*belê, la* (manaya “*hema, feqet*” de ke a zî erebkî ya), *cîran, bela, hez, hevîr, cerr, mal, eyal, aîle, xelk, zêde, razî...*” Xeylê karê kurdkî yê rojane zî erebkî ra yê: “*sekinîn* (pawitene), *hes kerdene, fehîm kerdene, cemidîyayene, şidênayene...*” Bê ke merdim

ziwanê kurdî bikişo, kurdîyêka ke hetê çekuyanê erebkî ra ameya “pak kerdene”, nêna fikirîyayene!

La ganî no zî bêro vatene ke xeylê çekuyê ke bi rayîrê erebkî ameyî, eslê xo de erebkî nîyê, la ereban nê zî ziwanêko bîn ra girewtê: “*dikan, Dicle, heykel, kursî, necarr, nîsane, temmuze...*” bi eslê xo sûmerkî ra yê, la pê erebkî kewtî kurdî. “*erş, qale, tîcaret, tercuman, zebanî...*” bi eslê xo akadkî ra (ziwanê babîlonîyanê verênan) yê, la pê erebkî ameyî mîyanê ziwanê ma. “*Bereket, ceza, cizye, hec, hikmet, sirat...*” çekuyê têkilê dîne Îslamî yê, la eslê înan aramkî ya (ziwano sereke yê xirîstîyananê Rojhelatê Mîyanênî). “*Namûs, qanûn, xerîte*” sey çekuyê erebkî nas benê, la ê bi rayîrê erebkî yûnankî ra yê.

Erebkî xeylê çekuyî ziwananê îrankîyan ra girewtê: “*benefşe, bernamec, beqşîş, bûstan, cam, cewher, cezer (gêzer), destûr, enbar, fincan, fistiq, fulaz (pola), hendese, meydan, muhr, rizq, sirac (çila), tac, terz, ustaz (hosta), weşî, werd (gule), wezîr, xencer, xîyar, zenbeq, zendîq, zencî, zincîr...*”

Îslam ra ver û destpêkê îslamî erebkî zafêrî çekuyê teknîk û îdarî ziwano edebî yê îrankî ra, yanî pehlewkî ra girewtî. Dima, tayê çekuyê şîrkî yê îrankî pê şîranê dîwanî yê fariskî kewtî erebkî: “*yasemîn, bûse/bewse* (manaya “maç/paç” de, fariskî “bûsê” ra, bi kurmanckî “ra-mûsan”).

Sankrîtkî ra:

Eynî wext de, tawo ke kurdî û ziwananê îrankî yê bînan Rojhelato Mîyanên de ca girewtbî û rojawanê xo de xeylê çekuyî ziwananê samkî (akadkî, aramkî, erebkî...) ra girewtêne, rojhelatê ziwananê îrankî de sîvîlîzasyonê hindî gurr û geş bî. Ziwanê nê sîvîlîzasyonî yo sereke sanskrîtkî bîye ke ci ra hûmarêka çekuyan kewte kurdî û ziwananê îrankî yê bînan.

Zafêrîya çekuyanê sanskrîtkî nebat û berhemê ci yê: “*bacan, birinc, bîber, lîmon, mûz, nargîle, nîlûfer, qend, şeker...*” La ancîya, sey nimûne “*ferfûr*” zî sanskrîtkî ra yo.

Fariskî ra:

Kurdkî û fariskî di zivanê ke yew kok ra yê. Xeylê çekuyê ke manenê ro yewbînan, fariskî û kurdkî de estê, la ne kurdkî nê fariskî ra, ne zî fariskî nê kurdkî ra girewtî. Nê her di zivananê maya înan ra (proto-îrankî, proto-hindûîrankî, proto-hindûewropakî) ameyî girewtene. La ancîya tayê çekuyî fariskî de ameyî viraştene û badê cû kurdkî nê çekuyî rasterast fariskî ra girewtî.

Kurdkî û fariskî heme tarîxê xo de zivanê cîranî bîyî, coka çekuyê fariskî tena nê çaxî de ney, la tayê newe kewtî kurdkî û tayê zî nika ra seserran û belkî hezarserran ra ver. Fariskî çaxê verê îslamî de sey fariskîya mîyanêne (pehlewî) û îslam ra pey zî zivanê Îranî yo fermî û zivanê edebîyatê berzî bî. Îslam ra dime fariskî bi giranî kewte binê tesîrê erebkî, la ancîya zî zivanêko zengîn û berhemdar bîyo û tesîrêkê xo tirkî, kurdkî û heme zivananê derûdorê xo ser o estbîyo.

Fariskî ra xeylê çekuyî kurdkî de winasî yê ke hemristimê înan bi xo eynî dem kurdkî de zî estê, la çekuya fariskî çekuyanê kurmanckî ya cayîyan ra tikêna cîya yenê xebitnayene. Çekuyê fariskî teberê parentezan de, yê kurmanckîya safe zereyê parentezan de nusîyayê: “*bazarr* (bajarr), *geşt* (gerr, gerrîn), *keman* (kevan), *meh* (heyv / hîv), *peyam* (peyv), *peyman* (pîvan), *tuxm* (tov)...”

Seke yeno dîyene, nê çekuyî hem bi manaya xo û hem zî bi vengê xo nêzdîyê yewbînan ê. Eslê xo de, nê yew çeku yê, la bi zeman ra yewbînan ra vurîyayî û kurdkî manaya cîyaye daye her yew teneyê nê çutçekuyan.

Labelê xeylê çekuyî zî fariskî ra ameyî ke hemristimê xo kurmanckî de yan çin ê yan zî nêmendê: *amade* (“ameden” ra = ameyene), *nivîşt* (“nivîšten” ra = nuştene), *rewş* (“reften” ra = şîyene), *saz* (kokê demê nikayîni yê karê “saxten” = viraştene), *saxte* (“saxte” ra = viraşte), *werziş* (“verzîden” ra = ceribnayene, hereket kerdene, antreman kerdene)...

Tayê çekuyî zî demo peyên de fariskî ra ameyî, çike ê zivanê kurdkî de, mîyanê şarî de nê xebitnayene: “*cîhan*, *derya*, *ferheng*...”

Armenîkî ra:

Têkilîyêka zaf derge mabênê ziwananê îrankîyan û ziwane armenîkî de estbîya. Semedê serdestîya medenîyetanê îrankî ver bi armenîkî ra, xeylê çekuyê muşterekî yê îrankî û armenîkî ziwananê îrankî ra kewtî ziwane armenîkî. La armenîkî zî tayê çekuyê dayî ziwananê îrankî, bitaybetî kurmanckî (kirdaskî) û kirmanckî (zazakî) ke tarîxê înan armenîyan reyde û mabên de estbîyo.

Tayê çekuyê ke armenîkî ra kewtî kurmanckî (kirdaskî) nê yê: *boç, kulîn (lengayene), kulox, law, savar, torn, xaç, hêlî* (neynik)... Beno ke “*kar / karik, gom / gov...*” zî.

Tirkî ra:

Nêzdîyê hezar serran o ke kurdkî û tirkî cîranê yewbînan ê. Tirkî bi hezaran çekuyê ziwananê îrankîyan ra girewtî, la xeylê çekuyê dayî ziwananê îrankîyan zî, bitaybetî kurmanckî û zazakî, la ser o zî sorankî û fariskî. Çekuyê ke tîya de rêz benê, tena “*tirkmanckî*” de ney, la kurdkîya standarde de zî estê.

Tayê nameyanê heywan û nebatan ra yê: *beq, çîçek, çîlek, deve (hêştir), ordege / werdege, qaz, qû, wilax (dewar), qawin, quzilqurt, qûm (xîz)*. Tayê werdî zî tirkî ra kewtî kurdkî: *aprax / îprex, dolme, dodirme, doner...*

Balkêş o ke tirkî tayê çekuyê eşîr û ziretî zî dayî kurdkî: “*axa, çol, dol, êl, koç, koçer, kok.*” Tayê sifet û zerfî zî nê yê: “*boz, genc, sax, tim.*” Tayê nameyê cografîkî zî bi tamamî yan beşêkê ci tirkî ra ameyî viraştene: “*Gilîdax, Kurdax, Qeredaj, Qerejdax...*”

Rûskî ra:

Medenîyetê destpêkî Rojhelatê Mîyanên de bîyî, la nêzdîyê hezar serran o ke rojawan teknîk û kultur de hîna zaf averşîyaye yo. No zî bîyo sebebê girewtîşê çekuyan. Nê çekuyan ra tayê rûskî ra vîyartî ziwananê Rojhelatê Mîyanên: “*îskan, kalaşnîkov, kartol, mazot, polîtburo, semawer, sole* (zazakî de), *zimanok...* (kirdaskî de)”.

Rojawan ra: Yûnankî, Latînkî, Franskî, Îngilizkî...

Nika rojawan teknîk de bi desserran yan seserran verê Rojhelatê Mîyanênî de yo. Coka zafêriya çekuyanê neweyanê îlmîyanê teknîkîyanê sîyasîyanê komelkîyan Ewropa ra yena ziwanê kurdkî û heme ziwananê dinya.

Rew ra, yûnankî û latînkî di ziwane bitesîrî biyî. Yûnankî ra bi zafêrî çekuyî pê franskî yan îngilizkî kewtî kurdkî, la xeylê çekuyî pê erebkî zî (yan zî tay-tay pê tirkî). Nê çekuyanê teknîk, tib, felsefe, sîyaset û endustrî ra peyda benê: *“belxem, fanos, felsefe, fener, îblîs, Încîl, kelemî, kilît, mencenîq, namûs, qalib, qanûn, qeleme, rital (< lîtir/lître), temel, tirb, tirpan, tiryak, zewac”*. Tayê çekuyî ha yo çaxê ziwane îrankî yê mîyanênî (pehlewî) ra yê: *zimpare, zîv*.

Latînkî ra çekuyî bi zafêrî pê ziwananê Ewropa (franskî, îngilizkî) no demo peyên de kewtî kurdkî, labelê ci ra tayê zî bi rayîrê ziwananê rojhelatî rew ra ameyî: *“beledîya, firine, fîstan, gumrik, lenger, masa, qefes, qemîs, qesr.”*

Heta nêmeyê seserra vîstine ziwano sereke yo ke ci ra çekuyî vila bîbîyî dinya, franskî bîye. Zafêriya çekuyanê Ewropa yê ke no demo peyên de girîyayî ziwane kurdkî, bi formê xo franskî ya. Sey nimûne, çekuyê bi *–lojî* yan zî bi *–syon* teze pê franskî kewtî kurdkî.

Nika îngilizkî serdest a. Çekuyê teknolojîye: *komputure, Înternet, telefon, televîzyon, smartfon, iPad, iTouch*; yê kulturî: *aktor, fîlm, karton, sînema*; yê sporî: *basketbol, beyzbol, futbol, voleybol, handbol...*

La îngilizkî tena çekuyan ziwananê bînan nêdana, la eynî wext de zî bi dewamîye çekuyan ziwananê bînan ra gêna. Ma çend nimûneyan bidîme ke ziwananê îrankîyan ra kewtî îngilizkî: *bulgur* (belxur), *caravan* (karwan), *caviar* (xavyar, hakê maseyan), *check/cheque* (çek), *chess* (kişik, şetrenc, çekuya ”şah”î ra), *derviş* (derwêş), *gravity* (giranî), *henna* (hene), *jackal* (çeçel, keftar), *jasmine* (yasemîn), *khaki* (xakî), *kiosk* (“koşk” ra), *meze* (meze), *orange* (“narinc” ra), *pajamas* (pîjemeyî), *Susan* (nameyêkê cinîyan o), *tulip* (lale, “tilbend” ra)...

Kurdî de bi xo viraşte

Xeylê çekuyê kurdî pêrabeste yê, yanî di yan hîna zêde çekuyan ra ameyî viraştene. Heme beşê ci şênê cayî bê, sey nimûne sey “*dest-pê-kerdene, nû-çe* (xebere), *bi-ser-kewtene, vir* (tîya), *wir* (uca), *pêk* (pîya, pêra)...” Ge-gane beşêk şêno cayî, beşêna zî xerîb bo, sey nimûne: “*fehm-kerdene, sax-bîyene, cemid-îyayene, şid-ênayene...*”

Ge-gane hetta beno ke heme beşê çekuye xerîb bê, la ancîya na zî goreyê gramerê kurdî yena viraştene: “*filmkarton*”. Ge-ge zî beşê çekuya pêrabestîye cayî yê, la çekuya pêrabestîye bi xo çarnayîşo rasterast yê vateyê xerîbî yo, sey nîmune: “*binnivîs* (binnuşte), *jêrnivîs* (cêrnuşte).”

Onomatopœtik

Kurdî bitaybetî bi çekuyanê ke vernganê tebîyan ra viraşte yê, bi înan zengîn a: *zinge-zing, gurmegurm, xuş-xuş, kij, qeqeq*... Heme ziwanan de vengê tebî benê çekuye. Ge-gane na çekuye wina nêzdîyê vengê tebî de manena ke asan o merdim pêheso, sey “*gurmayene*”. Ge-ge zî vengo tebî ra dûrî kewena, sey nimûne “*maç/paç*” ke vengo berz yê pirodayîşê leweyan çiyêk ser o yo, yan zî “*reyîn*” (lewayene) o ke formêko hesnaye yê “*rewîn*” o ke bi xo zî “*hewîn*” ra yo ke “*hew-hew*” ra yo.

Lehçeyanê Bînan ra

Ziwanî çekuyan tena ziwananê xerîban ra nêgêne, la aye ra zî wet lehçe û fekanê bînan ra neql kenê. Her ziwano nuşteki serê bingeyê yew yan di-hîrê lehçeyan yan fekan de ameyo awan kerdene, la qet ziwaneko standard çin o ke xo tena bi yew fek sînardar bikero.

Kurdî ziwaneko zafmerkezî yo, sey sewbîna ziwanan (sey nimûne, norweçkî, yûnankî, albankî û hetta zî îngilizkî). Çend formê xo yê nuşteki estê: bi kêmi kurmanckî, sorankî û zazakî. Yê kurmanckî

(kirdaskî) zî bi xo di-hîrê merkezî estbîyî: bi alfabeya latînkî Ewropa, Tirkîya û Sûriye de, bi alfabeya erebkî Îraq de, bi alfabeya krîlkî Armenîstan de.

Nê serran girewtîşê çekuyan mabênê lehçeyanê kurdî de bîyo zêde. Sey nimûne, kurmanckî (kirdaskî) nê çekuyî sorankî ra girewtê: “*ajel, gewre, netewe, peywendî, pêwîst, pêwîs...*” Heto bîn ra kurmanckî nê çekuyî dayî sorankî: “*dever, evîn, heval, mirov...*”

Kurmanckî (kirdaskî) pê sorankî û hewramkî zî çekuyî girewtî, mavajîme “wane, wate”. Zazakî dayîş ra zêde zafêrî çekuyî kurmanckî ra girewtê. Labelê, sey nimûne sufîksê “-ox” yo ke tayê nuşteyanê kurmanckî de yeno dîyene (“*gotox*” = vatox; “*kirox*” = muşterî, kerdox) zazakî ra vîyarto kirdaskî.

Netîce

Armancê nê cigêrayîşê kilmî no bîyo ke bi nimûneyan dîyar bikero ka çekuyê kurdî kotî ra yenê. Armancê min bi qet hewayî nîyo ke vajê felan çekuye aya bîne ra “pakêr”, “hîna zaf kurdî” yan “pîrozêr” a. Armancê nê cigêrayîşî fehmkerdiş û dayîşfehmkerdişê têkilîyanê tarîxî yê zîwan û komelê kurdî yo.

Ganî cigêrayîşê serê zîwanê kurdî de bingeyê ziwannasîya îlmîye ser o bê, la lebatê îdeolojî ke wazenê kurdî çekuyanê esilxerîban ra “pak” bikerê yan zî eslo xerîb yê nê çekuyan bi qestî bikerê “kurdî”, înan ser o ney.

Zafêrîya heme çekuyanê heme zîwanan bi eslê xo xerîb a, seba ke madem çekuyêke zîwanêko bîn de esta, girewtîşê ci viraştîşê çekuyêka newîye ra asanêr o: xeylê lebatî ameyî kerdene seba ke nameyê cayîyî qandê “televîzyon” yan “komputere” bêrê viraştene, la zafêrîya kurdan tim ê çekuyanê ke cayê xo girewto, înan xebitnenê.

Zîwanê kurdî ra eştişê çekuyanê esilxerîban ê ke cayê xo girewto, 1) qet fayde nêdano zîwanê kurdî û 2) qet zerar zî nêresneno “dîşminan”. La eştişê nê çekuyan do zerarêko girs bido zîwanê kurdî û kurdî seba qiseykerdoxanê ci giran û seqet bikero.

No nuşte bi sernameyê “Peyvên me ji kû tên?” 06. hezîrane 2015 keyepelê Zimannasî de vejîya. Bi destûrê nuştoxî, redaksiyonê DêrsimInfoyî nuşte kurmanckî (kirdaskî) ra çarna kirmanckî (zazakî) ser.

MALBAT: VEKOLÎNEKE PEYVNASÎ

Husein Muhammed


Em dizanin ku di gelek zimanan de hin peyv hene ku di gelek zimanên din de nînin. Bo nimûne, di kurdî de di mijara navên heywanên ku li Kurdistanê de tên xwedîkirin de, mirov zengîniyeke berçav ya zimanî dibîne. Bo nimûne, kit û yekeyên pezî di kurdî de li gor jî û temenê xwe û herwiha cinsê xwe gelek bi deqîqî û sexbêrî tên cudakirin. *Berx, kavir, berindir, hogij, beran, berindirza, mih...*

Gelek kes dê bilezin û bibêjin ku ev zengîniya zimanê kurdî beramberî hin zimanên din diyar dike. Rast e ku ev zengîniya zimanê kurdî diyar dike lê ew nikare jarî û belingaziya ti zimanên din diyar bike.

Belkî di hin zimanên din de hinde nav bo endamên pezî tine bin lê di hin mijarên din de wan ji kurdî zêdetir nav hene. Bo nimûne, di kurdî de tenê du-sê (li piraniya deveran tenê yek) nav ji hêştiran anku deveyan re heye. Lê di erebî de gelek zêdetir hene. Di kurdî de tenê du-sê (li piraniya deveran tenê yek) nav ji berazan re heye lê di gelek zimanên ewropî de hejmara peyvên têkilî berazan pirr berfirehtir e. Sebeba van cudahiyan ew e ku kurdan pez xwedî kirine lê ne yan jî pirr kêr hêştir yan beraz. Ereban gelek hêştirvanî kiriye lê bi qasî kurdan pez yan wek ewropiyan beraz xwedî nekirine û hwd.

Ziman ji hev cuda ne û her zimanek di hin mijaran de zengîniya xwe diyar dike. Lê mirov nikare bi objektîvî bibêje ku zimanek zengîn e û yek jî jar e. Helbet rewşa zimanan ji hev cuda ye lê sebebên vê cudahiyê civakî û siyasî ne, ne ji ber wê ye ku zimanek wek ziman ji yê din çêtir yan kêmtir be.

PEYVÊN MALBATÎ ÇI Û ÇAWAN IN?



Lê berevajî xwedîkirina heywanên cuda yan berhevkirin û bikaranîna gulûgiyayên cuda li deverên cuda yên dinyayê, di meseleya malbatî de eynî endam li her derê hene: li her dera dinyayê mirov bi radana ji aliyê babê xwe ve û bi welidandina ji aliyê dayika xwe ve peyda dibe, mezin dibe û wisa mirovatî didome. Hejmara navincî ya zarokên malbatekê li hin deran kêr û li hin deran mezin jî be, dîsa jî piraniya mirovan li her dera dinyayê yek yan zêdetir bira yan xwişk hene. Ne hindî hev xurt be jî, dîsa jî li her dera dinyayê mirovan têkilî li gel bapîr û dapîr, mam/ap û met, xal û xaletên/xaltiyên xwe hene.

Loma peyvên nasandin û navandina kesên malî û endamên malê di her zimanî de ji peyvên herî sade yên wî zimanî tîn hejmartin. Lê dîsa jî ziman di vê meselê de jî ne bi temamî wek hev in. Hin caran tê gotin ku hin ziman di vê mijarê de ji hev zengîntir in. Bo kurdî – bi taybetî kurmançî – jî tê gotin ku ji

ber têtikiliyên xurt yê navmalî yê civaka kurdî, zimanê me jî di vê meselê de ji gelek zimanên din zengîntir e.

Gelo ev gotin rast in? Û hê jî giringtir, gelo peyvên ku em malîyên xwe pê bi nav dikin bi rastî çî ji me re dipeyitînin anku diselmînin? Bi vekolîna naverok û reh û rîşên wan peyvên, em ê çî sîrr û razan li ser civaka xwe û kultûra wê hîn bibin?

Wate û cotwate

Peyvên ku endamên malbatê pê têt nasîn, hin ji wan peyvên in ku herî zêde di ziman de têt bikaranîn. Peyvên wek “jin, mêt, bab/bav, bira...” ji aliyê her kurdîzanê sade û heta zarok ve jî têt fehmkirin û bikaranîn. Sebebê vê jî ew e ku kesên bi van peyvên têt nasîn di piraniya malbatan de û li her dora piraniya kesan hene.

Hin peyvên malbatî jî hene ku niha kêmtên xebitandin û belkî ti caran jî bi berfirehî û rojane ne li kar bûne. Bo nimûne, gelek kurdîzanên kurdînivîs jî maneya peyvên wek “diş, tî, hevling” nizanin yan deqîq nizanin yan jî bi kêmtên ew bi xwe bi awayekî çalak nabêjin û nanivîsin. Ev ne tenê rewşa zimanê kurdî ye lê qisekerên gelek zimanên din jî hevwateriyên van peyvên kurdî bi zimanê xwe nizanin.

Di kurdî de peyvên malbatî pir in lê li aliyekî din, du yan konsept gelek caran bi eynî peyvê têt naskirin. Di gelek zimanan de cudahiyek di navbera peyvên zayendiyarker / cinsdiyarker û peyvên têtikildiyarker de têt kirin lê di kurdî de bi piranî ev cudahî nayê kirin.

Rast e di kurdî de “mêt, zelam” (bi inglîzî “man”) maneya “mîrovên nêr” didin û “bab, bav” (father) jî wateya “kesê ku yek yan çend zarok hene” radigihîne. Bi heman awayî “jin” (woman) maneya “mîrovên mê” dide û “dayik” (mother) jî wateya “kesa ku yek yan çend zarok hene” radigihîne.

Lê ev cudahî di piraniya peyvên de nayê kirin. “Keç” maneya “mîrovên mê yê ku hê nebûne jin” dide (bi inglîzî “girl”). Lê ew di heman demê de wateya “kesa ku zaroka kesekî ye” jî dide (bi inglîzî “daughter”). bi heman awayî “kur” anku “mîrovên nêr yê ku hê nebûne mêt” (boy) lê di heman demê de ew maneya “kesê ku zarokê kesekî ye” jî dide (bi inglîzî “daughter”).

Wek ku têt dîtin, di inglîzî de du peyvên cuda bo her yekê jî “keç” û “kur” hene:

kurdî	inglîzî	wateya peyva inglîzî
keç (1)	girl	zaroka mê
keç (2)	daughter	keça filan kesî
kur (1)	boy	zarokê nêr
kur (2)	son	kurê filan kesî

Helbet di kurdî de li cihê peyva "keç" di hin devokan de "kiç" û di hinan de jî "qîz" heye. Lê ev peyvên devokî jî tam maneya "keç"ê didin. Ew hem maneya "zarokên mê" û hem jî "keça filan kesî" didin. Cudahiya wan ferqa navbera devok û deveran e, ne cudahiya watenasî ye anku maneya wan ne ji hev cuda ye. Lê cudahiya navbera "girl" (zarokên mê) û "daughter" (keça filan kesî) watenasî / semantîkî ye: ew ne li gor devok û deveran lê li gor maneya xwe ji hev cuda ne.

Bi heman awayî li cihê peyva "kur" ya kurmancî di hin devokan de peyvên wek "law(ik), gede, sebî" hene. Lê cudahiya wan jî tenê ferqa navbera devok û deveran e, ne cudahiya watenasî ye anku maneya wan ne ji hev cuda ye.

Di rastiyê de ev "cotwatetiyê" peyvên malbatî di kurdî de gelek berbelav e. Bi heman awayî "jin" hem maneya "mirovên mê" (wek "Eysê navê jinan e") û hem jî wateya "zewiciya kesekî" dide. "Mêr" hem bi maneya "mirovên nêr" in (wek di peyva "pîremêr" de) û hem jî bi wateya "zewiciyê filan kesê" dide (wek "Elî merê Eysê ye").

Gelek peyvên din jî wiha "cotwateyî" ne. Bo nimûne, "bûk" hem "ew kes e ku aniha dawet û dîlana wê tê kirin" lê ew herwiha "jina kurê malbatekê ye", wek "Eysê bûka Fatê ye." Bi heman awayî "zava" hem "ew kes e ku niha dawet û dîlana wî tê kirin" û hem jî "mêrê keça malbatekê" ye.

Berevajî kurdî, inglîzî û gelek zimanên din peyvên cuda bo diyarkirina van mebestên cuda bi kar tînin:

kurdî	inglîzî	wateya peyva inglîzî
jin (1)	woman	mirova mê
jin (2)	wife	jina filan mêrî
mêr (1)	man	mirovê nêr
mêr (2)	husband	mêrê filan jinê

bûk (1)	bride	kesa ku aniha daweta wê ye
bûk (2)	daughter-in-law	jina kurê malbatê
zava (1)	bridegroom	kesê ku aniha daweta wî ye
zava (2)	son-in-law	mêrê keça malbatê

Helbet di kurdî de çendîn peyvên din jî li cihê "jin"ê hene: "afret, kulfet / kuflet, pîrek, bermalî, kabanî /kevanî..." Lê piraniya wan jî bi tamamî bi herdu maneyên "jin"ê (1. mirova mê 2. jina filan mêrî) li kar in û cudakirineke zelal ya hemû-kurmancî di navbera wan de nîne. Herçi inglîzî ye, bi kêrî niha (lê ne bi tamamî tarîxiyên) maneyeke bi tamamî cuda dide "woman" û yeke cuda dide "wife" jî: bi tamamî xelet e ku mirov bi maneya "mirova mê" bibêje "wife".

Bi heman awayî li cihê peyva "mêr" jî çend peyvên din hene: "zalam / zilam, peya, kabra..." Herdu peyvên "peya" û "kabra" bi maneya "mêrê filan jinê" nayên bikaranîn lê ji xwe ew wek din jî di kurmancî de pir kêr li kar in. Herçi "zalam / zilam" e, ew li gor devokan bi yek yan herdu maneyên "mêr"î li kar e.

Hewlên devokî yên cudakirina maneyan

Di kurmancî de şiklê hin peyvên malbatî li gor devokan diguhere. Bo nimûne, di kurmanciya navendî de "bav, dê, keç, zilam" lê di kurmanciya rojhilatî de "bab, da, kiç, zalam".

Ev cudahiya dengnasî yan şikilnasî baş tê zanîn. Lê li gor devokan hin cudahiyyên watenasî anku semantîkî jî hene.

Hin devokên kurmancî hewl daye ku du konsept û maneyên cuda yên peyvê – wek ku me li jor behs kiriye – herwiha di şiklê peyvê de jî bidin diyarkirin. Anku bo nimûne bi awayekî maneyên "zaroka mê" (bi inglîzî "girl") û "zaroka filan kesî" (bi inglîzî "daughter") ji hev cuda bikin. Wek mînak: di hin devokan de peyva "mêr" êdî tenê bi wateya "mêrê filan jinê" (bi inglîzî "husband") li kar e û bi maneya "mîrovê nêr" (inglîzî "man") nayê bikaranîn. Bo diyarkirina mebesta "mîrovê nêr" bo nimûne peyva "zalam" tê gotin:

- Elî mêrê Eyşê ye. (bi inglîzî "husband")
- Elî navê zelaman e. (bi inglîzî "man")

Ev cudakirin di nav devokên kurmancî de bi taybetî li Behdînan hatiye pêşxistin.

Herdem peyvên wiha bi temamî ji hev cuda nayên bikaranîn. Xaseten devoka behdînî paşpirtika ”-ik” ya bi eslê xwe dîmînutîv (biçûkker, şîrînker) bi kar tîne:

kurmanciya Behdînan	inglîzî	wateya peyvê
jin	wife	jina filan mêrî
jinik	woman	mirova mê
kiç	daughter	keça filan kesî
kiçik	girl	zaroka mê
kur	boy	kurê filan kesî
kurik	son	zarokê nêr

Bo nimûne:

- Eyşê jina Elî ye.
- Eyşê navê jinikan e.
- Gulê kiça Hesenî ye.
- Gulê navê kiçikan e.
- Azad kurê Serbestî ye.
- Azad navê kurikan e.

Lê heta li Behdînan jî ev cudakirin nû û nîvûvor (nîvco) ye. Bo nimûne, herdu maneyên peyva “bûk” (1. kesa ku niha daweta wê ye û 2. jina kurê malbatê) yan jî herdu wateyên peyva “zava” ji hev nehatine cudakirin.

Herwiha hemû maneya “mirovê nêr” neqlî peyva “zelam” nehatiye kirin. Em hê jî dibêjin “pîremêr”, ne “*pîrezelam” tevî ku mebest jê “mirovê nêr yê pîr e”, ne “mêrê filan kesê yê pîr” e. Herwiha “mêr” hê jî bi maneya “wêrek, bicesaret, bisteh” li kar e ku ew jî bi eslê xwe ji gotina “mirovê nêr” e, ne ji “mêrê filan jinê” ye. Li aliyekî din, bi taybetî di devê jinan de, peyva “zelam” dike ku bi temamî cihê hemû maneyên peyva “mêr” bigire. Loma gelek caran mirov gotinên wek “zelamê wê” anku “mêrê wê” dibihîze.

“Pismam” û “dotmam” lê ka “kuzen”?

Di kurdî de hin kesên têkilî binemalê peyvên xwe yê deqîq hene. *Dotmam* (domam, duhmam) anku “keça mamê / apê / amê kesekî” ye û *pismam* jî “kurê mamê / apê / amê kesekî” ye. Peyvên malbatî yê wiha pêkhatî (compound) di kurmançî de pir in:

- pismam, kurap, kurmam, kuram
- do(t)mam / duhmam, keçap, keçam, qîzap, qîzam
- kurxal, pismal
- kurxalet, kurxaltî
- kurmet

Anku kurmançî cudakirineke pir deqîq û sexbêr dixê navbera binavkirina van lêziman. Di farisî, erebî û tirkî de jî peyvên wiha ji van kesan re hene. Di soranî de du peyvên piçekê giştîtir hene: “amoza” (zarokên mamê kesekî, hem pismam û hem jî dotmam) û “xafoza” (zarokên xalê kesekî, hem kurxal û hem jî keçxal). Bi heman awayî di kurmançî de jî peyvên wek *biraza*, *birazî* (zarokên birayê kesekî) û *xwarza*, *xwarzî* (zarokên xuşka kesekî) hene.

Di inglîzî û gelek zimanên ewropî de peyvên wiha bicihbûyî nînin. Helbet mirov dikare bibêje “kurê mamê min” (my uncle’s son) lê gotinên wek “kismam, kurmam” yê qalibgirtî di inglîzî de nînin. Li cihê van hemû zarokên mam, met, xal û xaletan, peyva *cousin* (bixwîne: kazin) heye ku mirov nikare bi peyvekê tenê li kurdî yan zimanên din yê Rojhilata Navîn wergerîne.

Eslê peyva inglîzî ji fransî *cousin* [kûzen] e ku ji latînî ye. Vê dawiyê ew ji fransî wek *kuzen* derbazî tirkî jî bûye. Heman peyv bi taybetî bi rêya wergerandina tekstên ji zimanên ewropî êdî ketiye kurdî jî.⁸¹

⁸¹ Bo nimûne, binêrin vê ragihandina polîsê Swêdê: “Her wisa, ew dikevin bin erkdariya ku çavdêrî û kontrola xwung û kuzenên xwe bikin.” (r. 6/10). <https://www.polisen.se/PageFiles/340173/kurmanji.pdf>

PEYVÊN MALBATÎ JI KÛ TÊN?

Jin û mêr anku mirov

Jin û mêr du peyvên bingehîn yên mirovatîyê ne. Bêyî wan ne jîyan dibe û ne jî didome. Ev herdu peyv di kurdî de gelek kevn in, herdu jî ji proto-hindûewropî ve wek mîras bo zimanê kurdî mane.

Hevrehên peyva "jin" di lehceyên din yên kurdî de û di piraniya zimanên hindûewropî de hene:

kurmancî, soranî, başûrî ⁸²	jin
zazakî	ceni
parsî, belûçî	cen
farisî, pehlewî	zen
peştûyî	cinëy
avestayî	cêni-
osetî	зæнæг (jeneg)
sanskritî	cenî-, gna-
yûnanî	γυνή (gunê)
rûsî	jêna
çekî	žena (bixwîne: jêna)
polonî	żona
tozarî B	śana
yûnanî	γυνή (gunê)
rûsî	jêna
ermeniya rojavayî	կին (gin)
ermeniya rojhilatî	կին (kin)
gotîkî	gino
danmarkî	kone, kvinde

⁸² "başûrî" yan "kurdiya başûrî": lehceyên feylî, kelhurî, kirmaşanî...

swêdî	kvinna
inglîziya kevn	cwene
inglîziya nû	queen (şabanû, melike, kralîçe)

Lîste ne temam e: hê bi gelek zimanên din jî yên hindûewropî ev peyv hene lê nexwast ku lîste zêde dirêj bibe. Ji serdema makezimanê proto-hindûewropî ve maneya vê peyvê her “jin” bûye lê – wek ku ji nimûneya inglîzî diyar e – din hin zimanan de wateya wê piçekê guheriyê: di inglîzî de ne bi maneya her jinê lê tenê “jina paşayî” yan “paşaya jin” li kar e.

Çendîn peyvên din bi maneya *jin* hene lê ji aliyê etîmolojiyê ve ew hemû bi rêjeyî bi vê wateyê nû ne: *afret* ji erebî *ewre[t]* عورة (rûtî, rûsî, kêmasî), *kulfet/kuflet* ji erebî *kulfet[t]* كلفة (bar, berpirsiyarî), *bermalî* (ya li ber male, parêzvana malê), *kebanî/kevanî/kabanî* (parêzvana malê – li jêrtir li beşa “mal û malbat” binêrin) û *pîrek* (? ← pîrik, pîlik = alîkara dayikê di zarokanînê de). Di cotpeyvên wek *erz û eyal* de peyva yekem û di gotina *zar û zêç* de jî peyva duyem bi maneya *jin* tên fehmkirin.

Sebebê hebûna hinde navên cuda bi maneya *jin* tabûyên civakî ne: di civaka kevnar ya kurdî de, wek di gelek komelgehên din jî yên tradîsyonel de, eyb û şerm bûye ku mirov yekser behsa jinan bike. Loma hin bernav bo wan hatine danîn û niha ew peyv jî êdî bûne hevwateryên anku sînonîmên peyda *jin*.

Herçi peyva “mêr” e, ew û “mîrov, meriv” herdu jî dîsa ji proto-hindûewropî ne û hevrehên wan jî di piraniya zimanên hindûewropî de peyda dibin. Ew herwiha hevrehên peyva “mîrin” in anku “mêr / mîrov = kesên ku dimirin” wek di jwateya “xwedayan = heyberên nemir”.

kurmancî	mêr	herwiha: mîrov, meriv, mero, merî, meri, mîrin, mirar, mirî, merd, camêr
soranî	mêrd	mirdin, mirdar
zazakî	mêrdek	merdim, merdene
farisî	merd (mêr, zêlam), merdom (mîrov, meriv),	morden (mîrin), mordar (mirar), mordê (mirî)
pehlewî	merd	mertum (mîrov, meriv)
hexamenişî	mertiye- (mêr, mîrov)	
sanskritî	meret- (mîrin), mṛtá (mirî)	
ermenî	մարդ (mard)	
latînî	mortuus (mirî)	
fransî	morir (mîrin), mort (mirî)	merdom, morden, mordar
spanî	muerto (mirî)	
inglîzî	murder (qetîl, kuştin)	

rûsî

мёртвый (myortviy: mirî),

умирать (u-mîrat: mirin)

Ne bi qasî peyva *jin* be jî, dîsa jî çendîn bernav bo peyva *mêr* jî hene. Peyva *zêlam/zilam* di hin devokên erebî de jî heye lê ne diyar e ku ew têkilî peyva *zalim/zilm* e yan jî wekheviya wan tiştêkî tesedîfî ye. Wek peyveke malbatî herwiha *mêr* gelek caran bi peyva *malxwê* (xwediyê malê) jî tên nasîn. Peyvên *peya* (bi soranî *piyaw*) û *kabra* jî hene lê di kurmançî de tenê bi maneya mirovên nêr û bi taybetî jî bi wateya mirîd û peyrewên hin kesên din li kar in. Ew wek peyvên malbatî nayên gotin. *Peya* peyveke îranî ye, eslê wê leşkerên peyade ne anku ew têkilî peyva *peya*, *bi piyan* e. *Kabra* ji aramî hatiye wergirtin.

Xuşk û bira

Ji ber ku ji destpêka mirovatîyê ve (ji roja ku mirov hebûne heta niha) dayik, bab, zarok, xwişk, bira û hwd. hebûne, peyvên ku ew kes pê tên navandin û nasandin jî di zimanan de hebûne. Loma ew peyvên gelek kevn in. Bo nimûne, peyva "bira" di kurdî û di piraniya (heke ne hemû) zimanên îranî û hindûewropî de wek hev in û ji zemanekê ne ku ew ziman hemû yek bûn yan jî devokên eynî zimanî bûn. "Bira" bi zaravayên kurdî "bira" ye, bi farisî "berader" e, bi rûsî "brat" e, bi inglîzî "brother", swêdî "bro, bröder", bi latînî "frater", bi frensî "frère"... Hemû ji rehên eynî peyva proto-hindûewropî ne.

Wek ku tê dîtin, di gelek nimûneyên bi zimanên din de "-er" li dawîya peyva bi maneya "bira" ye (farisî "berader", inglîzî "brother", latînî "frater"...) lê ew di kurdî de nîne. Ev ketina pirtika "-er" ji kurdî di peyvên din de jî diyar e (li jêrtir li peyvên wek "xweh, ma-k, dot-mam... binêrin.

Li gel birayan herwiha "xuşk" jî hene. Ev peyv li gor devokan wek "xuşk, x_ûşk, xwişk, xwîşk, xîşk, xwêşk" peyda dibe. Lê di hin devokan de ew wek "xuh, xwih, xweh" jî tê dîtin. Di rastiyê de peyva "xuşk" û formên din yê bi paşpirtika "-şk" formên dîmînutîv (biçûkker) yê peyva "xuh, xwih xweh" in wek çawa ku "birak" forma dîmînutîv ji ya peyva "bira" ye, "mêrik" forma dîmînutîv ya peyva "mêr" e, "jinik" peyva dîmînutîv ya "jin" e. Peyva "xweh" di hin devokan de bo şîrînkirinê wek "xuşk" hatiye guherandin. paşî forma "xweh, xuh" bi temamî ji hin devokan winda bûye.

Lê forma bingehîn "xweh, xuh" e ku di zazakî de wek "way" heye (bi ketina X ji destpêka komkonsonanta XW wek: werden = xwarin, wenden = xwendin/xwandin). Heman peyv ji farisî de wek "xwâher" heye. Mebest bi herfa jorînîsî ^w ew e ku ew tê nivîsîn lê di zimanê niha de nayê gotin: mirov

bi farisî dinivîse "xwaher / xvaher" lê dixwîne "xaher". Lê forma nivîskî belgeya wê yekê ye ku ev peyv carekê di farisî de wek "xvaher / xwaher" dihat gotin.

Paşpirtika "-er" ji peyva kurmancî "xweh-" ketiye lê peyva "xwaher" bi forma xwe ya kurtkirî "xwar-" de di peyvên "xwarza, xwarzê, xwarzî" de maye. Şopa R herwiha di peyva hewramî "wale" (xuşk) de jî maye lê R bûye L (guherîna L/R di kurdî de diyardeyeke berbelav e) û wek zazakî, di hewramî de jî X ji komkonsonanta XW ketiye.

Di pehlewî de jî ev peyv wek "xvaher" dihat gotin. Di avestayî de ew bi forma "hveher" bû. Peyva bi heman maneyê di sanskrîtî de "sveser" e. Mirov dibîne herfa dawiyê ya peyva avestayî li gel ya sanskrîtî eynî ye. Dîsa mirov dibîne ku vokalên peyvên (di her yekê de du caran E) eynî ne. Di peyva avestayî de du H hene ku di peyva sanskrîtî de peyda nabin û di peyva sanskrîtî de jî du S hene ku di peyva avestayî de peyda nabin. Lê sebebê vê cudahiyê baş tê zanîn: S-ya proto-hindûewropî di zimanên îranî de dibe H loma:

- kurdî: "heft", farisî "heft", avestayî "hepte-"... (zimanên îranî)
- sanskrîtî "septan", latînî "septem", frensî "sept"... (zimanên ne-îranî)

Piştî girêdana peyva avestayî "hveher" bi ya sanskrîtî "sveser" ve, êdî hêsan e ku mirov bibîne ku heman peyv di gelek zimanên din yên hindûewropî de jî heye:

- latînî "soror" (ji "*swesor") → frensiya kevn "suer", frensiya nû "sœur", îtalî "suora, sorella", portugalî "soror", spanî "sor"
- germencî: "*swestēr" → almanî "Schwester" (bixwîne: Şvêstêr), danmarkî "søster", swêdî "syster", inglîzî "sister", holendî "zuster"...

Bo XW ya zimanên îranî ji SW ya proto-hindûewropî, herwiha li jêrtir li peyvên "xesû û xezûr" jî binêre.

Dê û mak

Jina ku mirov jê bûye di devokên kurmançî, soranî û kurdiya başûrî⁸³ de bi hin peyvên tê binavkirin ku bi herfa D dest pê dikin. Li gor devokan di kurmançî de bi kêmî ev formên wê hene:

- da, dê (girêdayî "diya" wek "diya min), dayik, dayk, deyk (herwiha formên gazîkirinê "dayê, ya-dê")...

Di soranî de bi piranî "dayik, dayk" li kar e, herwiha forma gazîkirinê "daye". Di kurdiya başûrî de peyva "dafig" ihtimalen serdesttirîn forma bi vê maneyê ye.

Gava ku mirov li peyvên bi vê wateyê yê zimanên din yê hindûewropî dinêre, mirov li peyva kurdî ecêbgirtî dimîne: di ti zimanên din yê hindûewropî de "dê, dayik" ne wek ya kurdî ye.

Di zimanên nêzîk de peyva "dayik" wiha ye: belûçî "mat", farisî "mader", pehlewî "mater", avestayî "mater"... Di zimanên din yê hindûewropî de jî ev peyv nêzîkî wan e: sanskrîtî "matr", latînî "mater", yûnaniya kevn "mêtêr", ermenî "mayr"...

Di rastiye de hevrehên van peyvên hindûewropî herwiha di zazakî de jî maye: "ma" (dayik, dê). Wek peyvên "bira" û "xweh", ji vê peyva kurdî (zazakî) jî "-er" ketiye. Herwiha D/T jî ketiye (bide ber farisî "ma-d-er"), wek çawa ku ew di gelek peyvên din jî yê kurdî de ji dawiya peyvê ketiye:

- kurmançî "ba", zazakî "va" lê farisî "bad" û pehlewî "vat", avestayî û sanskrîtî "vate-", latînî "ventus" (anku D/T ji dawiya peyva kurdî "ba/va" ketiye)

Di kurmançî de jî ev peyv heye lê bi maneya "kesa mirov jê çêbûyî" êdî nayê bikaranîn. Ew peyva "mak" e ku maneya wê "dayika heywanan" e. "Ma" hevrehên "ma" ya zazakî ye û K-ya dawiya wê jî nîşana forma dîmînutîv e wek çawa ku "jin" dibe "jinik", "mêr" dibe "mêrik", "kur" dibe "kurik", "keç" dibe "keçik", wisa "*ma" jî bûye "mak". Lê tam wek ku peyva ne-dîmînutîv "xweh, xwih, xuh" ji hin devokan bi temamî winda bûye û tenê forma dîmînutîv "xuşk" maye, wisa forma "ma" jî bi maneya "dayik, mak" êdî bi yekcarî ji kurmançî winda bûye û tenê forma "mak" wek peyveke serbixwe maye.

Lê formeke din jî ji eynî peyvê maye: "mê". Ew jî ne maneya "dayik" lê wateyeke nêzîkî wê dide çunkî tenê mirov û heywanên mê dikarin bibin "mak" anku "dayik".

⁸³ Mebest ji "kurdiya başûrî" devokên feylî, kelhurî û kirmaşanî ne, meqsed jê ne "kurdiya Başûrê Kurdistanê" ye.

Forma "ma-" wek pêşpirtikeke neserbixwe jî maye, wek di peyvên "ma-ker" (kerên mê) û "mahîn" (mehîn, hespên mê) de.

Lê gelo peyvên kurdî "dayik, dê, da, dayê, dafig" ji kû tên?

Rast e ku "ma-" ya hindûewropî di kurmançî de bi maneya "dayika mirovan" nemaye lê "dayik, dê, da, dayê..." yên kurdî jî bi eslê xwe ji proto-hindûewropî anku ji maka hemû zimanên hindûewropî ji me re hatine.

Heman peyva "da, dê, dayik" di hewramî de bi forma "eda" heye. Kesa ku li şûna dayikê zarokan xwedî dike lê ne dayika wan e, bi kurdî "dayên, dadik" e. Wek ku diyar e, ew jî ji eynî peyvê ye. Di pehlewî de ew wek "dayeg" bû, bi avestayî "daênu", bi farisî "dayên" e. Eslê peyva îranî bi maneya "jina ku zarokên kesên din dimêjîne" (dayên) e lê di kurdî de paşî maneya peyva "jina ku zarok jê çêbûye" (da, dê, dayik) wergirtiye. Di heman demê de vê peyvê peyva "ma" ya bi maneya "dayika zarokan" ji kurdî rakiriye û ew êdî tenê wek "mak" bi maneya "dayika heywanan" tê bikaranîn.

Ev peyva îranî ketiye ermenî jî: bi ermeniya kevn **դայեակ** (dayeak), bi ermeniya nû **դայակ** (dayak). Di îranî de jî ew wateya "dayên" dide, ne "dayik".

Têkilî peyva "dê" herwiha "dêl, dêhl, dihl" (seyên mê, kûçikên mê, makên kûçikan) di kurdî de hene. "Seyên mê" bi soranî "dêl, del" û bi hewramî jî "dele" ne.

Eslê peyvê rehê proto-hindûewropî **d^heh₁(y)*- e ku maneya "dotin, mêtin, dayênî kirin" dide. Ji bilî "da, dê, dayik, dêl", herwiha peyvên kurdî *dotin, dew, do(t)man / duhman* jî ji eynî rehî ne. Ev rehê proto-hindûewropî bi berfirehî di gelek şaxên zimanên hindûewropî de bi maneyên hinekê ji hev cuda lê dîsa jî têkilî hev peyda dibe:

- sanskrîtî de **धयति** (dhayati) mêtin, şîrê dayikê / makê vexwarin
- ermenî: **դիել** (diêl): mêtin, şîrê dayikê / makê vexwarin; şîr dan, şîrê dayikê / makê danê
- inglîziya kevn: delu (çiçik, memik, guhan), **dēon (mêtin, dotin)**
- slaviya kevn: **доити** (doîtî): şîrê makê / dayikê danê
- rûsî: **дитя** (dîtyá): zarok, sava, berşîr, kesa/ê ku şîrê dayikê / makê vedixwe
- latviyayî: dēls: kur, kurik, lawik, zarokê nêr
- **θηλος** (thêlus): mê (ya ku tê dotin/mêtin) û **θηλή** (thêlê): memik, çiçik, guhan (organa ku tê dotin/mêtin)
- latînî: fello (mêtin), filius (kur), filia (keç), fetus (biber, bihemle, girane), femina (jin; mê)

Bab û bavê winda

Peyva "bab" ya kurmanciya rojhilatî, "bav" ya kurmanciya navendî û "baw, baw" yê soranî gelek dişibin peyvên bi heman maneyê yê gelek zimanên din jî:

- tirkî: baba
- albanî: baba
- malezî: baba, bapa
- swahîlî: baba
- hawsayî: baba

Wek ku tê dîtin, hin ziman ji van qet ne ji binemala hindûewropî ne (bo nimûne tirkî) û gelek jê jî hem ji aliyê binemalîve û hem jî ji hêla cografî ve ji kurdî gelek dûr in lê dîsa jî ev peyv bi wan zimanan wek kurdî ye. Sebebê vê ew e ku peyva "baba" (herwiha bi forma "papa, pappâ" û hin formên nêzîkî wan) peyveke gerok e: li derdora dinyayê heye ji ber ku ew ji zimanê zarokan e.

Di rastiyê de peyva "bab, papa, pappâ" di gelek zimanên hindûewropî de jî heye:

- farisî: baba
- inglîzî, fransî, holendî, latînî, almanî: papa
- swêdî, norwecî: pappâ

Lê di van zimanan de ev peyv tenê bi zimanê zarokan yan jî wek bernavê peyva "bab, bav" li kar e.

Peyva "resmî" ne ew e lê heye din e:

- farisî, pehlewî: pider
- sogdî: p-t-r
- xotanî: päter-
- sankrîtî, hindî, urdûyî: pitṛ
- yûnanî: πατήρ (patér)
- latînî: pater
 - o îtalî, portugalî, spanî: padre
 - o fransî: père
- inglîzî: father

- holendî: fader
- danmarkî, swêdî, norwecî: fader, far
- almanî: Vater (bixwîne: Fatêr)

Ev peyv ji kurmançî û soranî winda bûye bêyî ku ti şopekê li dûv xwe bihêle. Lê ew di zazakî de hê jî maye: bi zazakî bab/bav "pî" yan "pîy" e. Bo ketina "-der / -ter" ji kurdî, bide ber:

- kurdî: "bira" û farisî "berader", inglîzî "bro-ther"
- kurdî "ma-k" û farisî "mader", inglîzî "mother"
- kurdî "do[t]" wek "do[t]mam" û farisî "doxter", inglîzî "daugh-ter"
- kurdî "xweh-" (xuşk) û farisî "x"ah-er", inglîzî "sist-er"
- kurdî "pis-" (di peyvên "pis-mam, pis-xal" de) û farisî "pis-er" (kur)

Bo ketina "-er" ji dawiya vê peyvê herwiha binêre heman peyvê bi...

- belûçî: pit
- osetî: фыд (fid)

mam / am / ap û met

Bi maneya "birayê babê kesekî" di kurdî de bi kêmî sê peyv hene:

- **mam**: di devokên kurmançiya rojhilatî de û herwiha di soranî de serdest e.
- **ap**: di piraniya devokên kurmançiya navendî û rojavayî de li kar e.
- **am**: li çend deverên kurmançiya navendî (xaseten di hin devokên derdorên Mêrdînê de) tê bikaranîn
- **amo-**: wek pêşpirtikeke (prefîkseke) bi maneya "mam, ap" di hin peyvên soranî de tê bikaranîn: "amojin" (jinmam, jinap, jina mamê kesekî), "amoza" (zarokên mamê kesekî, pismam û/yan dotmam)

Ji van peyvên reh û rîşên etîmolojî yê peyva "am, amo-" zelal in. Ew û 'emo عمو ya farisî ji erebî 'emm عم in. Bo guherîna 'e (eyn+e) ya erebî di kurdî de bi A bide ber:

- alif ji erebî 'eleف (hevrehê akadî elêpu) (→ tirkî yulaf)
- aqil ji erebî 'eqil عقل

Peyva “mam” bi ihtimaleke gelek mezin ji heman peyva erebî lê ji forma wê ya pirhejmar *e'mam* اعمام e. Bo ketina E ji destpêka peyvê, bidin ber van nimûneyan:

- mîr ji erebî *emir* أمير
- kurdî û farisî “yar” lê pehlewî “eyar”
- kurdî “wêran” û farisî “vîran” lê pehlewî “evêran”
- kurdî “wan, van” ji “ewan, evan” ji “ew+an, ev+an”

Bo ketina E ji destpêkê, herwiha binêre peyva *met* li jêrtir.

Bi hin zimanên Hindistanê *mama* bi maneya *xal*, *birayê dayikê* heye û ew peyv ketiye belûçî yê îranî jî. Lê sebebê peydabûna wê peyva ji zimanên Hindistanê di belûçî de, cîraniya wan e. Ihtimala ku ev peyva kurdî ji *e'mam* ya erebî hatibe gelek zêdetir e ji ku ji *mama* ya hindistanî hatibe ku di ser dûriya Kurdistan û Hindistanê ji hev re, ew herwiha bi maneyên ji hev cuda – lê têkil – in.

Ji vê desteya peyvan peydakirina etîmolojiya peyva “ap” piçekê ji yên din diwartir e lê ew jî ne mehal e lê mimkin e. Ev peyv di zimanên din yê îranî de û di zaravayên din jî yê kurdî de peyda nabe. Ew herwiha di kurmanciya rojhilatî de jî nayê dîtin. Cihê ku ev peyv di kurdî de lê tê bikaranîn cîranên tirkî ne. Loma etîmolojiyên mihtemele yê ji tirkî ji hemûyan beraqiltir in. Di rastiyê de peydakirina alternatîvên pêbawer ji tirkî ne gelek zehmet e jî. Wisa diyar e ku ew ji peyva devkî ya tirkî “abi” (keko) ya tirkî ye ku kurtkirina ji “ağabey” (birayê mezin, “axa-bey”) e yan jî hevrehê “amca” (“mam, ap” bi tirkîya nû) ya tirkîya niha ye ku ji tirkîya navîn “abıca / abuca” (mam, ap) e ku ji tirkîya kevn “apa” (bab, bav) + “-eçe” (kek birayê mezin).

Xuşka babê mirovî di kurmancî de bi peyva *met* yan *metik/metk* tê nasîn. Ti guman ji etîmolojiya wê nîne: ew ji erebî *emme(t)* عمة. Bo ketina ‘E ji destpêka peyvê, li jortira wê beşê binêrin.

xal û xalet

Birayê dayika mirovî bi nave *xal* / *xalo* tê nasîn û xuşka dayikê jî *xalet* (kurmanciya rojhilatî) yan *xaltî* (kurmanciya navendî) ye. Peyva *xal* wek *xalo* خالو di soranî de, wek *xalo* di zazakî de û wek *xalû* خالو jî di farisî⁸⁴ de li kar e.

⁸⁴ Farisî zêdetir *daî* دائی ya ji tirkî *dayı* (ji tirkîya kevn *tagay*) bi kar tîne.

Xalet û *xalet* ji erebî *xale(t)* خالة yan ji forma pirhejmar *xalat* خالات in. Heman peyv wek *xalê* خاله ketiye farisî û bi forma *hala* di tirkî de cih girtiye lê bi tirkî niha maneya *met* (xuşka babê kesekî) dide.

xesû û xezûr

Dayika mêrê jinekê *xesûya* wê jinê ye. Herwiha dayika jina mêrekî jî *xesûya* wî mêrî ye. Ji bilî forma *xesû*, di devokên kurmançî de herwiha varyatên *xwesû* û *xeswî/xesî* jî peyda dibin.

Babê mêrê jinekê *xezûrê* wê jinê ye û herwiha bavê jina mêrekî jî *xezûrê* wî mêrî ye. Ji bilî forma *xezûr*, herwiha varyantên *xwezûr* / *xezwîr* / *xezîr* di kurmançî de peyda bidin.

Berevajî hin zimanên din (bo nimûne ermenî û rûsî) kurdî cudahiye naxe navbera *xesû* û *xezûrên* jinan û *xesû* û *xezûrên* mêran.

Herdu peyvên *xesû* û *xezûr* jî bi eslê xwe ji makezimanê proto-hindûewropî wek mîras bo kurdî mane. Hevrehên wan di zimanên nêzik û yên dûrtir jî yên hindûewropî de peyda dibin. Ew herdu ji eynî reha proto-hindûewropî ne ku bi şiklê **swekuros* hatiye veavakirin. **SW-* ya proto-hindûewropî di zimanên îranî de di vê û gelek peyvên din de jî dibe *XW-*.

kurmançî	xezûr	xesû
soranî	xezûr	xesû
farisî	xosor	xoşû
zazakî	vistewre ⁸⁵	vistewrî
avestayî	x ^v esure	
sanskritî	श्वशुर (śveśure) ⁸⁶	
ermenî	սկեսրայր (skesrayr)	սկեսուր (skesur)
rûsî	свёкор (svyokor)	свекровь (svêkrovi)
inglîziya kevn	sweor	
almanî	Schwäher, Schwieger-	
almanî	svär-far	svär-mor
latviyayî	šešuras	

⁸⁵ X- di koma XW de ji zazakî dikeve û W ya destpêkê carinan dibe V (hewramî "waran", zazakî "varan").

⁸⁶

yûnanî	έκυρός (hêkuros)	
latînî	socer	socrus
îtalî	suocero	suocera
spanî	suegro	suegra
portugalî	sogro	sogra

Lîste dikare hê jî bê dirêjkirin lê dîsa jî ev peyv ji çend zimanên giring yê hindûewropî ketiye. Bo nimûne, di inglîzî û fransî de hevrehên van herdu peyvên nemane û hin peyvên nû li cihê wan niha li kar in. Herwiha di farisî de jî *xosor* û *xoşû* ne peyvên serdest yê bi vê maneyê ne.

dotmam û pismam

Keça mamê kesekî ji wê/wî kesî re *dotmam* (*domam*, *duhmam*) e û kurên mamanan jî *pismam* in. Dawiya van herdu peyvên ji *mam* (ap, am, birayên baban) pêk tê. Lê destpêka herdu peyvên ji du peyvên pêk tên ku wek peyvên serbixwe di kurmancî de di nav gel de peyda nabin.⁸⁷

Lê herdu pêşpirtikên *dot-* û *pis-* dikarin bi hêsanî bi hevrehên xwe yê zimanên din yê îranî û hindûewropî ve bîrêdan.

Dot di kurdiya başûrî de bi forma *düet* (keç) li kar e. Ew herwiha bi şiklê xwe yê *doxter* bi berfirehî di farisî de tê bikaranîn. Bo ketina X ji berî T, bide ber kurmancî *dotin* û farisî *doxten* yan kurmancî *firotin* û farisî *forûxten*. Bo ketina paşpirtika “-er” jî ji dawiya peyvên kurmancî bide ber kurmancî *xweh* (xuşk) û farisî *x(w)aher*, kurmancî *bira* û farisî *bera-d-er*, kurmancî *ma-k* û farisî *ma-d-er*.

kurmancî	dot(mam)
kurdiya başûrî	düet
belûçî	duht

⁸⁷ Hin hewlên nivîskî hene ku peyva *dot* li cihê peyva *keç* / *qîz* dinivîsîn lê di nav gel de *dot* tenê di peyva *dotmam* de peyda dibe, bi serbixwe yê nayê bihîstin. Herwiha ew wek pêşpirtika hin peyvên din jî di nivîsan de tê dîtin, bo nimûne wek *dotmîr* bi maneya *prences*, *keça mîran/paşayan*.

farisî	(doxter) دختر
pehlewî	duxter
avestayî	duyðder (avestayiya nû), dugider (avestayiya kevn)
sanskritî	दुहितृ (duhitṛ)
ermenî	դուստր (dustr)
inglîzî	daughter
swêdî	dotter
almanî	Tochter
yûnanî	θυγάτηρ (thugatēr)
rûsî	дочь (doçi)

Lîste hê jî dirêjtir e. Di gelek zimanan de ev peyv bi maneya “keça filan kesî” (bi inglîzî “daughter”) tê bikaranîn û bi mebesta “mirovên mê yên hê nebûne jin” peyveke din (bo nimûne bi inglîzî “girl”) heye. Lê di kurdî de ji bilî “dotmam”ê, di rewşên din de herdem “keç”⁸⁸ yan “qîz” li kar e (li jêrtir binêrin).

Pêşpirtika *pis-* di peyva *pismam* (kurên maman/apan) û peyva kêmtir li kar ya *pisxal* (kurên xalan) de jî ji proto-hindûewropî ye tevî ku ne bi qasî peyva hevrehên peyva *dot-* berbelav e jî. Di zimanên îranî de ew hem wek *pis-* û hem jî wek *pûr-/putr-* tê dîtin.

kurmancî	pis(mam)
farisî	piser, -pûr
pehlewî	pus, puser, -puhr
parsî	buhr
avestayî	puthre-
sanskritî	पुत्र (putre-)
latînî	puer
yûnanî	παῖς (paîs)

⁸⁸ Bi kurmanciya rojhilatî û herwiha bi soranî “kiç” e.

Di piraniya zimanên li jor rêzkirî de ev peyv maneya kur dide. Lê di hin zimanan de jî ew bi maneya *zarok* e. Bi wê wateyê di kurdî de jî bi forma *pizo* (kurikên sava/berşîr) heye. Hêjayî gotinê ye ku şopa peyva “pis” herwiha di peyvê *pizdan* û *avis* de jî maye: di peyva yekem de S bûye Z û di ya duyem de jî P bûye V.

bûk û zava

Hem *bûk* û hem jî *zava* di kurdî de her yek xwedî du maneyan e:

peyv	wate	bi inglîzî
bûk (1)	keça/jina ku niha daweta wê tê kirin	bride
bûk (2)	jina kurê/birayê kesekî	daughter-in-law
zava (1)	kurê/mêrê ku niha daweta wî tê kirin	bridegroom
zava (2)	mêrê keça/xuşka kesekî	daughter-in-law

Bi heman awayî di tirkî de jî *gelin* maneya herdu *bûkên* kurdî û *damat* jî wateya herdu *zavayên* kurmançî dide. Di farisî de jî *damad* herdu maneyên *zava* û *‘erûs* herdu wateyên *bûkê* didin lê di farisî de herwiha *sonoh* û *sonhar* yên tenê bi wateya *jina kurê kesekî* jî hene. Tirkî *damat* ji farisî wergirtiye, farisî *‘erûs* ji erebî.

Zava peyveke îranî/hindûewropî ye. Mirov dikare bi hêsanî hevrehên wê di zimanên lêzim de peyda bike:⁸⁹

kurmançî	zava
soranî	zawa
zazakî	zama
belûçî	zamat, zamas
avestayî	zamater

⁸⁹ Z-ya kurdî/îranî adeten ji G ya hindûewropî peyda bûye: “zan, zayîn” (latînî “genus”, yûnanî “gênês”), zanîn (yûnanî/latînî “gno-”, inglîzî “know”), “zer” (almanî “Gelb”) – L ya proto-hindûewropî di k

hexamenişî (farisiya kevn)	damater
farisî	damad داماد
sanskritî	γαμβρός (camater-)
rûsî	зять (zyati)
yûnaniya kevn	γαμβρός (gambros)
latînî	gener
frensî	gendre
îtalî	genero
portugalî	genro
romanî	gîner
spanî	verno

Mirov dikare lîsteyê hê jî bi hevrehên peyva *zava* dirêjtir bike.

Peyva *bûk* (bi devokî herwiha *bûk*, *bwîk*, *bîk*) jî bi heman şêweyî îranî/hindûewropî ye. Hevrehên wê jî di gelek zimanan de peyda dibin⁹⁰:

kurmancî	bûk
soranî	bûk
farisî	beyû(g)
kurdiya başûrî	beû, weû
kurdiya şêxbizinî	wevî, wewî
hewramî	weywe
zazakî	veywe, veyve, vêke
talişî	weyû
avestayî	wed- (zewicîn)
pehlewî	veyûdegan (dawet, zemawend)

⁹⁰ Giring e bê bibîranîn ku V/W ya destpêka peyvan di kurmancî, soranî û farisî de bûye B: ba (zazakî "va", avestayî "vate-"), baran (zazakî "varan", avestayî "vara-"), berf/berf (zazakî "vewre", avestayî "vefre, cefre").

inglîzî	wed (zewicîn), wedding (dawet, zemawend)
latînî	vadis, vas (ehd, soz, garantî)

Gava ku bûk û zava dizewicin, dibe *dawet* û *zemawend* û *govend* û *dîlan* tên kirin. Peyva *zemawend* ya kurmanciya nivîskî bi rêya soranî ji hewramî *zema-wend* (“zava-bend”, “zava-girêdan”) hatiye. Ji heman paşpirtika *bend* herwiha peyva kurmancî *govend* jî hatiye çêkirin.⁹¹ *Go-/gu-* maneya *gilovir*, *gilor*, *çember*, *xirxal* dide, *wek gog*, *gundor/gindor*. Lê peyva *zewac*, *zewicîn*, *zewicandin*, *izdiwac* ji aliyê etîmolojî ve ne hevrehên peyva *zava* ne. Ew bi rêya erebî *z-w-c-* bi rêya aramî *z-w-g-* ji yûnaniya kevn ζυγός (*zugos*: cot) e ku ji proto-hindûewropî **yeug-* e ku hevrehê farisî یوغ (yûğ) û جغ (coğ) yên bi maneya *nîr* in û hevrehên kurmancî *cot*, soranî *cût*, farisî جفت (*cuft*: cot) in ku ya farisî *wek çift* ketiye tirkî jî. Anku *zewac* tê maneya *hevqirtina* yan *hevqirêdana* du kesan.

Peyva *dewat* tevî şikl û dengê xwe jî ne hevrehê peyva *damad* (*zava* → tirkî *damat*) e. Ew ji erebî *de’we[t]* (*gazîkirin*, *vexwandin*, *dawetkirin*) e. Bo guherîna *e’* bi *a*, bidin ber *nal* ji erebî *ne’l* yan *maqûl* ji erebî *me’qûl*.

Helperkê ya soranî ji pêşlêkera *hel/hil-* (ber bi jor ve: *hildan*, *hilkirin*) û *per* ku di ermenî de jî *wek par* bi maneya *dans* (ji frensî yan inglîzî) û *reqs* (ji erebî) heye. Mixabin etîmolojiya peyva *dîlan* nayê zanîn. Hem ew û hem jî *govend* di kurdî de tenê di kurmanciya navendî û belkî di zazakî de jî li kar in.

Heta vê dawiyê û li gelek cihan niha jî li Kurdistanê gava ku bûk û zava dizewicin, malbata zavayî komeke pare yan jî tiştêkî din yê bihagiran dide malbata bûkê. Di kurmancî de ev pare yan maliyet bi peyvên *next* (bi taybetî di kurmanciya rojhilatî de) yan *qelen* (xaseten di kurmanciya navendî û rojavayî de) tê nasîn.

Next ji erebî نقد (*neqd*: pare, pere, hûrde) ye ku *wek nakit* (pare, pere, pareyê destan *wek diwateya pareyê* li ser kartên bankeyê) di tirkî de jî li kar e. Bo guherîna Q berî T, bidin ber *wext* ji erebî *wext*. Herçi peyva *qelen* e, ew jî bi ihtimaleke mezin ji erebî قران (*qeran*: *zewac*, *dawet*) e. Bo guherîna R bi L bide ber *şelwal*, *şerwal*, *şal* / *şarik*... Bo guherîna A bi E di bin tesîra E-ya din ya peyvê de, bide ber *se’et* ji *sa’et*, *tesedif* ji tesaduf. Eger *qelen* ne ji erebî *qelen* be, hingê ew ê ji tirkî be: kurtkirina tirkîya kevn *kelen başı* (“serê bûkê”, diyariya ji ji bo/ber bûkê), bi tirkîya niha *gelin* (bûk) ji tirkîya kevn *kelen* (bûk) ji tirkîya kevn *kelmek* (hatin – anku *kelen* dibe *ya ku tê malbatê*), bi tirkîya niha *gelen* (ya/yê kut ê), têkilî lêkera *gelmek* (hatin).

⁹¹ B li nav û dawîya peyvê di kurmancî dibe V: av (farisî *ab*, belûçî *ap*, avestayî *epe-*), kurmancî *sêv* (farisî *sîb*, belûçî *sop*), kurmancî *evd* (ji erebî *’evd*), kurmanciya navendî *bav* (kurmanciya rojhilatî *bab*, tirkî û farisî *baba*, gelek zimanên ewropî *papa* / *pappa*).

kur û law

Di kurmanciya rojhilatî de zarokên nêr bi peyva *kur / kurr* tên nasîn. Ew bi heman awayî di soranî de jî li kar e. Di kurmanciya navendî de jî ew heye lê li gor devokan li cihê wê gelek caran peyvên *wek law, gede, sebî* jî tên gotin.

Di kurmanciya rojhilatî de gelek caran peyva *kur* tenê bi maneya *zarokê nêr yê kesekî* (bi inglîzî *son*) li kar e. Bo ku mirov bibêje *zarokên nêr bi giştî yan filan kes zarokekî nêr e* (bi inglîzî *boy*) mirov peyva *kurik* bi kar tîne. Wek ku li jor hatiye diyarkirin, peyvên *jin/jinik* jî wisa di hin devokan de bi maneyên piçekê ji hev cuda ne. Di kurmanciya navendî de jî peyvên *law/lawik* wisa carinan ji hev tên cudakirin:

kurmanciya rojhilatî	kurmanciya navendî	wateya peyvê	bi inglîzî
kur	law	zarokê nêr yê kesekî	son
kurik	lawik	zarokên nêr bi giştî	boy

Helbet ev cudakirin herdem nayê kirin û gelek caran peyvên *kurik/lawik* tenê formên biçûkkirinê (diminutîv) yên peyvên *kur/law* in. Li aliyekî din peyvên *kur/law* gelek caran bi maneya *giştî* ya *zarokên nêr* jî (bi inglîzî *boy*) li kar in.

Ji aliyê etîmolojî ve *kur* peyveke îranî ye: soranî *kur*, lurî *kur*, sogdî *kurt* (zarok). Ew herwiha têkilî endamê cinsî yê mêran anku peyva *kîr* e, bi soranî *kêr*, zazakî *kir*, farisî *kîr*, xunsarî *kur* (hemû bi wateya *kîr*).

Peyva *law* di kurmancî û soranî de heye lê maneya wê li gor devokan diguhere. Di kurmanciya navendî de ew wateya *kur, zarokên yan xortên nêr* (bi inglîzî *boy, son*) dide. Di soranî de ew maneya *genc, xort, ciwan* (bi inglîzî *young*) dide bêyî ku ti cudahiyê bixe navbera *kur* û *keçan*. Di kurmanciya rojhilatî de ew ji wateya *kur* zêdetir maneya *baş, qenc, rind* dide. Herwiha bo têkiliya xortanî û rindiyê, bidin ber peyva xwemalî *ciwan* ku di hin devokan de maneya *xort, ne pîr* û di hinan de jî wateya *rind, spehî, xweşik* dide.

Peyva *law* di zimanên din yên îranî de peyda nabe. Eslê peyvê ermenî ye û di ermenî de maneya wê mîna ya bi kurmanciya rojhilatî ye: *baş, qenc, rind*. Di ermeniya kevn de ew bi şiklê *law* bû lê di

erمنيya niha de bi forma *lav* e.⁹² Bo guherîneke berevajî, bidin ber peyva *qenc* (baş, rind, çê, çak) ji tirkiya kevn *kênç* e ku bi tirkiya niha *genç* (xort, ciwan, genc) e ku wek *genc* dubare û vê carê bi maneyeke din ketiye kurdî.

Ji peyvên din yê bi maneya *kur* li kar, *sebî* ji erebî û *gede* ji farisî ye. Ev ne tenê ji wê diyar e ku ev peyv di wan zimanan de hene lê ji qeyd û bendên dengnasiya kurmancî jî diyar in: *B* di peyvên xwemalî de li nava peyvê peyda nabe ji ber ku tarîxiyên ew li nava peyvê bûye *V*: bo nimûne kurmancî *sêv*, *şev* lê farisî *sêb*, *şeb*.⁹³ Herwiha *D* ya pey vokalan di kurmancî de di peyvên xwemalî de ne mimkin e ji ber ku tarîxiyên diviya ew ketibûya yan jî bi *H* yan *Y* guherîbûya. Bo nimûne farisî *bad*, *bûd*, *badem*, *zaden* lê kurmancî *ba*, *bû*, *bahîv*/*be'îv*, *zan/zayîn*.⁹⁴

keç û qîz

Di kurmanciya rojhilatî de zarokên mê bi peyva *kiç* (bi "i", ne bi "e") tên nasîn. Ew bi heman awayî di soranî de jî li kar e. Di kurmanciya navendî de jî ew heye lê bi forma *keç* (bi "e", ne bi "i") ye lê gelek caran peyva *qîz* jî tê bikaranîn.

Di kurmanciya rojhilatî de gelek caran peyva *kiç* tenê bi maneya *zaroka mê ya kesekî* (bi inglîzî *daughter*) li kar e. Bo ku mirov bibêje *zarokên mê bi giştî* yan *filan kes zarokeke mê ye* (bi inglîzî *girl*) mirov peyva *kiçik* bi kar tîne. Wek ku li jor hatiye diyarkirin, peyvên *jin/jinik* û *kur/kurik* jî wisa di hin devokan de bi maneyên piçekê ji hev cuda ne.

kurmanciya rojhilatî	wateya peyvê	bi inglîzî
kiç	zaroka mê ya kesekî	daughter
kiçik	zaroka mê bi giştî	girl

⁹² Hêjayî bibîranînê ye ku peyvên kurdî-îranî yê bi *L* dest pê dikin gelek kê in. Piraniya peyvên niha bi *L* dest pê dikin û niha di zimanên îranî de li kar in, bi eslê xwe biyanî ne. Lê hin peyvên xwemalî jî hene: *lêv*, *ling*, *li*... Lê gelek peyvên pir li kar û sade jî bi eslê xwe biyanî ne: *lazim*, *legen*, *lez*, *lezet*, *lib*, *libas*, *lihêf*, *lîmon*...

⁹³ Bo dîroka dengê *B* di kurdî de. binêrin: www.kulturname.com/?p=10013

⁹⁴ Bo peydabûn û guherîna dengê *D* di kurdî de, binêrin: www.kulturname.com/?p=10541

Helbet ev cudakirin herdem nayê kirin û gelek caran peyvên *keçik/kiçik* tenê formên biçûkkirinê (diminutîv) yê peyvên *keç/kiç* in. Li aliyekî din peyvên *keç/kiç* gelek caran bi maneya giştî ya *zarokên nêr jî* (bi inglîzî *boy*) li kar in.

Ji aliyê etîmolojî ve *keç/kiç* texmînen peyveke îranî ye: hevrehê soranî *kiç*, soraniya erdelanî *kenîşk*, hewramî *kinaçê*, pehlewî *kenîçek*, *kenîzeg*, sogdî *kençîk* (kenîg= jin), zazakî *kêna*, avestayî *kenya-*, sanskrîtî *kenya-*. Hevwatetî û nêzîkiya dengî ya navbera *keçê/kiçê* ya kurdî û *kız* (keç) ya tirkî tesadîfî ye. Lê *kancik* (dêl) ya tirkî ji zimanekî îranî, bi ihtimaleke mezin ji sogdî hatiye wergirtin.

Tevî ku peyva *kur* têkilî peyva *kîr* anku *endamê cinsî yê nêran* e lê *qîz* ji aliyê etîmolojî ve ne têkilî peyva *quz* anku *endamê cinsî yê mêyan* e. *Quz* peyveke îranî ye ku ketiye erebî jî lê *qîz* ji tirkî *kız* e. *Qîz* di nav zimanên îranî de tenê di kurmancî û zazakî de anku di lehceyên kurdî yê di bin tesîra tirkî de li kar e û di kurmancî de jî ne li her derê anku zêdetir li Bakur heye lê bo nimûne li Başûr hema-hema qet peyda nabe. Li aliyê din, di zimanên tirkîkî (tûranî) de ew ji Balkanan heta Rojhilata Asyayê berbelav e.

Ji bilî *keç/kiç* û *qîz*, mirov carinan di nivîsên kurmancî de peyva *dot* jî wek peyveke serbixwe di nivîsan de dibîne. Di nav gel de ew di peyva *do(t)mam* de heye lê wek ji peyva *mam* veqetandî anku tenê *dot* di kurmancî de tenê di nivîsan de heye. Di soranî de heta peyva *dotmam* jî peyda nabe. Li aliyekî din, hevrehên wê *düet* di kurdiya başûrî de û *doxter* di farisî de wek peyvên serbixwe li kar in.

zarok û sava

Peyva *zaro*, *zarok* (*zarrok*) anku mirovên temenê wan biçûk (bi inglîzî *child*) di kurmanciya nivîskî de peyveke serdest e. Ew di soranî de ne li kar e lê di kurdiya başûrî û hewramî de jî wek *zarû* heye. Lê di nav xelkê de di kurmancî de bi maneya *zarok* zêdetir ev peyv li kar in: *biçûk*, *tifal*, *'eyal*, *gede*, *sebî*. Peyva *sava*, bi soranî *sawa*, maneya *zarokên berşîr* dide. Di gelek devokan de peyvên *bebik*, *pitik*, *bîbo* li cihê wê li kar in, di hin devokan de jî *hito*, *etê* bi wateya keçikên biçûk heye. Di soranî de bi maneya *zarok* peyvên *minaş*, *mindaş* hene ku mirov carinan di nivîsên kurmancî de wek *mindal*, *minal* jî dibîne.

Ji van peyvan *tifal*, *'eyal*, *sebî*, *mindal/minal* ji erebî ne, *gede* ji farisî ye, *bebik*, *bîbo* peyvên navneteweyî ne. *Zarok* we *zag* di belûçî de û wek *zoy* jî di peştûyî de li kar e. Mirov dikare wan hemûyan bi peyva *zan*, *zayîn* ve girê bide. Lê hingê paşpirtika *-ro*, *-rok* ya peyva kurdî bêşirove dimîne. Loma ew carinan bi peyva *zarm* (malbat, binemal, nijad) ya ermenî ve jî tê girêdan. Peyva *sava/sawa*

jî mimkin e ku bi peyva *zan* ve were girêdan, xaseten ji ber ku heman peyv di ermenî de bi awayê *zava* heye lê dîsa jî nayê zanîn ka *-va* ji kû ye.

nevî û nevis

Peyva *nevî* tê manya zarokên kurê kesekî yan zarokên keça kesekî (bi inglîzî *grandchild*). Ew peyveke hindûewropî ye ku di piraniya zimanên îranî de û herwiha di hin zimanên din jî yê hindûewropî de li kar e. Di hemû zimanan de ew ne bi maneya *nevî* ye lê bi hin wateyên din yê têkilî wî ye anku maneya mirovekî din dide:

kurmancî	nevî
soranî	newe
farisî	nevê, neve
pehlewî	nep
hexamenişî	nepa-
avestayî	nepat
sanskritî	nepat
latînî	nepos
yûnanî	nêfios
fransî	neveu
îtalî	nipote
inglîzî	neve, nephew

Peyva kurmancî *nevis* (kurê jina kesekî ku ne kurê wî mêrî bi xwe ye) ji eynî rehî ye. Peyva siyasî/civakî *nepotîzm* (xizimparêzî, alîkarîkirina xizm û kesûkarên xwe di siyasetê yan di civakê de û bertîlkirina wan) ji peyva latînî *nepos*, forma akuzatîv *nepotes* hatiye çêkirin.

kek û kak

Peyvên *kek* (kurmanciya navendî û rojhilatî) û *kak* (kurmanciya rojhilatî û soranî) bi maneya bingehîn *birayên mezin* in. Lê ew herwiha bi wateya *birêz, rêzdar, hêja, seyda, ezbenî* jî li kar in. Serekaniya van peyvên bi esehî nayê zanîn lê ew di felek zimanên îranî û hindistanî de peyda dibin:

ziman	peyv (wate bi kurmancî di kevanokan de)
kurmancî	kek, kak
soranî	kak
bextiyarî	kaka (mam. ap), gegê (bira)
belûçî	kake (xal, birayê dayê)
maratî	kaka (mam, ap)
hindî	çaça (mam, ap)

Li gel peyva *kek*, li Bakurê Kurdistanê *abê* ya hevwatera ya ji tirkî jî tê bihîstin. Lê hêjayî gotinê ye ku di kurdî û zimanên din yên îranî de cudakirineke giştî di navbera kesûkarên ji qisekerî/ê mezintir û biçûktir nayê bikaranîn, bidin ber tirkî *abla* (xuşka mezin) ku li Bakurê Kurdistanê bi devkî di nav kurdan de jî gelek caran tê bihîstin.

FERHENGOKA MATEMATÎKÊ TIRKÎ - KURDÎ

Zagrosê Haco

TIRKÎ	KURDÎ
A	
artı sayı	jimara pozîtîv, jimara zêdek
arakesit kümesi	komika hevbir
ardışık sayılar	jimarên lidûhev, jimarên rêzda, jimarnavên rêzin
ardışık	gelbaze, rêzîn, rêzda, lidûhev
akrep (saat için)	tîrk, tîrik
ay	heyv, meh
açı	goşe, guç, gîraç, nêrîn, hêl, alî
alan	nêveng, meydan, seha, qad, gorepan, halk, rûpîvan, mesabe
apsis	apsîs
açı ortay	navbîra goşê
aritmetik	arîtmetîk
aritmetik işlem	kirarîya arîtmetîkî
alt kümeler	komikên bin
artı (+)	zêdek, pozîtîf
asal	sereke, bingehî
asal sayılar	jimarên pêşimîn, jimarên sereke
asimetrik	nesîmetrîk, nehevnêrî
alıştırma	fêrkirin, temrîn
altıgen	şeşgen, şeşgoşe, şeşçik
altışar	şeşbişes
artık	mave, bermojî, yênmayi
açıölçer	goşepiv, pilepîv

B

benzerlik	manendî, dirûvtî
benzer	manend, banend, dirûv, wekî, nolî
boş küme	komika vala
basamak	xane
bir basamaklı sayılar	hejmarên yek xane
birlik	yekane
birler basamağı	xaneyaya yekan
büyük işareti	rewza mezinahî
bölme	parve kirin, dabeşkinin
bölme işlemi	kirarîya pervekirine, kirarîya dabeşkirinê
bütün	bitûn
bölme işareti	rewza parvek
bütünler açısı	goşeyên bitûn
birleşme	yekbûn, pevghiştin
bölünen	berpar, dabeşbar, dabeşkiraw
bölen	parveker, dabeşker
bölüm	parînek
bölük	tof, grup
binom açılımı	vebûna bînom
birinci derece	hevkêşeya dereceya yekemin
denklem	
bir bilinmeyenli	hevkêşeya yek nenasber
denklem	
birim	yeke
bilinmeyen	nenasber, kesnezanî, meçhûl
birleşim kümesi	komika yekbûyine
binlik birleşik kesir	hezarek parjimara yekgirtî, parjimara besît
basit kesir	kerta besit, parjimara besit
boyut(ebat)	bout, ebat
beşgen	pêncgoşe, pêncçik

bilinen	diyar
bilinmeyen	nediyar, nenasber, kesnezanî
birleşik	yekbûyî, yekgirtî
birler bölüğü	tofa yekan
birler	yekan
birleşen	hevgir
bölü	dabeş, parvek
bağıntı	girêdanî, pêwend, peywend, îzafet relatîvîte
C-ç	
cotengant	cotengant, kotenjant
cosinüs	cosînûs (kosînûs)
cisim	cîsim
cebir	cebîr
çift sayı	jimareya cot, jimereyaza
çift sayılar	jimarên cot, jimarên zo
çıkarma	jêderxistin, deran, deranîn
çıkarma işlemi	kirarîya jederxistinê, kirarîya deranê, dermîn
çıkarma işareti	kêmek
çıkan	terîma kêmek
çıkarılan	jêder, jêderk
çarpma	carandin, caran, zerpkirin
çarpma işlemi	kirarîya carendinê, kirarîya caran
çarpma işareti	zarek, car, ceran
çarpan	lêketî
çarpım	lêkdan
çarpım tablosu	tabloya carandinê, tabloya lêkdanê, xîştaya lêkdane
çember	çember, hawêr, çixêz, xêz
çizmek	xêzkirin, xêzandin, venîn
çizgi çizmek	xêz venîn

çokgen	pîregoşe
çözümleme	analîzkirin, hûrnêrîn
çözüm	dahûrandin, dewîyandin çareserî, hel
çıkarmak	deranîn, anînder, derxistin
çap	eşkêl, çap
çevre	havêrke, hawîr
çarpanlara ayırma	veqetandina lêketan
çözmek	çareserkirin
çevre açığı	goşeya havêrke
çizgi	xêz, xêzik, çixêz, xet, şift
çeşit kenar üçgen	sêgoşêya çeşid kenar
çarpı	car, caran, çarpê
çeşitkenar	çeşîtkenar
çizim	hêlkeşan, xêzkêşan, xetkêşan
D	
dörder	çarêçar
dizi	rêz, rist, ristik, rêze, şerî
deste	deste, demet, taxe
düzine	dozîne
denk	tay, hempa
denk kümeler	komikêntay, komikên hempa
denklem	hevkêşe
denklem kökü	çareserîya hevkêşeyê, hêlkirina hevkêşeyê
dörtgen	çargoşe, çarkenar, çargorzî
dakika	deqîqe
daire	daîre
dairesel	daîrewî
dekar	dekar
determinant	determînant
dikaçılı	goşeçik, stêlî, stêlîn

dikey	tîkane, tîkî, qîne
doğal sayılar	jimarên xwezayî
dikdörtgen	lakêşe, çargoşeya tîk
dikdörtgenler prizması	prîza lakêşeyan
dik prizma	lakêşeya tîk, lakêşeya cik
dekametre	dekametre
denk kesir	parjimara hempa, parjimara tay, kerta hempa, kerta tay
düzlem	teqal, lêlat, mustewî
düzlemsel şekil	şeklê teqal, şeklê lêlat, şeklê mustewî
düzlemsel bölge	herema teqal
dik	tîk, cik, qup, pîk, kîp, stêl
diküçgen	segoşeya tik
dikaçı	goşeya tik rastek
doğru çizgi	rastexêz
düzgün çokgen	pîrgoşeya hevsan
doğru parçası	parçeyê rastek
dik doğrular	rasteken tîk
dar açı	goşeya teng
denklem kurma	sazkirina hevkeşeyê
dik kenar	kenara tîk
dik yamuk	yamûkê çîk, yamûkê tîk
doğru denklemi	hevkeşeya rastek
deltoit	deltoit
dik koni	konîya tîk
dış ters açı	li derve goşeya berepas, goşeyên berepaş lîderve
dış açı	goşeya derve
dik açılı üçgen	sêgoşeya goşecik, segoşeya çîk
dört işlem	çarkirarî

E

eğik	şêfil, meyl, xûz, şûr, xwar
eğim	meyl, xûz
eleman	eleman
eşit	wekhev, yeksan
eksilen	akû kêm dîbe
eşkenar üçgen	sêgoşeya hevsan
eşkenar dörtgen	lebzîne, çargoşeya hevsan
eğri çizgi	xêza xwar
eşitsizlik	neyeksanî
eşdeğer	hevberî, hevtayî
eksi	kêmek, dapacîn, negatîf
eşlenik	xal, çixêz
eğri	munhanî, xwar
elips	elîps
elipsoit	elîpsoîd
eliptik	elîptîk
eşitlik	wekhevî, yeksanî
eşkenar	hevsan, kenare wekhev
eksi sayı	jimara kêmek, jimara negatîf

F

farklı kümeler	komiken cûda
fark	terq, derk, cihêtî, cîyawazî
faktoriyel	faqtorîyel
faiz	faîz

G

grup	kom
gram	gram

grafik	grafîk
gönye	gûnya gonîa
geniş aç	goşeya fireh
geniş açılı üçgen	sêgoşeya goşefireh
grafik çizme	xêzkirina grafîkê
genel denklem	hev kêşeya gelemperî
geniş açılı	goşefireh
H	
hesap	hesab
hafta	heftî
hacim	qebare, bareste, tiyen, qeware, hecm
hektometre	hektometre
harfli ifadeler	vegotinên pîtî, derbirane pitî, vegatinên tîpî, derbirane tîpî
hipotenüs	hîpotenûs, veter
hareket	hereket, lebt, tevger
hane	xane
helis	helîs
hiperbol	hîperbol
hiperbolik	hîperbolîk
hiperboloid	hîperboloît
homoteti	homotetî
homotetik	homotetîk
I	
ikişer	dûdo dûdo, zozo
iletke	pilepîv, goşepîv
ışın (yarıdoğru)	tîrêj
irrasyonel sayılar	hejmarên îrrasyonel
ikizkenar	duhevsan

ikizkenar üçgen	sêgoşeya duhevsan
ikizkenar yamuk	yamûkê duhevsan
iç açî	goşeya hundir
iç ters açîlar	li hûndir goşeyên ters bere (goşe hundirên ters)
işlem	kirarî
ikidüzlemli	dumustawî
iki terimli	du têtînî, du terîmî
indirgeme	lêvegerandin, redûksîyon
indis	îndîs
integrasyon	întegrasyon
integral	întegral
integral denkleme	hevkeşeya întegral
K	
kesir	parjimar, kert, kesr
küme	gult, melû, lod, kom, komik
kesirli sayîlar	jimarên şikestî, jimarên bi kart, jimaren parjimarî
kesir çizgisi	xêza, kerte, xêza dabeş
kalan	bermayî, mayîne, berma
kütle	gumlat, girse, cemaver
kilo	kîlo
küre	ked, kûre
küp	kûp
köşe	goşe
kenar	kevî, kenar, qerax, rex, tenîşt, kêlek
kural	qayde, rêzik
kare	kare, çarçîk
kesen	bibîr, bîrang
kesirli	perejî, kesrî, bikert, pirjimar
kesişen	hevbir
kosinüs	kosînûs

köşegen	aşkêl, goşekenar
kesişen doğrular	rastekênhevbir
kök	reg, binc, ra, kok, kirin
kök alma	reg kirin, kok kirin
köklü ifadeler	îfadeyên reg, îfadeyên kokî
katsayı	hejmara kat
kuvvet	hêz, qûwet
konsantrasyon	konsantrasyon
koordinat sistemi	sîstema tewere, sîstema koordînat
koordinat düzlemi	teqala tewere, lêlata tewere
konkav	kov, kovik
koni	konî, gûç
kesişim	hevbir
kare prizma	prîzma çerçik, prîzma kare
kesen	birang
küçük işareti	remza biçûkahîye
küçük	biçûk
karesini almak	girtina kareya hejmarekê
karekök	regadü
karekök almak	regadü hesabkirin
karesi	kareya hejmareke
kenarortay	navbira kenarê
L-M-N	
limit	lîmît
lineer	lînear
logaritma	logarîtma
mili	milî
milimetre	milîmetre
metrenin katları	karên metreye
metrekare	metre çarçik, metre çargoşe, metrekare

metrekûp	metekûp
metrik sistem	sîstema metrîk
metrenin askatları	qatên metreyê jer
mutlak deđer	nirxê mûtleq
merkez	gerû, tewere, navend merkez, senter
merkez açi	zawîyeya narendî, goşeya tewere, zawîyeya senterî goşeya gerû
maksimum	maksîmûm
minimum	mînîmûm
nokta	xal
numara	hejmar, numro, numre
O	
ortak fark	terqa pardar, terqa hevpar
ortak çarpan	lêdera hevpar
onluk	dehanî, dehane
ondalık	dehanî, dehekî, dehyek
ondalık kesir	lefa deheki
ondalık sayı	hejmora dehekî, hejmara dehanî
ondalık sistem	sîstema dehanîyê
onlar basamağı	xaneya dehan
ölçü	pîvan
ortalama	navînî, wasatî, navekî
özdeşlik	wekehevî
ortak çarpan	lêdera hevpar
oran	rêje, nîspet
orantı	rêje
oklit bağıntısı	pêwenda oklît, peywenda oklît
ordinat	ordînat
orjin	orjîn
olasılık	dibetî, îhtîmal

ortak eleman	elementê hevpar
ongen	dehkenar, dehkoşe
onlar	dehanî
ortay	xêza navbir
P-R	
parça	parçe, pare, qet
pay	pay, par, beş, pişk
payda	payde, pare
problem	problem
prizma	prîzma
pergel	pergar, pergel
paskal üçgeni	sêgoşeya paskal
paralel	helîpan, rastênhev, paralel, mûvazî
paralel kenar	çargoşeya paralel paralelkenar
pisagor bağıntısı	peywenda pîsagor
permütasyon	permûtasyon
profil	profil
piramit	pîramîd
piramidal	pîramîdal
parabol	parabol
parabolik	parabolîk
paraboloid	paraboloîd
poligon	pîrkenar, polîgon
rakam	regem
romen rakamları	regemên romen
reel sayılar	jimarên real, jimarên rastî
S-ş	
sayı	jimar, jimare, hejmar
sayı dizisi	rêzika jimare

sayma sayıları	jimarên, jimartine
sayı doğrusu	rasteka jimeran
saat	demjimêr, katjimêr saet
saniye	cirk, dûvik, sanîye, cirke
silindir	stûwane, tebane, sîlîndîr
sadeleştirme	sadekirîn, satîkirin, arîkirin
sinüs	sînûs
sağlama	mîzan
santi	santî
sıvı ölçüsü	pîvana majî
simetrik	hevnerî, sîmetrîk
sabite	sabîte
sanal	texmînî, terazî, sanal
sanal sayı	jimareya terazî, jimareya sanal
santimetre	santîmetre
sinüzoit	sînûzoît
şema	şema
T-U	
tek sayılar	jimarên fer
toplama	komkirin, civan, tevan berhevî
toplama işlemi	kirarîya komkirinê, civandin
toplama işareti	zêdek
terim	biwêj, navlêk, terîm, form, têgîn
toplam	komînek, têhev, yekûn
toplanan sayılar	hejmarên komkirî
tam sayılı kesir	parjimarên bi tam jimar
ton	ton
tamkare ifade	îtadeya tam kare
teğet	şîwe, mumas
tam sayılar	jimarên tam

trigonometri	trîgonometrî
trigonometrik oranlar	rêjeyên trîgonometrîk
tangant	tangant
ters açılar	goşeyên ters, goşeyên pîşt
taban	bînke, kaîde
türev	muştac
tanım	pênas, tarîf
teorem	teorem
tepe	ser, serî, gujme
ters	vajî, ters, berepas, pişt
uzunluk	dirêjî, dirêjayî, dirêjîtî
uzunluk ölçüsü	pîvana direjayîyê
üçer üçer	sêsê , sîsê sîsê, sêbare
üçgen	sêgoşe, sêkuj, sêguh, senîçik
üçgen prizma	prîzmaya sêgoşe
üs	ser
üslü ifade	îfadeyên bîser
üslü denklem	hevkêşeya biser
üçgen çizimi	xêzandina sêgoşeyê
V-Y	
veri	done
yüzlük	sedanî, xaneyaya sedan
yanlış	şaş, çewt, xetç
yelkovan	xulekjimar, tîrk, tîrkê saete
yüzey	rûxar, rûbar, rûber, rux
yüz	sath, rûxser, rû, rûxar, rûbar, cephe
yüzde	sedî, jisedî
yoğunluk	tîr, kesafet
yamuk	yamûk, çevt, kelkot

yükseklik	bilindahî
yöndeş açılar	goşeyên hambêl, goşeyên hemalî, goşeyên yekalî
yarıçap	nîvçap, nîvşekel
yarıküre	nîvkad, nîvkûre
yüzdelik	sedane, sedêk
yay	kevan, yay

Language shift among Kurds in Turkey: A spatial and demographic analysis

Sinan Zeyneloğlu, Ibrahim Sirkeci, Yaprak Civelek

Abstract

This study explores language shift and interregional migration among Turkey's Kurdish-origin population using census data as well as TDHS data. First, the geographical retraction of the Kurdish language between 1945 and 1965 is depicted using respective censuses as data sources. Second, patterns of intergenerational language shift and the effects of migration and education on this shift are elaborated utilising 2003 TDHS data and the 2000 Census data. Interregional mobility by birth regions and language concentration across Turkey has also been mapped. The Kurdish population in Turkey appears to be on the verge of near-universal bilingualism prompting concerns about the future of the language.

Keywords: Language shift; ethnicity; internal migration; Turkey; Kurds

Introduction

Analysing population patterns and behaviour of ethnic groups in Turkey is a challenge due to the persistent refusal to collect information on "ethnicity", as such, in censuses and surveys. Many scholars have used language as an ethnic marker though the apparent language shift among Kurds and other nonTurkish ethnies has diluted the link between mother tongue and ethnic identity. O'Driscoll (2014) comparing the Irish and Kurdish cases claims that "Kurdish is facing danger of being eradicated" due to the politics of "linguicide".⁹⁵ Thus, we are set to identify this language shift with

⁹⁵ Skutnabb-Kangas and Dunbar (2010: 80) define linguicide in the context of cultural genocide which refers to "any deliberate act committed with the intent to destroy the language" among other cultural elements based on Article III of the draft of the Genocide Convention that was excluded from the final text mainly due to opposition from Western

the help of large scale statistics from censuses and surveys. The diffusion of Turkish, the language of the majority, as well as the reciprocal retreat of the Kurdish language can be observed mapping at least two census data (1945 and 1965), though interestingly, to our best knowledge, this has never been done in the context of demonstrating language shift in Turkey. The retreat of the Kurdish language in the 20th century resembles that of Irish in the 19th century, even without an ethnically Turkish settler population in the predominantly Kurdish areas like the Protestants of Ulster or the “Old English” of the Pale in the Irish case (Hindley, 1990; Carnie, 1995). Interregional migration flows in Turkey have generally been from eastern to western provinces. Accordingly, population movements from the predominantly Kurdish areas head to the western parts of the country, while the spread of the Turkish language points to the opposite direction.

Apart from the geographical retreat of the Kurdish language, intergenerational language shift can also be observed within families and across generations. A portion of Kurdish parents do not transmit their mother tongue to their children or do so only as second language similar to the case of international migrants as mostly analysed for migrant groups in the United States and other receiving countries (Stevens, 1985). Alba et al. (2002) noted that languages spoken at home by third-generation immigrant children are affected by factors such as intermarriage. These arguments are not exclusive to the international migration context, and thus, may well be relevant to internal migration of ethnic groups such as Kurds moving from the east to the west of Turkey. Migration to outside the predominantly Kurdish areas and/or rise in the educational achievement of children of Kurdish families apparently dissuades retention of the Kurdish language. Interestingly though, apart from studies using language for analysis of demographic features of “ethnic/language” groups, where language is a marker rather than the main focus of analysis (e.g. Hoşgör and Smits, 2002; Koç, 2008; Mutlu, 1996; Dündar, 1998), or a few examples of small-scale qualitative fieldwork (Çağlayan, 2014; Civelek, 2015), until now no work has been exclusively dedicated to probing the language shift among Turkey’s Kurds as a separate, quantitative and country-level investigation.⁹⁶

In awareness of background and data limitations the purposes of this paper are threefold. First, we depict the geography of the shift from Kurdish to Turkish using census data from 1945 and 1965. Second, we analyse intergenerational language shift differentiated according to educational

countries such as Canada or the United States with arguments that the inclusion of cultural genocide could inhibit the assimilation of cultural or linguistic groups as well as give way to claims by indigenous groups.

⁹⁶ Smits and Hoşgör’s (2003) work on linguistic capital comes close but lacks a historical and geographical frame.

attainment and migration status (as an indicator of context), particularly focusing on migrant (allochthon) Kurds compared to the non-migrant (autochthon) majority using the 2003 Turkish Demographic Health Survey (TDHS) data. As a prerequisite for the above stated objectives we have mapped the geographical distribution of languages other than Turkish from the latest available census of 1965, and further, analysed interregional migration currents in the second half of the 20th century using Census 2000 data. Finally, our third aim is to present a critique of studies that have, so far, resorted to the unverified assumption equating language to ethnicity in the Turkish context and to present an assessment of alternative markers, as discussed in the next chapter.

Language as a marker of ethnicity in the Turkish context

Fishman (2010: xxviii-xxix) points out that the equality between language and ethnicity has rarely been discussed and that it is imperative to consider the context and the conditions that lead language to become a proxy for ethnicity, a process depending on circumstances and contrasts that modify, create or recreate this association over time. Moreover, he argues, that not only the connection between each other but also both “language” and “ethnicity” themselves are highly contextual as well. May (2012: 134-138) criticises the assumed association of language and ethnicity as he discusses the relations between ethnies, nation, language and culture. Yet, as Smith (1986: 27) remarked “scholars persist in regarding language as the distinguishing mark of ethnicity, a standpoint that leads to gross simplification and misunderstanding”. Such simplification has been dominant in Kurdish studies despite massive language shift and widespread bilingualism⁹⁷ among Kurds in Turkey (Zeyneloğlu et al., 2014; Zeydanlıoğlu, 2013). Unfortunately, many studies using historical census or contemporary TDHS data have assumed responses to the ‘mother tongue’ question as a proxy for ethnicity (e.g. Mutlu, 1996; Sirkeci, 2000; GündüzHoşgör and Smits, 2002; Koç et al., 2008) though the validity of this assumption has never been probed empirically in the Turkish context.

First to mention in this regard is the ambiguity of the meaning of “mother tongue’ in the Turkish language as “anadil” literally means “mother tongue” but is also used in the meaning of ‘main-language’. In all Turkish census forms since the first in 1927 the explanation of anadil following in

⁹⁷ See Skutnabb-Kangas and McCarty (2008) for a comprehensive terminology on bilingualism.

brackets reads as “the language spoken at home and/or among family”.⁹⁸ In the 1985 census questionnaire, the question was even directly formulated as “*Ev içinde ve aile arasında konuştuğunuz dil?* (The language you speak at home and among family?)” without using the term *anadil* at all, which, for a grown up person, can certainly be different from the language learned in childhood from his/her mother, especially after experiences of migration, intermarriage and/or entrance into higher education (Zeyneloğlu et al., 2016). In other words, the census has aimed at the ‘function’ dimension of language as classified by Skutnabb-Kangas (2008: 86) as opposed to the ‘origin’ dimension. In the TDHS, no explanation follows the corresponding question on “mother tongue” which leads to ambiguity on this matter. The perception of scholars using TDHS data concerning the responses on this question is revealed by Dündar (1998: 33-34) who gives the definition of mother tongue as “the language first learned in childhood and still understood”, which is in sharp contrast to the description used in Turkish censuses, and probably also incongruous to the subconscious perception of most members of the general population. While TDHS claims to have collected the language learned first in childhood, that is focusing on the “origin” dimension of language (SkutnabbKangas, 2008: 86), without a clear explanation some respondents interviewed during the successive surveys may have referred to their current language, which may be different from the one learned first in childhood due to assimilation; or, that the language learned first in childhood may not be identical with that of the parents’ first language due to language shift. We do not deny that there is a bijective link between the Kurdish language and the Kurmanji as well as the Zaza population groups both in terms of self-designation as well as outside perception (Haig and Öpengin, 2014), though not all Kurds speak a Kurdish dialect so that knowledge and/or use of the Kurdish language does not necessarily constitute an operational ethnic marker. As Fenton and May (2002: 15) remark language can certainly be “the expression and focus of” ethno-political claims, however, their discussion also reflects the complexities of using language as an ethnic marker and the temporality and relationality of both identity and its markers.

The negative correlation of educational attainment and language retention among Kurds (Smits and Gündüz Hoşgör, 2003)⁹⁹ may be a reason why Koç et al. (2008) found strong “demographic

⁹⁸ Şeref Hoşgör, the former head of the Social Statistics Department (1996-2003) of SIS, confirms that instructions given to census interviewers were also in that direction (Personal interview on Apr.2nd, 2009 in Ankara).

⁹⁹ 5 An inverse relationship between language and minority language retention has been observed in many other cases such as the Nenets in Russia. Kazakevitch (2004: 10-12; cited in SkutnabbKangas and Dunbar, 2010: 63) notes that “as a rule, children of well-educated Nenets parents (even those who are concerned with protection and preservation of the ethnic language)... have poor or no command of Nenets”.

